BÎRANÎN

Mûnzûr VARTO

# RONDIKÊN BINEVŞAN

WEŞANÊN KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê
2017

Cihê Çapê: Matbaya Azadî
Dîroka Çapê: 2017

-

# PÊŞGOTIN

Vê pirtûkê bi navê ‘Rondikên Binevşan’ ku ji aliyê hevalê Mûnzûr Varto yê  di zindanê de dîl e ve hatiye nivîsandin, piştî ji aliyê Komîteya me ve  sererastkirinên hewce dike hatiye kirin, em pêşkeşî hevalan û xwendevanên heja dikin.

Naveroka pirtûkê ji bîranîn-vegotinên li Başurê Kurdistanê dest pê dikin, heya bi Dêrsimê demeke dirêj berdewam dikin ji jiyan, têkilî, têkoşîn, hest û hizirên gerîla beşeke diyar pêşkeş dike. Ji ber vê yekê heq dike ku çawa dest bi xwendinê tê kirin wisa jî bê qedandin.

Rondikên Binevşan bi qasî ku bêhempabûna erdnîgariya Kurdistanê, xweşikbûna çiya, dar û ber, av, şînatî û lawirên Kurdistanê, vedibêje û taswîr dike, têkilî û yekparetiya di navbera gerîla û jiyana xwezayî de jî di hinava xwe de dihewîne.

Piraniya hevalên navê wan di pirtûkê de derbas dibe tevlî karwanê şehîdan bûne. Em di kesayetiya hevalê Ezîz, Feîq, Hemze Gever, Diyar Rojhilat, Berxwedan Rojhilat, Botan, Firat Dêrsim, Wedat,Çem Ararat, Brusk Mereto, Zinar Botan, Şiyar Ereb, Nesîmî Dêrsim de hemû şehîdên xwe yên leheng careke din bi hurmet û minetdarî bi bîr tînin.

Hewldana fêmkirin û vegotina jiyan û têkoşîn, hest û hizir, gotin û çalakiyên hevalên me yên şehîd, pêwîstiyeke girêdana me ya bi wan re û deynê me yê li pêşberê wan e. Di heman demê de ji bo pêşketina wêje, çand û hunera Partî û gelê me, ferzeke li ser me ye; jiyana azad bi qasî vê jî berxwedana li dijî dijminê faşîst, modernîteya kapîtalîst, di avakirina neteweya demokratîk de terza Apoçî ya hebûnî û jiyanî îfade dike.

Fikra me ew e, pirtûka li ber destên we ji bo hewldaneke bi vî awayî têkariyeke bi dilnizmî pêşkeş dike; ji ber wê yekê em bendewar in ku xebatên bi vî şiklî hê jî zêde bibin, kûr bibin.

Tîrmeha 2016'yan
Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK'ê

Ji bo em bîranînên xwe binivîsin sedemên me yên xurt hene. Sedemên me armancên me jî pêk tînin. Armancên me jî rêyên me bi heqîqetê ve girêdidin. Weke kombûna hemû îdealên me, armanc timî bûye evîna herî mezin. Erkek ku dem dide ser milê mirov jî, ji bo ku çîroka xwe pêk bîne bijî, bibe xwediyê pratîka jiyanê û wê binivîse. Wêje hesta vê armancê ye. Wêje hesta vê armancê ye. Mirovê ku dest bi pêkanîna çîroka xwe kirî, dest bi ava kirina xwe jî dike. Destpêkirin, îfadeya startê ya pêkhatinê ye. Çarx dest pê dike bizivire. Çîrok, mîmarê mirov e. Cewher di pêkhatinê de veşartî ye. Divê mirov wê cewherê ferq bike, derxe zanebûnê û aşkere bike. Êş, destbirakê her jidayikbûna nû ye. Pê re rêwîtî dike. Êş di hinava xwe de jiyanê jî hildigirin. Hemû jidayikbûn dişibin hev. Weke mirinan. Ji kêliya ku ji dayik dibe dest bi mirinê dike, çi mixabin e ku di seransera jiyana xwe de tirsa mirinê di hinava xwe de hildigire. Ji ber vê yekê ye ku çîroka dîrokî ya mirov bi bûyera mirinê girtine dest tije ye. Lê belê li beranberê mirina ku evqas jê tirs û rev heye, yên xwe digihînin zanebûna wê û wê têkdibin jî hene. Ev kes zanyar, alîm, derwêş, pêxember û şoreşger in.

“Zanyar û pêxember, feylesofane dijîn. Bi qasî zanîna wateya hebûnê, jiyana watedar kirin armanca bingehîn jî girîng e. Eger armanca jiyanê ew be ku ferq û cûdahî li ser esasê wekheviyê bi azadane zêde bin, dewlemend bin û xwe watedar bikin; yên di jiyanê de mirinê têkdibin ew kes in ku ji bo me hêvî, wate û zanebûnê hildigirin.

Ev jî şervanên heman gotin û wateyê ne ku li ser erdnîgariya cîhanê belavbûne û li gorî cih bi şiklên cûda cûda ne. Dibe ku rengê şoreşgeran cûda be. Heta dibe ku cinsê wan jî cûda be. Lê hestên hemû şoreşgeran dişibin hev. Ew weke stêrkên li azman in. Ji bo ku şevên tarî ronî bikin xwe dikin ji agir û pê dikevin. Şoreşger çarenûsa mirovan diguherin û mirov hişyar dikin. Sûbjeyên herî bijarte yên civaka mirov in. Ji aliyê takekesî ve jî xwediyê cewher in. Li cihê tê de dijîn mirovên herî xwediyê bandor in. Li qadên civakî ku lê dijîn, li gund, navçe û taxên lê dijîn kesên herî zêde tê hezkirin in. Di hinavên xwe de cewhera mirov hildigirin.

Li ser şoreşgeran nivîsandin zehmet e. Ji ber dibe ku tiştên tên nivîsandin bi temamî wan îfade neke. Bi vegotin-nivîsandinê rastiyên jiyanê bi xweşikî nayên vegotin. Ewqas mezin in, rastiyên wan di pirtûkan hilnayê. Dilê wan ewqas mezin e, mirov nikare xwe bigihîne qûntareyên wan; evîna wan ewqas mezin e, mirov ji fêmkirin û vegotinê têr nabe. Li ser wan nivisîn, li ser rûpelan hestên xwe neqişandin, weke ji nû ve tevî wan jiyînê ye. Tarîfa wan kirin, îsbata bêmiriniya wan e. Ew bûn sedem ku em bibin xwe bi xwe. Eger em dikarin ji welêt hez bikin, eger em bi serketina armancê re girêdayîbin ji saya serê wan e. Bi şehadetên xwe, bûn mîmarên hebûna me. Ji ber vê yekê em her tiştê xwe deyndarê wan in.

Bi qasî subjeyên (kirde) bûyeran kesên ji bûyeran re şahidî dikin jî hene. Rêgeza herî girîng a girêdana bi heval û bîranînên wan ve, dayina ser şopa wan û li qîmetên wan xwedî derketin e. Erk û berpirsiyariya dikeve li ser milê min jî ew e, ez şervanekî/ê bi hestên şer tarîf bikim. Şer, qada xweşikbûn û azadbûnê ye. Cihê ku mirov xwe nas dike. Şer, qada ku li wê derê îradeya mirov hêza xwegiriya mirov tê ceribandin e jî. Li qada şer ne tenê hestên

şerker hene. Bi rastî şer qada hezkirin, girêdan, hevaltî û parvekirinên herî mezin e jî. Cihê ku li wê derê parvekirin bi şiklekî herî xwerû nîşan dide, kolektîvîzm weke pêdiviyekê herî zêde xwe dide der e.

Mirov dişibe cihê lê dijî. Li gel çeka xwe, evîn û hesreta xwe jî hildigire. Barê herî giran ê li milê wê/î, giraniya hezkirina di dilê wê/î de ye. Di asteke ewqas bilind de berpirsiyarî xwe dide hîskirin, mirov nikare demeke diyar ji xwe re veqetîne. Ew, weke îfadeya tolstendinê ya şênber a hemû dîrokê, vê qebûl nake. Şervan, subjeyeke polîtîk ku xwediyê berpirsiyarî ye. Dema wê/î pir bi qîmet e. Divê hemû dîrokê di nava dem de bi cih bike. Divê demê pir manedar derbas bike û di oxira azadiya civakî de xwe bike çirûskekê. Ev, ji bilî bûn îfadeyekê, pîvan û pêwîstiyek e. Şervanek bi şikl û şemala xwe jî xwediyê bandor e. Hemû laşê xwe weke çekekê lê dike. Zanebûn û hestên wê/î vê dibêje. Em ji dîroka xwe dizanin li cihê bêderfetî herî serwer û hakim e jî hevalên me laşên xwe kirine weke çekeke herî bi bandor. Ji ber ku laş jî barhilgirê ruh e. Ruh enerjiyeke wisa ye ku her tim xwediyê daxwaza bûn made ye. Vaye ji ber vê yekê her çiqas ji gel me çûyina van hemû barhilgirên ruhan psîkolojiyeke xemgîn afirandiye jî, di cewher de ew hîs kirin, bi domdarî bîranînên wan zindî ragirtin, ji pratîkên jiyana wan hêz wergirtin, wate û pêwîstiya bûn heval e. Em çiqas li ser wan binivîsin di wê astê de wêneyên wan di mêjî û bîra me de zindî dibin. Ji bo me hemû zanebûna me xwe nû dike. Bîranînên me li gel hevalên şehîd jiyîne dibin zanebûna me ya herî bingehîn a dîrokî, biryardariya me ya têkoşînê ya di kêliyê de û hêviya me ya pêşerojê. Ji ber vê yekê weke gencîneya kolektîf a gelê me, bîranînên me mîraseke pir mezin ku ji bo demekê li cem me ye.

Bi rastî dema ji bo ez li ser hevalê Feîq binivîsim min pênûs xist destên xwe, zêde bi min baweriya min tine bû. Diviyabû nivîsa min ew baş bianiya ziman. Demeke dirêj min hewl da ji bo erkeke wisa zehmet xwe adapte bikim. Min zora xwe da ser bîr û hefizeya xwe, cîhana xwa ya xeyalan mezin kir, yek bi yek dubare bîranînên ku min li cihên herî aram ên bîra xwe neqişandine ji cihên wan anîn der.

Li ser we nivîsandin ne tenê tê maneya nivîs nivîsandinê. Dema li ser we tê nivîsandin dubare bi we re jiyîn, tevî bîranînên zindîne dubare şikilgirtin, bi qasî êşeke mezin dide, çavkaniya serbilindî û bextewariyeke mezin e jî. Min hevalê Hemze di nava nivîsên xwe de bi bîr anî û min hewl da hevaltiya wî ya ku jê têr nebûyime, hesreta wî ya pir zêde giran vebêjim. Li pêşberê manewiyeta we careke din bejna xwe ditewînim.

Hevdîtina me ya destpêkê di mehên havîna sala 2002 pêk hat. Kelakela havîna Başur bû. Her dever bi têhna tavê zerzerî bibû. Gare hema bêje weke xeyalên di roman de bû. Aliyê başûr û hinekê jî aliyê bakur ê çiyayê Gareyê ji aliyê daristanên darbarûyên têra xwe mezin ve hatibû dagirtin. Ji ber şerê Başur ê dûr û dirêj li gundên hatine valakirin, darên spîndar û bîşengan weke ku li ber darberûyan îsyan bikin pelên xwe bi hev ve dianîn û dibin sedema bayekî hênik. Eger gotin di cihê wê de be spîndaran, bîşengan û darguzên têra xwe mezin serê kaniyan dagir kiribûn. Şerê hebûnê bû, hewldana weke xwe mayinê bû. Li Gareyê jiyan zindî bû û zimanê xwezayê dihate fêmkirin. Spîndar û guzên ku li beramberê wî bayê bi delalî dihat bi tevgerên rîtmîk ên bi pelên xwe bersiv didan; dema em jî di şivereyên teng ên tev ji aliyê giya ve hatibûn dorpêçkirin re dimeşiyan, aşkere bêjim min zêde pê nedizanî ez ê bi çi û kê re rû bi rû bimînim. Jixwe dema ku dewreya nû ya perwerdeyê qediya, ji ber fikara bi lez

pratîzebûnê, bûn xwediyê tecrûbe û daneheva bi salan a hevalan kelecaneke mezin ez girtibûm. Daxwaza min pêk nehatibû, pêşniyara min a ji bo Zagrosê nehatibû pejirandin. Ev jî weke bendewariyekê her di dilê min de ma. Ji ber hedefek ku dikare rojekê pêk bê bû, min ji xwe re ev nekir pirsgirêkeke cidî. Tevlîbûn gavek bû û dem dest pê kiribû, starta maratonê hatibû dayin. Zagros li wê derê bû, sabît bû. Bi wê heybeta xwe amade bû rojekê min pêşwazî bike.

Dema bi van hiziran xwêdanekê bi min girtibû û min eniya xwe paqij dikir, di serê min re hezar fikir derbas dibû. Kelacana qada nû, hema di kêliyekê de ez ji xeml û xeyala rakişîner a Zagrosê qut dikirim. Serê min weke hêlîna xeyalan lê hatibû. Me dabû nav alegoriyan û li aliyê din jî giyayên derûdora şiverêyê didan çongê me û bi vî awayî em ber bi Pîrîzê ve dimeşiyan. Firat li pêş ez li pey wî, me li ser rewşa hevalên me li pey xwe hiştine sohbet dikir. Weke ku dilê me ji kevir bûye, me behsa pêwîstiya têkoşînê, zehmetiyên armancê dikir û her wiha ser hesreta xwe dinuxumand, diçewisand. Di wê pêvajoyê de li Biryargeha Navendî Firat hatibû girtin perwerdeyê û di dawiya perwerdeyê de weke fermandarê tîmê hatibû erkdarkirin, ji bo tabûra hevalê Ferman vasaziya wî hatibû kirin. Qe ji bîra min naçe, hê tê bîra min hevalê Bahoz destê xwe danîbû ser milê Firat û bi awirên germ li nav çavên wî nêrîbû û jê re gotibû; “hêvî û bendewariya min ew e tu baş xwe tevlî bikî”. Gotin û axaftin jî weke mirov zindî ne. Weke eynikekê berpirsiyariyên mirov tînin bîra mirov.

Hevalên di dewreya min a nû ya perwerdeyê de bi hev re bûm ji bo qadên cûda cûda hatibûn vesaziya wan çêbibû. Li gorî rastiyên têkoşînê ev dihate maneyê bêşensiyeke ‘careke din hev nedîtinê’. Di Tevgera Azadiyê de hezkirina ji hevaltiyê dişibe mezinahiya azman û kûrahiya okyanûsan. Jiyan ewqas xweş e, kêliyek tenê

carekê tê jiyîn. Ji bo ku careke din bê jiyîn divê li hêviya destdayîbûna şert û mercan bê sekinîn. Pirsgirêka şert û merc dê kengî pêk bên ji aliyê rewşa asayî ya jiyanê ve tê diyarkirin. Ji ber vê yekê bi tirsa dibe ku her kêliyê pêlî koremarekî (curekî marên li Gareyê dijîn) bikim di şiverêyê re dimeşiyam, min hewl dida da ku wan bîranînên xweşik ên hatine jiyîn di bîra xwe de bi cih bikim.

Min bîranînên xwe yên herî bi qîmet, yanî tecrûbeyên xwe yên destpêkê li Gareyê hiştibûn. Dema di şivereyê de dimeşiyam, min diviyabû hesreta xwe, meraqa xwe ya ji bo hevalan nedaba xuyakirin. Pêwîstiyeke jiyana leşkerî bû; diviyabû taybetmendî bişibiyana şer bi xwe, diviyabû min hestên xwe nedana der. Ne cara destpêkê bû ku tiştekî wisa diqewime û hevalê cara yekemîn e vesaziya wî çêdibû ne ez bûm. Jixwe li gorî ku Firat gotibû dê heval di qada me re derbas bûna.

Pîrîz qada rojhilatê Gareyê bû. Pîrîz, Zap û Gareyê bi hev ve girêdide. Hemû hevalên di vê derê re derbas dibûn, teqez li tabûra hevalê Ferman dihatin pêşwazîkirin, bêhna xwe vedikirin, bi ser xwe ve dihatin. Ji ber ku rê dirêj in û gerîla weke derwêşan tê wateya timî li ser rêyan bûnê. Ev jî tê maneya westîbûn û jihevketinê. Westîbûna meşên rêyên dûr û dirêj bi navberên bêhnvedanê ji ser xwe avêtin, ji bo ku mirov rêya mayî bimeşe dihêle ku mirov bi ser xwe ve bê û ji nû ve hêzekê bi xwe re peyda bike. Lê eger mirov rastî bigota em zêde newestîbûn. Diviyabû me di demeke kurt de pes nekiribana. Belê, pratîk navê din ê gerîla ye. Arenaya hest û hîsên gerîla ye. Pratîk qadeke bendewariyê ye. Demeke kedê ye ku gelek tişt jê tê qezenckirin. Û karkerên vê em bûn. Ji ber vê yekê diviyabû me hema wisa zû bi zû xwe neavêtana erdê.

Me xwe gihand gundê Siyanê, li binê wan darguzên qerase, ji wê ava zelal ku dişibiya ava kaniyên Dêrsimê çaya xwe çêkir û vexwar. Ji her aliyê me xwêdan diherikî. Navber hatibû dayin. Dema wê bû ku em bêhna xwe vekin. Weke ku pirsgirêkên hemû şaristaniyê li milê me be em ewqas westiyabûn, hevalekî/e ku navê wî/ê nayê bîra min, pêşniyarek şermoke kir; "heval gelo em îşev li vê derê razên nabe?". Firatê ku heya bi Pîrîzê weke berpirsê grûbê hatibû diyarkirin (ev kes piştre ji rêxistinê qutbibû) ev pêşniyar qebûl nekir. Eger em ne li ser şivereyê bûna, Firat dê xwe biavêta erdê lê bila. Firat ji navçeya Pirsûsa girêdayî Rihayê bû. Di sala 1995'an de ji qada Ewrûpayê tevlî tevgera azadiyê bibû, demekê li Zagrosê pratîk meşandibû. Li gorî texmîna min ji ber pêdiviya xwe ya perwerdeyê, ji bo Biryargeha Navendî, Gare pêşniyar kiribû. Piştî ku dewreya perwerdeyê qediyabû vesaziya wî li Pîrîzê hatibû çêkirin. Tevî ku hemşeriyê hevalê Feîq bû, qet nedişibiya heval. Aşkere xuya bû pir kêfî ye, cangiran e. Pratîka xwe ya borî bi nepixandinê vedigot, weke bêje "me pir tişt dîtiye", gotinên xwe li ser me ferz dikir. Li gorî wî yekanebûna tiştên jiyîne ji ber cihê ew lê bû.

Jixwe Zagros dihate maneya xweragirtin û her lez û bezê. Metafora ku dikir wisa dinapixand, li pêşberê gotinên wî weke balonên temirîne me xwe dikişand qilifê xwe, ji bilî ku em bêjin ka lê binêre hevalekî çiqas zîrek bûye, me ti helwest nîşan nedida. Me çaya xwe vexwar, erzaqê ku me ji Gareyê anîbû me qontrol kir û paşê em ketin li ser rêya xwe. Hêdî hêdî Siyanê li pey me dima û ji ber tenê mayina xwe weke ku bi xemgînî li me dinêrî. Ji min re wisa hat, ji ber terkirinên bi salan Siyanêyê êdî ber xwe nedigirt. Lê bi ava xwe ya weke qeşayê ku weke şîr spî bû, bi araziya xwe ya bi xêr û bêr di cih de dihate fêmkirin ku gundekî pir xweş e. Li gorî ku Firat gotibû, gund ji aliyê balafirên Sedam

ve bi awayekî giran tê bomberankirin, ji ber vê yekê gundî cih û warê xwe yanî gundê xwe, bîranînên xwe, dar û berên xwe diterikînin ji bo ku xwe xelas bikin li navçe û gundên derûdorê belav dibin, weke berfa biharê ti kes li wan deveran namîne. Wî jî, ev agahiya ku ji hevalên ji xwe kevntir girtibû vediguheste me. Di navbera Siyanê û gund û navçeyên derûdorê de nêzîkî deh kîlometo mesafe heye. Siyanê hêlîneke teyr û bazan ku li kuntareyên Gareyê ye. Heta ez dizanim hin Behdîniyan (Behdînî, navê ku Kurdan li herêmên weke Zaxo, Dihok, Amediye, Şêladizê, Barzan kiriye) li ser siyanê gelek lawikên şînê û stran gotine: Yek ji van hê di bîra min de ye, dibêje; "Siyanê, Siyanê, kevoka li ber çeman ê, dilê min li te ma, çi bikim dewran yeman ê". Ev çarîn bi rastî jî trajediyeke Kurdan e. Çerxidewran li cihên nû bi awayên nû dihate dubarekirin.

Li aliyekî êdî Siyanê ji ber çavan wenda dibû, li aliyê din xumaxuma Ava Xazir weke ku bixwazibe bêje ew çiqas kûr û bi heybet e li guhê me diket û xwe dida naskirin. Ava Xazir xwe pêşandaneke rengên cur bi cur e. Dişibe golên biçûk ên Pamukaleyê, lê ne spî bi şîneke dişibe keskê, û bi awayekî nazenînî diherike, weke ku nexwazibe xwe biêşîne. Geliyekî çiqas xweş e... Ji aliyekî ve em di nav teht û kevirên wê de hildikişin û dadikevin, hin caran laşê xwe xwaromaro dikin û rast dikin û dimeşin, ji aliyê din ve jî çavekî me her li xweşikbûna avê ye. Di mîtolojiya Yewnan de periyên deryayan hene, jê re dibêjin Sîrene. Li gorî Homeros eger ku Odeyyseu guhê xwe negirtana û li Sîreneyan binêriya, ber bi amûrên mûzîkê ku lê didin biçûya, dê

keştiya wî li tehtan biqelibiya û biqulupiya û heya bi heya ew ê bibûna dîlê Sîreneyan. Armanca periyan ew bûye ku bikevin şiklê hevsera Odeyyseu û banî wî bikin û destûrê nedin da ku ew derbas be. Ya ku pêwîst bûye ew bike jî guhê xwe li amûrên

mûzîkê û lorînên periyan bigire. Odeyyseu bi awayekî serketî vê tektîkê pêk tîne û ber bi mala xwe ve dikeve rê.

Dema ku Xazir bi xweşikbûna periyekê li pêşberê me diherikiya nedibû ku em lê temaşenekin. Li cem Xazir kîn û rika Sîreneyên keçên deryayê tine bû. Lê mirov nikare bêje ne weke Xwedavendan bêguneh e. Hema bêje ev çem diaxifiya. Li vî alî û li wî aliyê çemê li her derê tije guz û çinarên pir mezin hebûn. Bolîka hevalê Hemze bicihbûna xwe ya di devê vî geliyî de bi roleke stratejîk radibû. Geliyê Xazir deriyê Pîrîz bû. Hevalê Hemze jî li ber deriyê kelheyê leşkerek bû. Fîkandinên me yên ku xweşikbûna Xazirê dipejirand, bersiva merhabaya wê bûn. Hêviya min ew e, çemê ev dengê me bihîstiye. Ji ber ku hê di bîra min de ye min pir fîkand...

Meşa me ya şiverêyê xwe li ber germahiya Tebaxê ranedigirt. Li gorî Firat meşê têrê dikir. Li qiraxa Xazirê li ber xumexuma vê çemê razayin, xweyî îmtiyazbûnek ku gelek kes nikarin peyda bikin û xêr û bêreke mukemel a xwezayê bû.

Hevalê Hemza nuxteya şehîd Berxwedan ji xwe re kiribû cih û war, xebatên xwe ji vê derê bi rê ve dibir. Hemze, hevalek ku di sala 1992’an de ji Geverê tevlî bûyibû û vê gavê berpirsiyarê qadê bû. Di Kurdî de pêyvek bi navê ‘bedew’ heye; tê maneya bejn dirêj, lihevhatî û estetîk. Zanebûna civakî, hemû alî û awayên lihevhatîbûnê di vê têgehê de bi cih kiribû. Hevalê Hemze jî bedewekî bê nîqaş bû, jê guman nedibû. Zîrekbûna wî û li gel kesayetiya wî ya kedkar, xebatkar û pale ku rastiyeke Kurdan a di reftariya mirov de di kesayetiya wî de derketibû holê.

Hevalê Hemze dihate wateya bandorkirinê. Bi jiyana xwe, mirov dixist pey xwe û kaş dikir. Dema me li bolîka hevalê Hemze ku

min dişiband hemû bedewiyan mola dida, di dilê min de daxwazeke weke karkirina di qontrola hevalekî wisa de, ji tecrûbeyên wî sûd wergirtinê bi pêş ket. Hevalê Hemze jî di tabûra hevalê Ferman de hevalekî ku di rêveberiyê de cih digire bû. Eger ez ne şaş bim erkeke wî ya weke bûn alîkarê hevalê ferman hebû. Ev heq dikir. Ji ber ku ji aliyê xizmetê ve yanî ji aliyê fedakariyê ve weke yek ji kesekî herî li pêş, di wateya subjeyên leşkerî yên vê felsefeyê de bê guman hevalê Hemze ev heq dikir. Rêgeza herî diyar a sosyalîzmê xizmeta pratîkî bû. Kesên ji aliyê kedê ve li pêş, dihate maneyê ku bi rastî jî sosyalîzm fêm kirine. Weke formasyoneke îdeolojîk sosyalîzm di jiyana madî de ked bi xwe bû. Sosyalîstiya kesên li kedê biyanî bûne, ne mijara axaftinê bû. Ev herî zêde ji aliyê gerîla vedihate zanîn.

Min dema li ser hevalê Hemze dinivîsand xwe di nav deryaya hestan de dît. Ez ji wê baweriya xwe piştrast im ku dê her hewldana îfadekirinê nîvçe bimîne.

Ewqas aliyên wî yên bi gotinê nayên ziman hene, eger wî bi gotinan bînim ziman sêra wî têkdiçe. Dê teqez weke refa kewên daketine ser avê, hevok ê revok bimînin yan jî ji xwe şerm bikin.

Dema min agahiya şehadeta wî ya di sala 2010’an de stend, qudum li min şikestin û demeke dirêj ji min deng derneket. Tebî min ev ji ti kesî re venekir. Min xemgîniya xwe di dilê xwe de hilgirt. Di rewşek ku rêwiyê rêyeke watedar bûm de nedibû li ser biencambûnê qedînê zêde bikim. Jiyan meşa di nav agir de bû û ti kes ne garantorê vê bû, jixwe hewce jî nedikir.

Gelo em wê rojê li nuxteya Şehîd Berxwedan man yan na? Wisa xuya ye bîra min nekariye li ber ewqas salên di ser re derbas bûne

xwe ragire. Bi rastî jî min ji bîr kiriye. Lê tê bîra min, dema em bi mêwanperweriyek ku westabûna mirov bide jibîrkirin re rû bi rû mayibûn, kêm mabû em rabin ser lingan. Lê ji mêjde Firat dest pê kiribû têkiliyên xwe bi pêş bixe. Dixwest sosyalîteya xwe ava bike. Nêzîkbûnên ku ew ê demeke dirêj li vê qadê bimîne nîşan dida. Bi lez û bez pir dipirsiyan, dixwest rêveberî û qademeya navîn nas bike. Min, dema Firat li gel Şehîd Haşimê Şirnexî û Şehîd Hemze diaxifiya, cara destpêkê navê hevalê Feîq Suruç bihîst. Firat, hevalê Feîq nas dikir. Di bolîka Sîpan de weke fermandarê taximê erk dikir. Eger şaş nayê bîra min, piştî qada Rêbertiyê demeke dirêj li Zagrosê mabû û hevalekî dihate naskirin bû.

Firat, piştî ku ‘pêwîstiya xwe ya sosyal’ qedand, bi hevalan ez dam naskirin. Derbarê min û du hevalên li cem min, li gel wî notek hebû. Lê ji bo naveroka notê ti agahiyên me yên fermî tine bûn. Not ji berîka xwe derxist û dirêjî hevalê Hemze kir. Hevalê Hemze kêra maketê ya xistibû berîka jor a êlekê xwe derxist, pê lasqaya ser notê ku bi baldarî hatibû pêçandin jê vekir û not vekir. Piştî xwendineke baldar, refleksa wî ya destpêkê bû, ji binê lingên me heya bi ser serê me bi awayekî dûr û dirêj me di ber çavan re derbas bike. Me her sê hevalan, em dihizirîn ev ewir ne yên xêrê ne. Gelo çi dinivîsand di nota destê wî de? Paşê ez fêr bûm ku hevalê Hemze ji ber tiştên di notê de nivîsandibû, amadekariya pêş dikir ku min tevlî bolîka xwe bike. Derbarê min de bibû xwediyê agahî. Eger gotin di cih de be nota di destê wî de qerneya me bû. Me serê xwe xistibû ber xwe, bi ewirên revok bersivên kurt dida, şerm û fediya ji ber ku me nedikarî em nûbûna xwe veşêrin li ser me bû. Vê şermê, xwe dispart cewhereke watedar.

Niha di rewşek ku di zindana Sîncanê de di vê astê de noqî nav deryaya bîranînan bibûm weke ku min bêriya wê şerm û fediya

xwe dikir. Fedî kirin di hinava xwe de fezîletê jî hildigire. Fedî kirin mertala parastinê ya mirov e. Lê hestên me çiqas paqij bûn. Her tişt di spîbûna berfê de bû. Bi nazenîniya berfa pir paqij a bê deq; bêyî bizane da ku dê bikeve li kîjan cihî û bêyî ku di xema wê de be bê bask xwe ji azman berdaye xwarê. Zemîna madî ya bîranîna me li gel hevalê Hemze li nuxteya Şehîd Berxwedan pêk hat. Hevalê Hemze ku xwediyê karîzmeyeke bandorker bû, destpêkê di mirov de baweriyeke wisa pêk dianî: bawerî, wêrekî, disîplîn û zîrekbûn. Di têkiliyên xwe yên li gel hevalên bi derûdorê re de diyar dibû ku heval, ji hevalê Hemze pir hez dikin. Bi rastî hevalê Hemze pêşengek bû, li şûna terzeke navendperest, terzek ku îradeya takekes derdixe holê, dihêle ku takekes bi xwe re hesta berpirsiyariyê bi pêş bixe, ruhekî kolektîf biafirîne, zehmetiyên jiyanê bi mîzah û hanekan pêşwazî dike û nerm bike, weke bê daqurtandin lê bike, di şert û mercên herî zêde zehmet de jî bizane bi terz û tempoya xwe ji bo hevalan bibe çavkaniya moralê. Neh, deh mehên ez li cem hevalê Hemze mayime ji bo min bû tecrûbeyeke pir mezin. Ez ji wî gelek tiştan fêr bûm. Di jiyana min a ji wê bi şûnde, girêdanê bi têkoşînê û duristiya wî li ser min zêde bandor kiribû. Di perwerdeyên ku dida de hema bêje weke ku çalakiyek qoordîne dike bû. Hemû pîvan û taybetmendiyên reftariyên jiyana şer weke ku li ser hemû hestên wî serweriya xwe ava kiribû. Di nav têkoşînê de pijiyabû û timî danehev û tecrûbeyên xwe bi derûdora xwe re parve dikir.

Bi taybetî kêrhatibûna wî ya di pratîkê de dibû sedem ku dilê mirov biçe kar û xebatê. Erzaqê bi hestiran ta ji Deşta Nahlê, ji gundên Aşûriyan bi hezar zehmetiyê dihate anîn, di bin qontrola hevalê Hemze de bi nazenînî ji hev dihate cûdakirin, dihate sererastkirin. Ev xebat hê zehmetir bû ku mirov ji gundekî erzaq

bîne. Ez hevalê Hemze dişibînim Berxwedanê. Ji ber ku bi rastî jî berxwedêrek bû.

Piştî ku me li ser şiverêya Xazirê ji hevalê Hemze xatir xwest em ketin li ser rêya xwe ya mayî. Dema em ji nuxteyê bi rê ketin, me zêde bi xwe re erzaq ranekir. Ji ber ku tabûra Pîrîzê ya di bin berpirsiyariya hevalê Ferman de nêzîk bû. Yanî tabûra me ku em ê biçûnê û tevlîbûna.

Dema em di şiverêya teng û asê de dimeşiyan ne ku ez nehizirîm, gelo ez ê karibim careke din li nuxteya bi navê Şehîd Berxwedan dihate naskirin bizivirim (ya hê rastir bêm cem hevalê Hemze). Weke min berê jî diyar kiribû hevalê Hemze ez xwestibûm bolîka xwe û tevî firat ji bo hevalê Ferman not nivîsandibû, paşê ez vê fêr bûm. Tepeyê Sor, li bakurê Pîrîzê li Rojhilatê Çiyayên Heftebax çiyayekî wolqanîk e. Yanî çiyayên ku beriya roj biçe ava, wê sîbera xwe dixe deşta mezin û kesk û şîn a Pîrîz ku dişibe senîkekê. Di navbera girên Gareyê ku ber bi Pîrîzê ve didomin û bakûrê rêzeçiyayên Heftebaxê de Kelheya Babîl heye. Ev kelha weke naşibe tiştê destpêkê tê bîra mirov a weke kelheyên împaratoriyan ên derûdora wan bi sûrên mezin û bilind hatine dorpêçkirin.

Her ku mirov ji jêr ber bi jor ve hildikişe, teng dibe û derûdora wê asê û kendal e, li her du rexan, li dawiya sirtên Heftebaxa dişibe birceke ji aliyê du newalên rexên wan asê ku xwe berdide nava

Pîrîzê ve hatiye pêkanîn, girekî serê wî dişibe weke bîran heye. Bi rastî mirov nikare bêje bi temamî girek e jî. Ji ber ku weke pê leyistine xuya dibe. Şaristaniya Babîl şaristaniya herî qedîm a Mezopatamyayê ye. Babîl tê maneya Mezopatamya, dîrokê û Rojhilata Navîn. Tevî Mezopatamyayê di nava Mezopatamyayê

de hesibandina herêmê û demekê di bin qontrola Babîl de mayin, nav piştrast dike. Aşkere ye Kafya ji bo bicihbûneke wisa destdayî ye. Her sibê li ser pelçîmên dar û giyayên wê xunav dikeve, hemû giyayên şîn, hemû şînatî weke stêrkên li ezmanan diteyisin û ser pelçîmên wan ji dilopên mezin ên avê tije dibin. Dema tav bi hemû germahiya xwe ve xwe dide jor, di hemû şînatî, giya û çîçekan de jî zindîbûnek xuya dibe. Jêdera jiyanê gihaştiye hawara wan. Niha rewşa wan ku di bin dilopên avê de stuyê wan xwahr bûye, sekna wan a ku hatine çewisandin diçe û ji nû ve bi ser xwe ve tên, silav li tavê dikin. Dema hîs dikin dê tîrêjên Rojê ji nû ve wan zindî bike, hêdî hêdî stuyê xwe yê xwahrbûyî dizivirînin. Hemû tevgerên wan bi awayekî rîtmîk pêk tên û dilopên teyisok ên avê, giran giran ji pelçîman tên xwarê, ji sukra wan xwe berdidin erdê û bi erdê re yek dibin. Bi bilindbûna tavê re mijeke tenik dikeve li ser Kafyayê.

Ev hê zêdetir hilma avê ku dema germahî zêde dibe, zêde dibe ye. Tu dibêjî qey ji êvarê heya bi sibeyê baranên ekvatorê barî ye. Ji ber vê yekê sibê di nava giyayê şîn de tevger kirin tê wateya ku we şilbûn girtiye ber çavan. Rewşa herî baş a şilbûyinê ev e. Dema ber bi nîvro dibe bi zêdebûna germahiyê re Kafya zuwa dibe, weke cihekî demî lê tê. Min ti herêmên weke vê ku evqas di demeke kurt de û li pey hev rewşa xwe diguhere nedîtiye. Hema bêje Deşta Kafyayê zindî bû. Dişibiya mirov. Sibê ber bi berbangê ve hewayeke sar û bi xumam hebû, dema germahiya nîvro xwe nîşan dida Kafyayê sed û heştê derece xwe diguhert, eger gotin di cihê xwe de be ji têhniyan lêvên wê diterikîn.

Ez hizirîm ku gelo Babîlên ji gelên qedîm ên Mezopatamyayê bûn ji ber vê yekê Kafya hilbijartibûn? Ma çima wisa nebûya? Ev dever Mezopatamya bû û li vê derê dîrokîbûn û rojanêbûn di zikhev de dihate jiyîn. Dîrok ji cih azade nedihate jiyîn. Diviyabû

cih teqez li gel xwezayê ahengeke temam pêk anîba. Mekan cihê pêk hatina dîrokê bû. Jixwe ma  em dîrokê jî ji deverên ew pêk hatine nas nakin? Ma Sumer bi Nîpûrê, Aşûr bi Nînowayê nas nakin? Dema ez bi rastiya vê heqîqatê difikirim, gaveke din nêzîkî rastiyê dibim.

Hevalê Ferman tam jî di destpêka Kafyayê de li aliyê çepê yê ku cihê Kafyaya kevn e xwe bi cih kiribû. Ji Bergarê ber bi Kafyayê ve aveke hema bêje rengê wê ber bi kesk ve ye diherike. Ev ava bi ava ku ji aliyê Tepeyê Sor ê Kafyayê tê ve dibe yek û Çemê Xazir pêk tîne. Ev çem, yên dibînin matmayî dihêle. Ji beriya vê min hevalê Ferman nedîtibû. Lê min navê wî xweş bihîstibû. Min dizanî ku hevalekî kevn û xwediyê tecrûbe ye. Li cem me pêvajoya havînê, pêvajoya ku kar û xebat herî zêdê ye.

Em weke moriyan ji bo zivistanê amadekarî dikin. Ji bo ku di şert û mercên giran ên zivistanê de ewqas mirov bi tenduristî bên derxistin biharê, bên amade kirin divê hemû amadekarî temam bin. Hevalê Ferman jî bi vê zanebûnê piraniya hevalan xistibû tevgerê. Pêvajoya siyasî û leşkerî, konjoktura polîtîk bi nediyariyan tije bû. Nediyariyê li cem xwe fikar jî dihewandin. Dagiriya DYE’yê ya li ser Iraqê dest pê kiribû, êrîşa emperyalîst ji bo ku herêmê ji nû ve dizayn bike, bû. Ev pir aşkere dianî ziman û nîşan dida ku ji bo armancên xwe pêk bîne di pratîka xwe de çiqas xwediyê biryar e.

Her wiha em tam jî di navenda agir de bûn. Me nedikariya em bêxem bin û bikevin xafletê. Ji ber vê yekê lez hatibû dayin kar û xebatê.

Me hevalê Ferman û sê, çar hevalên li gel wî di ketina Kafyayê de dît. Bi rûyekî li ken em pêşwazî kirin. Em vexwendin mangaya

xwe. Ew li pêş û em li pey wî çûn holikê û rûniştin. Cihê mangeyê xweş bû. Ji ber ku li ser avê hatibû avakirin hênikbûneke xweşik diafirand. Manga di rêxistinbûna leşkerî de yekeya herî bingehîn e. Piştre dest pê kiriye ji bo cihên ku hevalên li heman mangeyê ne jî bê gotin mange. Wisa ye; cihê mangeya te nîşan dide ku tu di kîjan mangeyê de yî. Hevalê Ferman jî ji bo xwe û hevalên li cem wî dimîne li ser wê ava xweşik avahiyeke estetîk çêkiribû. Xwediyê dîmeneke xweşik bû, tê de rûniştina wê jî heya bi asta dawiyê rehet bû. Heta hevalê Ferman bi vê qîma xwe neanîbû, ji ber nerehetiya ji pêşiyan kuleyek peyda kiribû. Ev rûbera ku ji bo xeveke bêkêmasî şert e weke konê şopgeran tê vedan, tê vedan û di nav de dihate razayin.

Piştî ku me hinekê bêhna xwe veda ji bo xwarina nîvro hevalan banî me kir. Sewzeyên ji bostan hatibûn anîn, bi nazenînî hatibûn sorkirin, afirîneriya gerîla xwe nîşan dabû. Me got, bi heman sewzeyan du-sê cur xwarin çêkirin kêrhatineke aîdî gerîla ku tenê ew karibe pêk bîne û me dest bi ken kir.

Di vê navbera de Firat nota ku li gel xwe aniye da hevalê Ferman. Demekê her du axifîn û veguhestin. Roja dotira wê bi axaftinekê li gel min nîqaşek meşand. Piştî ku li ser rewşa hevalên tabûrê, pirsgirêkên me yên xwe gihandina asta rêxistinî, di aliyê hejmar de kêmasiyên hene qederekê axifî, ji min re got “ez dixwazim te li cem xwe ragirim”. Maneya vê diyar bû: Ewlekarî. Di grubên ewlekariyê de mayin bi piranî ne vesaziyek ku zêde tê xwestin bû. Sedem jî, li gorî bolîkek pratîkê zêde sînordar mayin bû. Gerîn, tecrûbeya naskirina araziyê bi pêş nediket. Ev jî ji bo kesekî/e nû ketiye nav jiyanê zêde ne balkêş bû. Bûn hêza pratîkî, dihate maneya tecrûbeyê. Di vê astê de girîngî dan pratîkê ji ber pêwîstiya jiyanê bû.

Hewce dike tu bizanî li çiyê çawa bijî û di demeke zû de adepte bibî. Ev pêwîstiyek e. Sekna sînordar, pêşketina kes asteng dikir. Ev seknek ku pir zêde nedihate tercihkirin bû, di bin redkirina min de ev hest diraza; daxwaza hê zûtir û hê bi lez adaptasyona jiyana çiya û pratîzebûn. Ev ê bibûna sedem ku ez di demên pêş de erkên hê mezintir û girantir nas bikim, ji bo xizmeta gel û welêt derfet biafiranda. Hesret û daxwaza ji bo rizgariya gel û welêt, hestên min zêde dikir. Ev jî li cem min dibû sedema kelecanên nayên astengkirin. Ev çi bû? Min li pêşberê hevalê Ferman û biryara wî wergirtiye, helwesteke çawa nîşan bida? Jixwe weke rêveberiyekê ev biryar stendibû û pratîze kiribû. Hurmeta min a bê dawî ya ji bo heval, pêşî lê digirt ku ez enerjiya xwe nedim heval  û ez kaşî nava bêdengiyê dikirim.

Hê jî vê bi xwe re hildirim. Tevî ku pir ne rast e nakevim xaşimiyeke bi awayekî rasterast şaş derxistina hevalên xwe. Ev refteriyek ku ji çanda me ya civakî hatiye qezenckirin e. Bi qasî rêzdariyê di hinava xwe de exlaqeke pir mezin jî dihewand. Dema ez pê difikirîm ku vesaziyeke ne li gorî min e, min dikir û nedikir nedikariya weke dixwazim ji cewher tevlî bibim. Min ji hevalê Ferman re ti carê negot, “hevalê Ferman bi rastî jî vê vesaziyê ez kêfxweş nekirim, ji ber ku min hêzên pratîkî dixwest. Ya rast rewşa min a bêmoral ji her helwest û sekna min dihate fêmkirin. Ne gengaz bû ku hevalekî weke Hevalê Ferman ê xwediyê tecrûbe, hevalekî weke min nû û reftariyên wî fêm neke. Dîsa jî tevî her tiştî min ev daxwaz û hesret ji xwe re hişt. Weke qet ji bîr nekim xist mêjiyê xwe.

Belê, weke ku ez pê difikirîm bûyer pêş ketin. Ketim nav hêza bolîka hevalê Hemze. Tebî, bi lezeke bi qasî texmîn neyê kirin, di nava çend rojan de. Min nedikariya li ber daxwaz û xwestekên min ên pratîkê ku her diçe zêde dibûn bibûm asteng. Daxwaza min a herî mezin ew bû ku sîpêla di dilê xwe de beralî bikim, enerjiya xwe ya potansiyel weke kedeke şênber û li ber çav e, bikim. Ji ber vê yekê min dixwest biçim gel Serhildan Agir, yan jî hevalê Hemze. Dema ku em tevî Firat di Kafyayê re derbas dibûn,

min amadekariyên hevalê Hemze û hevalên wî didît. Vê ji li cem min hest û daxwazeke weke, divê ez kêliyekê ji beriya kêliyekê tevlî xebatê bibim û ji ser xwe psîkolojiya nûbûnê biavêjim texrîq dikir. Hema bêje min dema rewşa wan a di nava liv û tevgerê de didît, ew dihasûdîn û weke mêvanan li xwe dinêrî. Ev sekna min bi min pir giran dihat. Kêliya ku ez tê de, firsendeke dîrokî bû. Ev keştî rêwîtiya jiyana nû bû û tovên hemû nûbûnan di cewhera xwe de hildigirt. Di vê heqîqetê ku ked û azadî neçarî hev in û hev didin hewcekirin de, hesabên biçûk û bêkelecanî, kêfiyet û bêxemî, bêdilbûn bi temamî ji moral dayina hêzên dijber cûdatir nedihate ti wateyên din. Bi van pênaseyên karekterên ku taybetmendiya  pergala dagirker a li ser gel û welatê me bûn, ti tişt nedihate kirin.

Bi hatina min a bolîkê, bûna min karwançî bû heman tişt. Tevî ku taybetmendiyên min ên jiyana gundîtî hebû jî hê  ne xwediyê fêrbûnên jiyana gerîla û zekaya pratîk a gerîla bûm. Diyalektîka Tevgera Azadiyê wisa dimeşe; kesek jiyan dike û fêr dibe, bi pratîzebûnê tecrûbe qezenc dike. Tecrûbe, gencîneya te ya ku te di encama hemû fêrbûnên pratîkê de qezenc kirî ye.

Zekaya pratîkî, ji bo bi her awayî pêwîstiya jiyanî, bi lez hilberîna hizirên encamgir e. Kêliyên wisa hene, şert û merc wisa xwe ferz dikin, pir bi lez fikirîn dibe pêwîstiyekê. Biryargirtina ji nişka ve dibe ku jiyana mirovan rizgar bike. Yan jî kar û hewldana pratîkî dixe li ser rêya rast, meşa di rêya rast de didomîne.

Seferên ji bo erzaq ku me li Deşta Nahlê dikirin hê jî tên bîra min. Piştî şevên dirêj ku ji westînê em ji hev diketin, dema em digihîştin kampê tiştê me herî zêde pêwîstî pê didît, xwarina me ya germ ku nedihate guherîn û çaya me ya bêhnvedanê bû. Hevalên me di mijara xizmetê de ji fedakariyê xwe nedidan aliyekî û bi hesteke mezin a berpirsiyariyê û hemû westabûna me bi me didan jibîrkirin. Hevalekî/ê digot “wê germahiyê li gel ti tiştî naguherim”. Di hemû şeran de,  jêdera hêviyê ya hemû şeran, li pey teqez germayek ku li hêviya wan e. Jiyana gerîla jî ji vê ji

vê heqîqeta gerdûnî para xwe distîne. Teqez, li pey, hevalên li mangeyên me dimînin bi awayekî xwezayî ji bo ku hevalên diçin erk û wezîfeyê herî baş pêşwazî bikin û ji wan re bibin “hêviyên germ”, amadekariyên herî baş dikin û li ser vî esasî jî weke ku di pêşbirkekê de bin tevdigerin. Ev pêşbirkeke şoreşgerî ye û di kedê de sînor tine.

Pêşwazîkirineke wisa di mirov de hesta ku dubare bi wê rêyê de çûyinê û dubare çûyina erk û wezîfeyê zêde dike. Ji neçariyeke rêziknameyê zêdetir hemû ev nêzîkbûn li ser bingeha dildariyeke xwezayî tê kirin. Weke min aniye ziman, hê jî di bîra min de ye ku hevalên ne xwediyê zekaya pratîk û çanda fedakariyê ne jî dem bi dem di vegera kar û xebatê de bûye sedema bi çi awayê bêmoraliyê.

Tevî her tiştî pratîk zeka, pêşdîtin e, empatî ye. Di mirov dibe sedem pêşketina zanebûna berpirsiyariyê û li ser karekterê bandoreke mezin dike.

Me ew zivistan di navbera Gareyê û Pîrîzê de, li palên aliyê bakûr ê Şehîd Berxwedan derbas kir. Ji ber zêdebûna hêjmarê bicihbûneke wisa hewce dikir. Em komek heval di bin înisiyatîfa Sîpan de çûbûn vî cihî û li vê derê bi cih bûyibûn. Sinyalên destwerdanê û operasyonên muhtemel ên li ser Başûr bihatana kirin, stendina tedbîran ferz dikir. Sala 2003’yan ji aliyê me ve saleke girîng bû. Sedema wê ev bû; rastiya komploya ku di 9’ê Cotmeha 1998’an de dest pê kiribû û di 15 Sibata 1999’an de bi esareta Rêbertiyê gihaştibû qonaxeke girîng, bi hemû giranî û hesabên xwe berdewam dikir. Di heman salê de pêşketineke wisa derketibû holê; DYE’yê li petrolên Iraqê xwedî derketibû, dîsa ji bo ku dewletên di cîhana du qutbî de alîgirê Sowyetê bûne bîne ser rêya xwe û bi armanca li Rojhilata Navîn hegemonyaya xwe ya siyasî û leşkerî ava bike dest bi mudexaleyê kiribû.

Komploya Navneteweyî kiribû hedef ku tasfiyeyê bibe serî. Dê ev tasfiye bi destwerdanên neyekser û nerm bihata kirin. Yek ji wan

jî asteng bike ku herêmên ji ber paşde kişanê vala bûne neyên dagirtin. Bi psîkolojiya hewl tê dayin bê afirandin dixwest mirovan bixin bin bandorê. Hewl didan qeneat û psîkolojiyekê pêk bînin ku çûyine Bakur vala ye û dê ti destkeftên wê yên şênber nebin, ev ê bibe awayekî xwe dubare kirinê. Hin kesan hewl dida tabloyeke bi mij û moran û tarî bê afirandin.

Gare bi taybetmendiya xwe ya li cihekî herî dûr ji van hemû nîqaşan bû, kêm be jî ji derveyê van nîqaşan dima. Lê belê dîsa jî ji ber ku hin derûdoran ev psîkolojiya dihate afirandin belav dikirin Gareyê jî ji vê nesîbê xwe wergirtibû. Di rewşên wisa yên krîz û tevlîheviyê de tiştê herî girîng ew e biryarên ku rewşa kaotîk berevajî bike, di ketina rêyeke rast a rêxistinê de pêşengî bike girtin û li cihê rast sekinîn e.

Ne ku bandorên Komploya Navneteweyî tine bûn. Mînak, yek ji van bandorên herî aşkere dihate dîtin jî fikarên di mijara vê hemleya ku bêyî hebûna Rêbertiyê hatibû destpêkirin dê çawa bihata meşandinê de bû. Aliyekî din ê vê bendewarî û psîkolojiya ku bi awayekî pir xwezayî bi pêş ketiye jî, daxwaza ji ber kîn û berteka li dijî komloya navteweyî derketiye holê bi pêş ketiye veguhestina pratîkê bû. Dê hemleyeke bêyî Rêbertiyê pêk bihata û azadiya Rêbertiyê pêk bianiya, şert û mercên çareseriya pirsgirêka Kurd biafiranda, bandorên komploya navteweyî ku di nav me de ne îmha bikira û bi vî awayî psîkolojî û sekneke saxlem bi pêş bixista û qeyim bikira.

Hevalê Amed Melazgir weke rêveberiya cebheyê ji bo teftîşê hat tabûra me ya Pîrîzê. Di civîna ku hatiye kirin de got, “ji bo ku hêz bê veguhestin Bakur biryar hatiye wergirtin û bi yek bolîka ku ji tabûrê bê pêkanîn dê heval bên şandin Dêrsimê”. Ev biryarek bû dê bihata pratîzekirin.

Hevalê Brûsk di meha Adarê ya heman salê de li şûna Sîpan hatibû tabûra me. Ji ber ku Sîpan ji bo perwerdeyê hatibû kişandin biryargehê, li şûnê, hevalê Brûsk weke fermandarê bolîkê erkdar

bûyîbû. Hevalê Brûsk berê di pêvajoya 1994-2000'î de hevalek ku li Dêrsimê xebat meşandî bû. Hevalê Brûsk herî dawî li Geliyê Teyarê tevî sih û heşt hevalên li gel wî bû stêrkekê. Hevalê Brûsk bolîka xwe girtibû, bi awayê înisiyatîf karanînê talîmata amadekariyan dayibû. Diviyabû rasterast hemû hêza xwe bigirta, bi awayekî cûda xwe bi cih bikira û dest bi amadekariyan bikira. Lê belê di nav vê hêzê de hevalên ne amade, yên ji bo herêmên cûda pêşniyara wan heyî dê bihatana ragirtin. Valatiya heyî di nava hêza cebheyê de  jî ji aliyê hevalên pêşniyarên wan heye yên bi xwestek ve dê bihata pêşwazîkirin.

Hevalê Feîq di hemû vê pêvajoya aloz de xwe saxlem ragirtiye û li cihê rast sekiniye. Bi misogerî sekna wî xizmeta rêxistinê kiribû, bawerî dabû. Weke hevalek ku qada Rêbertiyê dîtiye, jiyaye girêdana bi Rêbertiyê re nedabû binpêkirin û sîber nexistibû ser. Herêm dîtibû û fersenda ji nêzîk ve naskirinê peyda kiribû. Ev firsenda wî şenseke mezin bû. Vê awantajê hêz dida wî bi xwe. Vê hêzê bi awayekî bêyî bikeve nav hesaban ew dehfî nav berpirsiyariyê dikir. Di şert û mercên wisa de bêguman pêşniyar pêşxistin pir girîng e. Hevalê Feîq bêyî ku jê fikaran bike. Di nav bolîkek taybet de cihê xwe wergirtibû. Ji bo cihê ku jiyana şoreşgerî wî bibe wê derê amade bû. Ev girêdaneke mezin bû. Dê biçûya Dêrsimê. Dibe ku guhê xwe dabû ser lorîna di dilê wî bi xwe de veşartî. Daxwaza bersiv dayinê ya ji bo xwesteka mezin a azadî û rizgariyê ya di çavên gel de xwe daye der ku êşê, tevkujiyan, çewisîn û zordariyên tirsa di dilê gel de afirandiye bû. Îfadeya hemû xeyalên zarokatiya wî bû, meşa ber bi Dêrsimê; evîna dan pey evîndara wî ku jê direviya bû. Di hinava welat de ew gotinên veşartî yên hebûnê di hinava welet de veşartî bûn. Dikaribû destê xwe dirêj bike û ji hinavê derxîne jî. Hesta ku ew mezin dikir ev daxwaz bû. Ji deşta demî ya heranê  ya sor sorî, hin caran ber bi zerbûnê ve diteyise ev hest stendibû; li erdek ku biçîne digerî.

Dikarim bêjim me hemû havîna 2003'yan tevî hevalê Hemze bi hev re derbas kir. Jixwe dema ku hevalê Brûsk înisiyatîfa xwe bi

kar anî, em ji hêza giştî ya tabûrê qetiyan. Qet ji bîra min naçe, ew nuxteyê ku em lê kom bibûn ew qes mirov bêzar dikir, di wê kelakela germa Gareyê de ku mirov dişewitand, mirov nedixwest yek deqîqayê jî ji binê sîbera berûyan derkeve. Giyayê bi rengê xwe yê şîn ku biharê hawîrdor girtibû hema bêje weke ku ketibûn rewşa qaşil girêdanê, zer bûyibûn û nedikarîn xwe li ser xwe ragirin û piraniya wan weke miriyan wisa xwe di erdê re dirêj kiribûn.

Strîmişk, pelên sor bûne yên rêbazan bi ber bayê xweş tê yê başûr ketibûn, li hewayê di ber lorînekê de dihejiyan, bi vê rewşa xwe ya carekê diketin erdê û carekê bilind dibûn, hem xemgîn û ewqas jî kêfxweş xuya dibûn. Bi taybetî danên nîvro ti kesî ji me nedixwest sîberên xwe yên hênik biterikîne. Tiştê ku em ji vê nîmetê qut bikira, rewşên neçar ên jiyanê bûn. Mînak, nobeda rojane bi qasî saetekê dihate girtin, yan jî çûyîneke ji bo erkekê hebe amadekariya bihata kirin. Tebî eger mirov ne xwarinpêjê wê rojê be. Mitfeq jî rewşeke neçar ku vê rehetiyê xerab dike bû. Mitfeq dihate wê wateyê ku ji sibê heya bi êvarê, tevî wê germahiyê li ber agir pijiyayinê. Bi qasî bidilbûna xizmet û kedê, dema bi sotîneriya agir, germahiya tawê re dibû yek, dîmena derdiket holê ne ewqas pir xweşik bû.

Em wê demê bi hevalê Brûsk re kom bûn. Tebî di rojên destpêkê de ji ber ku em xwediyê ferq û cûdahî bûn em neçûn ti erk yan jî cihekî dûr, yan jî em neşandin. Ji ber vê yekê diviyabû me ev rewş jiyan bikira. Ji ber vê rewşa me, hevalê Feîq jî ne ku dilê xwe nedihişt û dem bi dem mudexale nedikir. Li gorî gotinên hevalan rêyeke dirêj hêm jî pir dirêj li pêşiya me bû. Me dê pêvajoyên zehmet jiyan bikirana, rêwîtiyeke bê veger a azadiyê bû. Hevalê Feîq ji beriya vê pratîka Zagrosê borandibû. Lê ev cara destpêkê ye ku diçû eyaleteke weke Dêrsimê dûr û qada Bakur. Bi qasî fikarên wî, kelecana wî ya xwe dispêre tecrûyên wî û bendewariyê wî hebûn. Grûba me bi derketina hevalên bê dil û hatina hevalên nû, hêdî hêdî pêk dihat.

Maneyê vê ev bû: deşta Kafya terikandin, hê bi nava Gareyê de, nêzîkî hevalê Bahoz bicihbûyin; ev ê bibûna sedema ku eleqayeke nêzîk bi pêş bikeve, bi qasî zêdebûna derfetan, bi awantaja heval yek bi yek ceribandinê û pêkanîna şert û mercên perwerdeyê, dê jiyan di asta li gorî mercên Bakur disîplînîze bihata kirin. Empatiyeke hestiyarî ya manewî yan jî amadekariya teorîk, tenê aliyekî vê bû. Ya esasî ahenga jiyanî bû. Li gorî ya Başûr, jiyana Bakur hê zêde bi hatin, çûyîn û sift bû. Vê siftbûnê, ji aliyê tevlîbûna kedê ve û pratîzebûnê de hê zêdetir hewldan û bi ahengbûn hewce dikir. Ji ber vê yekê, ji beriya çûyina wî cihî bi qasî derbarê cih de bûn xwediyê agahî, pêvajoyeke perwerde û adaptasyonê ya xizmeta heman tiştî bike hewce dikir.

Derûdora Cihê ku em lê bûn daristaneke têrdar a darberûyan bû. Ji aliyê rojava ber bi başûrê rojhilat ve newalek diherikiya. Me pêwîstiya xwe ya avê ji vê newalê pêşwazî dikir. Tebî em rojên destpêkê qederekê pê re mijûl bûn ku nuxteya xwe çêbikin. Hema bêje her dever tije bi qamişên dirêj, giya û darên hişkbûyî  bû. Mitfeq û malzemeyên me yên lojîstîkê hema bêje tine bûn. Me dê ji sifirê dest bi her tiştî bikirana û perwerdeyeke sift bidîta. Dê ev perwerde bibûna perwerdeyeke neasayî. Hevalê Brûsk di demên çaya piştî nîvro ku em fêr bibûn de û min ê ti car tehma wê ji bîr nekira, ji berîka xwe tebaqaya xwe ya titûnê ya ku bi zîvê Alman hatiye neqişandin derdixist, destpêkê ew tiliyên xwe yên zirav û nazik bi zimanê xwe şil dikir û paşê kaxizên ku li ser 'paper cîgarette' nivîsandibû bi xweşikî tije ji titûnê dikir, bi wê tevgera tiliyên xwe yên lez û bez û kêrhatî cixare difitiland û cixara xwe ya weke ji febrîqayê derketiye ya ku aliyekî wî asayî, her ku ber bi aliyê pêşî ve tê stûr dibû dipêçand. Ji berîka xwe çaxmaxê xwe yê bi manyeto ku ji nûbûna xwe tiştek wenda nekiribû derdixist, piştî ku bi tevgereke nazenîn a destê xwe pê dixist û cixareya xwe jê pê dixist. Piştî dukeleke tarî dikişand hindurê xwe adaptasyona hevalan a li ser herêmê, asta wan a lêhûrbûn û ponijînê çavdêrî dikir û rojeva sohbetê diyar dikir.

Ji ber ku ti kes ji me derbarê qadê de ne xwediyê agahî bûn, me tenê bi guhdarkirinê qîma xwe dianî. Ji bilî ku em tiştên tên vegotin di bîra xwe de neqiş bikin, wan ji xwe re referans bigirin zêde tiştekî em bikin tine bû. Hin caran di sohbetên me yên ku piraniya wan ji aliyê hevalê Brûsk ve dihatin diyarkirin, li binê berûyên gur û geş ku tehma romanan dida mirov, li ber xweşikiya darên mezin ên çinarê ku mirov sermest dikir, bi awayekî nîv xeyal tiştên dihatin vegotin me xeyal dikir û kêliyekê em diketin nav xewn û xeyala  alegoriyên xwe li ser tehteke Dêrsimê hîs dike. Te digo qey bayê hênik ê Çiyayê Zel yan jî yê Mûnzûrê ku hinekê jî mirov diqerisand, ser çavên me dimelisand, li cem me hestek ava dikir û derbas dibû.

Bi axê re yek bûn hîseke taybetê mirov e. Naskirina axê, tê maneya zanîna daxwazên wê jî. Bi qasî fêmkirina ji nebatên wê, dar û ber û teyr û tuyên wê, ew taybetmendiyên tenê yên wan in li ser mirov hiştine, hesta di wan de veşartî jî derxistina holê ye. Bi xakê zanîn, di oxira wê de mirin e. Pêşiyan gotiye xak namûs e. Namûs nasnameya civakî ye, çanda civakî ye û etîka civakî ye. Namûs cihê ku tu li ser hatiye dinyayê ye. Ax tîmara ku te bi xwedî dike, şîrê dayikê ye. Ax welatê mezin e. Hemû civaka te di hinava xwe de dihewîne. Hêlîna ku çîrok tê de pêk tê û pêş dikeve. Ya ku ji hemû trajediya te re şahidî kirî ye. Ax qerîna ji hinava te bilind bûye dimêje; qerîn li gerdûnê jî wenda nabe di axê de jî. Eger tu bêyî ku biêşînî axê vedî, tê qêrîna di hinava wê de bibîhîzî û hîs bike. Ji bo vê yekê jî divê hesesiyetên te yên îdeolojîk hebin. Xak dikare bi şûnde qêrînê bide te. Ax pir zêde bîra mirov nû dike. Xwediyê kerameta pîrekî ye. Eger tu serserikî biçî bi erdê ve ji bo tu nêeşî tehta wê nerm dibe. Eger tu weke Kerbela bê deng bî, dilê wê dibe weke Mûnzûr. Hezkirina ji axê, di mirov de dibe sedema hestên mezin ên welatparêz. Yek ji çar elementên bingehîn e, zindî ye. Ew evîndara mezin e. Evîndarên wê kêm nabin, ne mumkun e. Ax hebûna te pêk tîne, tu hebûna xwe di asteke mezin de deyndarê wê yî. Aliyê azadiya mirov jî bi cih re eleqadar e. Cih, devera ku tu di hinavê de dest bi mezinbûnê dike. Mirovê/a bê cih, mirovê bê dem e. Mirovê dema

wî/ê tine. Dem û jiyana wî/ê ji hatiye dizîn. Dem di nava hebûnê de ye, alî û rehendeke hebûnê ye. Hebûna te çarenûsa te ya xweser e û taybetê te ye. Mirov xweserbûna xwe di cih-mekan de pêk tîne. Azadî fêkiya xakê ye. Divê mirov ji bo ku jiyana xwe qezenc bike xakê azad bike, parçeyeke ji xwe lê binêre û sûbjektîfiya wê di wateya şênber de pêk bîne. Welat ne obje ye. Welat can e. Mirov jî di wê/î canî de can...

Jê pişt rast im dema hevalê Brûsk guhdar dikirin hemû heval derdiketin rêwîtiyeke alegorîk. Hevbeşiya felsefîk di mirov de dibe sedema hestên dişibin hev. Pêkhatineke hevbeş jênerev e. Bi qasî tevlîbûneke encamgir, amadekariyeke rast xwe dispêre adaptasyoneke xurt. Ev rêbazeke encamgir ku pirî caran hevalê Brûsk serî lê dida bû. Eger tu tiştekî hez nekî, nikarî ji bo wî tiştî bimirî. Di hemû çîrokên jiyana biesil ên barhilgirên mezin ên evînê de timî tiştê derdikeve li pêşberê me ev aliyê heqîqetê ye. Hezkirin fedaîtiyê ferz dike.

Hevalê Feîq di hemû van sohbetên dûr û dirêj ên havîna germ ên tije ji xeyalan ku me nedixwest biqedin de bi daxwazeke mezin guh dida ser hevalê xwe. Hin caran xeyal û guhdarî kirin ewqasî sift dibû, hevalê Feîq radibû,  cihê xwe diguhert û molayeke motîvasyonê temam bike ya cixarê dida yan jî weke bêje “evqas empatî bes e” bi hanekî axaftinek digihand hevalê Artêşê ku li cem wî bû; “ka bêje Artêş îro te çend şekir xwarin”. Ya din jî ji bo ku hevalan ji xeyalên ketina nav qut bike dibe ku bigota, “heval saet bûn çend, bû dereng”. Dilên van hemû rêwiyên heqîqetê bi qasî ku vê evînê karibe rabike mezin bû. Hevalê Feîq mirovekî wisa bû. Bi qasî tê bîra min hê rasteqînî nêzîkî jiyanê dibû û ev terz esas digirt. Lê belê bi piranî dîsa wî bi xwe metafora hevalê  Brûsk ku digot, “ji teht û zinarên Dêrsimê hingivîn diherikiya” eger bi kenekî jidil vala dernexista, me dê bi awayekî cidî lê bawer bikirana. Ne ku hin caran seknên weke bêje ‘em ê biçin û bibînin’, li beranberê hevalê Brûsk nîşan nedida. Ji ber ku piraniya hevalan di jiyana xwe ya têkoşînê de cara

yekemîn evqas vegotinên li ser herêmekê guhdar dikir û li ser xweseriyên wê diponijî.

Vê nêzîkbûnê hin caran ne ku hestên nîv şîrove û nîvlêpirsînên wisa nediafirandin: “lê eger bi rastî jî ne wisa be, ne weke tê gotin be dê çi bibe, madem evqas xweşik e ma ji ber çi heya bi niha her kesî neçû û nedît, yan jî çavên romanivîsan şaîran tarî bûne ku nabînin”. Tê fêmkirin ku yên me heya bi niha li ser vê qadê nebûne agahiyên pir cidî. Yan jî bi awayekî pir xurt rewşa di ferqê de bûnê bi pêş neketiye. Tiştê ku tirajîkomîk bû ew bû ku rêbaza adaptasyonê ya ku hevalê  Brûsk pêk dianî ne ji rêbazên hemû hevalên ku li Bakur mayine cûdatir bû. Ne ku tenê em zarokên feqîr ên gel pê re rû bi rû mayibin. Min piştre hemû ew “ax” û of’ a hevalê Feîq bi vê ve girêdayîbû. Di pey çend salan de dema min hevalê Feîq li Dêrsimê didît û jê re digot, heval ji tehtan hingivîn diherike hingivîn. Li pêşberê vê haneka min wî bi kenê xwe yê jidil, kûr û giran, digot, “ma heval hê tu lê bawer dikî?”. Min jî ji bo ez ji vê rewşa xwe ya rebenokî xwe xelas bikim digot, bi rastî bi qasî te pê bawer kiriye min jî pê bawer kir”. Bi rastî em hemû di ferqa van gotinan de bûn ku ya li pey wê de dihate hedefkirin çi ye. Lê hevalê Brûsk li ser tiştê ji bo Dêrsimê digot zêde sembolîzm bar dikir û heya bi hûrguliyên wê tarîf dikir. Ji armanceke pir cûda zêdetir, ji bo girêdayinê xurt bike û îqnayeke saxlem bike ev dikir.

Niha, dema li ser van du hevalên bûne stêrk dihizirim, bi taybet bi min re ew qeneat çêdibe ku hevalê Brûsk qet jî ne şaş bûye. Weke kesekî bi wan re jiyaye bi rêya bîranînên wan di mêjiyê xwe de naqişkirinê ji bo xwe bigihînim wan min pirek ava kir. Û min fêm kir ku tiştê jê re jiyan tê gotin di navbera xeyal û rastiyê de arefek e. Aliyekî rastiya real, di esasa xwe de li gorî hestan, li gorî daxwazan wate digire. Ev rewşeke eleqadar e bi nêrîna mirov li ser bûyer, diyarde û cihekî  ve ye. Eger tu wî tiştî şênber çawa fêm bikî, tê bigihîje, tê wisa jî wî tiştî bidî der, tarîf bikî. Ji bo hevalê Brûsk di jiyanê de awayê şênber û jiyanî yê metafora “hingivîn” bê guman hebû. Weke kesekî ku salên dûr û dirêj ên

jiyana xwe di vê erdnîgariyê de borandibû, di navbera wî bi xwe û wê erdnîgariyê de girêdaneke pir kûr çêbûyibû. Ev şibandin, dîmena Dêrsimê ya hestên di mêjiyê hevalê Brûsk de bû. Sînorekî diyar ê hezkirinê tine. Hezkirin hîsek e. Ya jê tê hezkirin şibandina ya herî xweşik berhema pêvajoya kedê ye.

Tiştê di heval de îfadeya xwe dibîne, ev taybetmendî, hema bêje heqîqateke giştî ye, di nava Tevgera Azadiyê de rastiya ku herî diyar û li ber çav e. Li cem me, hevalên li cihên cûda pratîk meşandine hê jî di bin bandoreke giran a wê demê de ne û ev pêvajo gencîneya herî bi qîmet a di dilê wan de ye. Pratîka her herêmê. Di heman demê de ji bo ku ew hevalê/a mijara axaftinê bi rastiya xwe bê naskirin dibe sedema bingehîn; pêvajoyeke wisa ya ked û hebûnê ye. Dema mîmarek berhema xwe diafirîne tevî wê berhemê ew bi xwe jî pêk tê. Nivîskarek xebata xwe ya nivîskî ji bo xwe bi xwe hilberîne jî pêk tîne û ew hilberîn wî/ê jî bi xwedî dike. Ked, li pêşberê xwe bi xwe mirov digihîne asteke hişyartir.

Amadekariya mijara axaftinê di vê demê de ne tenê bi me re sînordar bû. Bi giştî hemû heval di nava amadekariyekê de bûn. Ev kelecan û kelecanên ku rêwitiyên dişibin vê bûne sedem, hema bêje li hemû qadên me dihatin jiyîn û di jiyanê de xwe didan der. Bi awayekî pir xwezayî kelecanên dişibîn vê ji ber xwe bi pêş diketin. Ev kelecan dibû sedema kêfxwşiyê jî. Sohbetên hevaltiyê ku li ber sîberên darên çinarên qulipîbûn hawîrdorê, bi qasî xeyalkirina pêşerojên me, weke amûra serketinê lê kirina wê bû.

Dewreya me ya perwerdeyê her çendî bi tempoyeke sift dest pê nekir jî, her diçe siftir bû. Ya rast ne ku me ji berê de hîs nekir, ev ê wisa be. Ji ber ku daxwaza çûyîna pratîkê, çûyîna Bakûr li beramberê vê siftiyê xweragirtinek jî diafirand û dida pêş. Nexwe di kelakela germa nîvroyên sotîner ên Gareyê de di ezmûnên agir re derbas bûyin ne tiştekî ji rêzê bû. Hevalê Feîq rojekê piştî ku ji hevalê Brûsk destûr girt, agir berda qamişên dirêj ên derûdora me. Ji me dixwest ku em di navbera van qamişan de bi qasî manewra û xwe veşartinê, qebiliyeta tevgerê qezenc bikin. Bi agir girtina

qamişên ev demeke dirêj e li ber germahiya tavê zer bûne, her der weke dojehê lê hat. Agir û pêt weke ejderhayekî xwe li qefesa xwe dida bû, xwe li jor li azmanan dida, germahiyeke tund û sotinêr belavî derûdorê dikir. Bermahiyên weke komirê yên qamişên dişewitin ku bi ber bayê ketibûn, hema bêje weke ku serçavên me boyax kiribûn. Hemû cilên me bibûn tenî. Xwêdana ji eniya me diherikiya diket çavên me û çavên me dişewitandin. Hin caran jî bi bandora rondikên ji çavên me dihatin difna me diherikî. Bi me re ti destmal yan jî tiştekî din tine bû. Tenê tiştê me karîbana bikira bi serê şutikên xwe yên ku bi gerîla re yek bibûn em xwêdana xwe ya ku li sukra me û eniya me kom bûye paqij bikin. Dîsa, şutik li beranberê têhnê jî parazvaneke baş bû. Piştî ku me dît hevalên Feîr, Agir, Berxwedan û Artêş ku li cem me bûn vê rêbazê bi kar tînin, me di cih de ev rêbaz weke rêbazeke parastinê teqlîd kir.

Ti rêyên din tine bûn ku di nav wî agir û pêtê de mirov manewra bike. Berevajî, me dê ji neçarî xwe biavêtana derveyê wê qada sincirî. Jixwe hevalê Feîq ev esnekbûna dabû me. Ji bilî ferzkirinê, bawariya me pê hebû ku tevlîbûn û daxwaza fêrbûna bi awayekî xwezayî û ji ber xwe bi pêş dikeve dê hê zêdetir em bibirana serketinê.

Em ê bi zehmetiyan re rû bi rû bimana, ji ber vê yekê diviyabû îradeya bi binxistina zehmetiyan nîşan bidana, me ev bi cewhera xwe bida xwarin û ji xwe re bikira fêrbûn. Di vê navberê de hevalê Feîq, Berxwedan dawî li qebîliyeta xwe ya xweş manewra kirinê anîbûn û ji nav agir derketibûn jî. Piştre hevalê Firat û Egîd bi heman lezê xwe avêtin ji derve. Weke tedbîr li beramberê ku qada agir berfireh nebe, her hevalî bi hêjekî dirêj û têr pêlçîm ê ji berûyan kiriye derûdora agir dorpêç kiribû, nedihişt ku agir li daristanê belav be. Ji ber ku me berê tedbîr stendibûn tiştekî mirov bitirse tine bû. Agirê ji şewtîna qamişan derdiket ku dişibiya agirê ji devê ejderhayekî derdikeve, piştî bi girtineke gur û geş a bi heybet ji ber xwe kêm dibû. Yên zehmetî didan cihê qamişên biçûk û navîn û şewitîna devî û qetên daran ku xweserî

xwe bi xwe bû. Bi rastî zêde bi xetere bûn. Ji ber ku hema zûka agir digihandin şînatiyên ku cîranên wan bûn. Eger pêşî li vê rewşê nehatiba girtin ji bo ku hemû çinar û berûyên Gareyê neşewitin ti sedem tine bû. Me hêjên bi pelçîm ên di destê xwe de hewl dida di her lêdanê de zêdetirîn agir bitemirînin. Hin caran hêjên dara şîn ên di destê me de jî ji ber têhna zêde zûwa dibû û zindîbûyina xwe ji dest dida. Ev jî di demeke kurt de dihate wê maneya agir girtinê. Me bi hêjên li ber serê me amade di cih de ev pirsgirêk derbas dikir.

Di vê navbera de qadên qamiş û giyayên şewitîne paqij dibûn û awantajeke mezin dida me. Qada me ya sporê ya heyî têra me nedikir. Piştî vê pêkanînê qada me ya ku firehtir bûye û dê me karîbana hê rehetir tevger bikira, pir xweş dibû. Hê em zêde ne razîbûn. Lê em jê piştrast bûn dê bi dem re baştir bibûna. Piştî şewatê xaliya kom bibû, bi şîdeta bayê li her derê belav dibû. Hin caran dema bayê berê xwe ber bi me ve diguhert, me xwe di nava vê  ewra xaliyê de didît. Bermahiyên bi cilê me ve diman xwediyê taybetmendiyeke weke çespê jî bûn. Tevî vê qirêja ku ev bermahiya dibû sedem, di nav hemû vê siftbûna jiyanê de paqijiya cilan karekî ti hevalan di demeke kurt de negirta ber çavan bû. Siftbûna pratîkî, hin pêdivên şexsî ditexirand.

Dem derbas dibû. Li gel hevalên  nû tevlî bolîkê bûne bêyî ku em ji tempoya xwe kêm bikin me xebatên xwe didomand. Bi qasî tê bîra min ji Gareyê hevalê Firat û Egîd Bazarcix jî tevlî grûbê bûn. Paşê her du Savaş hatin. Yek ji van hevalan ji Efrînê û yek jî ji Bakur bû. Hevalê Bahoz rojekê di nota ku ji hevalê Brûsk re şandiye de gotibû ku grûba me dê bibe du yekîne û hevalê Çem jî tevlî me bibe. Hevalê Çem hevalekî ji Dêrsim-Mezgirdê bû. Hevalekî kevn û xwediyê tecrûbe bû. Berê li Serhedê mabû.

Roj li pey rojan derbas dibûn, bendewariyên li ser me zêde dibûn. Siftbûna bendewariyan, hê zêde em ber bi adaptasyona psîkolojîk ve dikişandin. Em danê her sibe ji beriya tav derkeve radibûn û di cih de li qada xwe ya berfireh û derûdora wê bi darên berûyan

hatiye dorpêçkirin, rewşa îştimayê digirt. Piştî ku tekmîla nobeda şevê hate girtin, me bi çavên xwe yên li xewê ew hênikiya xweş a berbangê dikişand cîgerên xwe û ew li bendê sekinîna xwe ya bê hêvî didomand. Bi piranî me ji dawî li bendewariya xwe dianî, ji bo spora ku em ê piştî kêliyekê dest pê bikin xwe amade dikir. Ji beriya ku tav derkeve şiyar bûn çandeke Zerdeştî ya kevneşop e. Derketina tavê temaşekirin xweş e. Lê ji bo kesên weke me ku hesretê xewê ne berbanga sibeyê êdî ji maneya xwe kêm kiriye. Kî çi dibêje bila bêje saetên navbera sê û pêncan de ku şev ber bi berbangê ve diqulipe, kêliyên xewê yên herî xweşik, herî germ û ji bo îstirehetê destdayî ne. Seremoniyên zû rabûnê ku ji zarokatiya xwe ve me hev nas dikirin li vê derê jî quraleke jiyanî ya dest jê nabe bû. Ne ku min jê hez nedikir. Lê belê dema rêwîtiyên dûr û dirêj ên dibûn sedema westînê jî li ser zêde dibûn xeweke ne qutqutî nîmeteke bê hempa bû. Hevalê/a ku nobeda wî/ê ya şevê tine bûya kesê bi şens ê/a wê rojê bû.

Dema me firsend peyda dikir ne ku me hemû ev rewşên xwe ji hevalê Feîq re nedigot. Bi destpêkirina saeta rabûnê ku em jê re ‘Rojbaş’ dibêjin, eger gotin di cihê xwe de be bi temamî meşa ber bi qada me ya sporê ku hinekê li jorê darçinarên ku nuxteya me dorpêç dike, êşkenceyek bû. Bi piranî li ser hevalan hinekê giraniya xewê dibû. Em ji kîsxewên xwe yên germ derdiketin, di wê hewaya hênik ku mirov kêmekê diqerisand û li ber xwendina teyr û tuyên weke darkutik, kund û qijika karsek, li ser şaxên daran ku bi dengê xwe destpêkirina rojê îlan dikirin bi awayê yek rêzê, hêdî hêdî di wê şivereya me ya ku weke marekî xwaromaro dibû û ber bi jor ve diçû de dimeşiyan. Diviyabû hevalê Feîq timî li pêş bûya. Ji ber ku hevalê ku tekmîla şevê digirt ew bû. Ji ber vê yekê ev dihate maneya ku ji hevalên din hê zindî û li ser xwe be. Hevalê Feîq jî bi vê zanebûnê bi lez  xwe komî ser hev dikir û yek ji wan gotinên xwe yên balkêş ku qet ji bîra min naçin digot; “eger Agir hatibe temam e”. Ev dihate maneya ku di wê dema aram ku tarîbûna tenik a berbangê diçirand de bişîrîneke germ li ser çavên hevalan dest bi gerînê bike. Ev ji me re weke dermanekî

ku ruhê me nû dikir û em bi ser xwe ve dianîn dihat. Yek ji hîcwên xweşik ên hevalê Feîq bi kar dianî bû.

Agir, hevalekî xewa wî giran bû. Bi şevê hevalê Agir ji bo nobedê rakirin, tiştekî ku her heval herî zêde jê diket fikaran bû. Dîsa, hevalê Şiyar ji wisa bû. Tevî ewqas salên di ser re derbas bûne, hevalê Şiyar ji wan kêm hevalan e ku min karibûye bîranên wan di bîra xwe de zindî ragirim. Piştî ku di bihara sala 2009'an de bû stêrkeke li azmanan tê bîra min, min ji xwe re wisa gotibû, ez gelek tiştan deyndarî hevalê Şiyar im. Min qet germahiya wî, hezkirina wî, hesta wî ya ta ji dîlê wî tê ya alîkarî dayinê, xweşbînî û safîtiya wî, dilpakiya wî ji bîr nekir û min di kûrahiyên bîra xwe de bi cih kir. Li ku derê hevalekî/e xwediyê taybetmendiya wî bibînim, destpêkê ew tê bîra min. Sedema vê, bandora giran a hevalê Şiyar ku li ser min e. Ji vê pişrast im. Min di tevahiya jiyana xwe de mirovekî/e weke wî nazik, xweş karekter, xwîngerm nedît. Xwe bi ti kesî re ecz nedikir, kesekî ku bi taybet ji şikandina derûdorê, xwe dida aliyekî bû. Tenê yek kêmasiyeke wî hebû, ew jî xewgiraniya wî bû. Hevalê Agir û Şiyar her du jî di taxima hevalê Feîq de bûn. Di taxima hevalê Feîq de bûna du hevalên wisa ne rewşeke hêsan bû. Ji ber vê yekê hevalê Feîq her sibê teqez pirsa her du hevalan dikir. Dida qontrolkirin û wisa dikete li ser şivereyê. Hin caran ne ku nêzîkbûnên hevalê Agir ku heval nedayine şaşkirin dernediketin jî. Gelek caran piştî ku ji hevalê ji bo wî şiyar bike dihat, xwe xelas kir dîsa dida nava xewa xwe ya giran. Ev jî li cihê îştimayê têkmîla kêm û binpêkirina disîplînê bû. Ya din jî di nav hêzeke wisa ku biçûya Bakûr de kêmasiyên jiyanî yên bi vî awayî bi xweşbînî nedihatin pêşwazîkirin. Bi qasî ku dibû mijara rexneyê, weke mijareke ekstra ya rexneyê jî li hevalê Feîq dizivirî. Û dibû pirsgirêkekê.

Hevalê Şiyar û ez di sala 2002'yan de di bolika hevalê Hemze de bi hev re bûn. Gelek caran em bi hev re çûn erk û wezîfeyan. Hevalê Şiyar, weke zarokekî malbateke Ereb hatibû dinyayê. Bi eslê xwe ji gundekî nêzîkî Efrînê bû. Zêdebûna Kurdan weke ku

di malbata wî de bûye wî bi xwe jî li gorî demografyaya Kurd adepte bûyîbû. Şiyar, Erebekî bûyîbû Kurd bû. Bandorên xwezaya xwe ya bêdeng û dilnizm di hemû kêliyên jiyana xwe de didan der. Piştî ku di wê bihara tarî ya Nîsanê de di kemîna xaîn de şehîd bû, ew bêmoraliya weke xewnereşkekê bi ser me de girtibû û cenazeyê wî ye ku li ser milê hevalan, ne rewşeke ku mirov karibe hi hêsanî rake bû. Qet em fêrî tinebûna hevalê Şiyar nebûn.

Piştî ku em li cihê îştimayê weke du rêzên dirêj rêz dibûn, tekmîla şevê ya hemû yekîneyê dihate girtin. Tekmîl awayekî agahdarkirinê ye ku her berpirsiyrê taximê ji destpêka taxima xwe du gav derdiketin pêş û rewşa dawî ya taximê radigihand. Hê zêde li gorî erênîbûna tekmîlên ku çawîşên şevê didan amadekariya sporê dihate kirin. Me di cih de tiştê bi xwe li keleka cihê îştimayê li cihekî datanî, ji bo ku toz û qirêj bi ser de negire me baldariyeke mezin nîşan dida. Hin caran jî berpirsiyarê taxima duyemîn jî ev erk pêk dianî. Ev ne tiştekî statîk bû. Nêzîkbûnek ku li gorî pêdiviyê dihate guherîn bû.

Hevalên jin di sîstema me ya meşê ku me bi gavên hêdî dest pê dikirî de timî li pêş cihê digirtin. Lê hin caran dema tempo zêde dibû me li hevalan derbas dikir û kêfê bezîna li pêş jiyan dikir. Me qederekê navbera xwe vedikir. Hin caran me hin aktîvîteyên biçûk jî li ser sporê zêde dikir. Bi rêya leyistoka destmalê li ser hevalan testa hişyariyê jî dihate kirin. Yan jî leyistoke ku li welêt pir dihate leyistin a jê re ‘brê’ dibêjin, ez dikarim bêjim lêyistoka me ya jêneveger bû. Qezenceke wisa ya vê leyistokê jî hebû; bi qasî ku di nav hevalan de beza bi lez û qebiliyeta manewrayê weke wêneyekê di hefizayê de bi cih dibû, qebîliyetên weke ruhê hewldêr, sekneke bi azwêrî, çalak û wêrek, dîsa tevgera xwe bi awayekî deqîq hesibandin û hwd... weke parçeyeke ji leyistokê di pêşxistina qebiliyetên bi vî awayî de rol dileyistin. Helwesta mirov psîkolojiya mirov dide derve, ev jî di demên pêş de rasterast li ser tevlîbûna heval bandor dike. Hin caran di jiyana me de bi temamî berevajiya vê jî dibû. Hevalên pir cangiran (van

hevalan bi piranî zêde guh nedidan spor, perwerde û hwd.) jî di meş û karên pratîkî yên pişt re de bi ser xwe ve dihatin hê zindîtir dibûn, bi daxwaz û kêfekî mezin tevlî xebatê dibûn. Hê zêde mirov dikare jê re bêje potansiyela hindurê xwe di demên zehmet de derdixstin holê. Ev nêzîkbûnên hevalên bi vî awayî pêşdarêzên ji bo wan ên hevalên din jî kêm be jî sivik dikir û heqê helwestên xwe distendin.

Li Gareyê germahiya Tîrmehê bi rola xwe rabûyîbû û hemû têhna xwe dewrê meha piştî xwe kiribû. Bi nêzîkbûna meha Tebaxê re ji ber ku dema me ya ber bi cihê xwe yê nû ve çûyinê nêzîk dibû, di nava yekîneya me de vê hestê mêjiyê her kesî dorpêç kiribû. Ev kêfxweşiya nayê îfadekirin û ji her dera me diforî, bi navbeynkariya helwestên me bandora xwe li ser jiyana me ya madî jî dikir. Kêfxweşiya gihaştinê cihê xwe ji kêliyekê ji beriya kêliyekê li wê derê bûnê re dihişt. Perwerdeya me bi hemû leza xwe berdewam dikir. Ez dikarim bêjim di vê navbarê de hêdî hêdî amadekariyên me jî bi dawî dibûn.

Di meşa erka me ya lojîstîkê de min û hevalê Şehîd Berxwedan Rojhilat, li ser mijara ku dê vesaziyên dawî çawa pêk bên de kêm neaxifîn. Eger şaş nayê bîra min Şehîd Berxwedan, hin mijarên bi awayekî fermî dihatin nîqaşkirin dizanî. Digot ku dê di navbera hevalan de vesaziyeke biçûk bê kirin. Ev rewş bi bûyera şehadeta hevalê Mahîr û heft hevalên din ku di havîna 2003'yan de di encama kemînekê de li Deşta Bêşilî bûne stêrk ve girêdida. Li gorî wî; ji ber ku hejmara grubê zêde bûye encameke wisa bi pêş ketiye û ev mijar di asta jor de tê nîqaşkirin, ji bo ku careke din bûyereke bi vî awayî neyê jiyîn hevalan gotibû, ji bo tedbîrê dê hejmarên grubên biçin Bakur di ber çavan re were derbaskirin û hejmara yekîneyan nîvenîv bê kêmkirin. Vê biryarê bi awayekî rasterast li ser me bandor dikir. Vê dihişt ku em bikevin nav pêvajoyeke hizirina zêde zêde. Ti kesî nedizanî ku di vesaziyeke wisa de kî, di çi astê de xwediyê şens e. Ji ber ku agahdarkirineke bi hûrgûli nehatiye kirin tenê bi texmînan xwe gihandina heqîqetekê ne gengaz bû. Ez dikarim bêjim weke pêkhateya

hevalan em hemû di astê de û xwediyê şert û mercên wekhev bûn. Zêdetir ji nêviya me ji hevalên ku hê di jiyana xwe ya têkoşînê de Bakur neditîne pêk dihat. Yekbûyiya me xwediyê taybetmendiyeke wisa bû. Lê daxwaza li Bakur pratîzebûnê li gorî salên borî kêm nedibû û piştî komploya navneteweyî her ku diçû zêde dibû.

Bi qasî ku tê bîra min yek ji wan hevalên ku xwe xwediyê şens dinirxîne bû. Dema ku bi wî kenê xwe yê zirav û axafîna xwa ya nazik şîroveya xwe dikir, weke ku fêkiyên tevlîbûna xwe xurt û bi xwestek kom dike bû. Di binê vê axaftina xwe ya ji piştrast û nêrînên xwe yên misoger de hevaltiya xwe ya bê kêmasî û awantajên dilnizmiya xwe didît. Texmîna wî rast derketibû û ji yekîneyê nehatibû derxistin berdêla keda xwe stendibû.

Ne tenê dîtana Dêrsimê, demeke dirêj bêyî ku hewaya wê ya taybetê wê bijîm di nava psîkolojiyeke dilşikestî mam. Dêrsim weke xeyalekê li pêşberê min bû. Ez di nava wê de bûm. Li ser tehteke wê bûm. Min ji keleka newalekê av vedixwar. Pişta xwe dida berûyan û ji tebaqaya xwe ya titûnê, ji titûna Mûşê cixareyeke stûr dipêçand, weke ku nefeseke jiyanê be min qortek lê dida. Lê belê ev pêkhatina timî bi dilekî şikestî bû. Ez dikarim bêjim jiyanê timî tinebûna hin hevalan dihewand û em fêrî vê psîkolojiyê dikir. Dişibiya bayekî hênik ku timî dihat. Kêliyên pir kurt ewqas heja bûn, hema bêje weke bêjin “qîmetê min bizane nexwe ev kêlî dê weke tiştekî hatiye jiyîn careke din pêk neyê”. Kêliyên wisa binirx bûn. Ji ber ku hevalên ku subjeyên şênber ên kêliyan bûn, kêlî dixemilandin û bedewtir dikirin.

Dibe ku her kêliyê ji nava wê zilm û dagiriya ting û tarî bagerek biterike û dawî li wê kêliyê bianiya, şidleke nû gihaştî ji hinava germahî û ronahiyê qut bikira, weke careke din venegere bifirîne û bibe û li şûna hebûna wê ya fîzîkî, rewşa tije bi xeyalan a kêliyê bihêle, razberî, li pey wê weke ku gencîneya herî mezin be bîranên wê bimana. Hemû van koma serpêhatiyan, ji dema ku ji beşeke kêliya giranbiha bû jêdera xwe distend. Tevahiya

bîranînan, hesta ku subjeyên bûne stêrk îfade dikir. Qîmeta wê, yekanebûna wê ye; bi qasî vê ya ku bi êş e careke din neqewimîna wê ye. Weke stêrkên ji bo carekê xwe nîşan didin û wenda dibin, Berxwedan jî li pey xwe bîranînên tije bi hebanê firiya. Li diyarê Pulûrê şevekê bask da. Li ser welatê wî yê ku ji ber êşên Dêrsimê û ji ber birînên wê xwîn jê dihat, bû baran. Dilop bi dilop barî li ser axa têhnî bûye; dema jiyana madî bedena wî diterikand ji ber ku dê birînên welat sax bikira, jê re bibûya derman ew pê kêfxweş bû. Li pêşberê dinyaya min, hestên min bi xwe yên weke tîrê saetekê ku di navbera xeyal û rastiyê de diçe û tê ti zehmetiya min dikişand tine bû. Berxwedan yan jî Botan dema jiyan dikirin jî bi çavên xwe yên weke deryayeke şîn bi aliyekî nirxeke manewî hildibirandin. Ewliyayek dibêje “dema mirov dijî xwe diafirîne”. Dema ew dijîn û li ser singa welêt ji cihekî radibûn û li cihekî datanîn, jixwe mîmamarên xwe bi xwe bûn.

Me rojekê ew mijara ku dê hejmara grûbê bê kêmkirin û hin heval jê bên derxistin li gel hevalê Feîq jî vekir. Ti agahiyên wî jî li ser mijarê tine bûn, yan jî gelo nexwest behsê bike, aşkere bêjim zêde nikarim tiştekî bêjim. Lê bi qasî dihate fêmkirin biryarek ku weke rêveberî girtîbûn; zêdetir ji aşkere nîqaşkirinê ji bo ku heval jê bandor nebin dê paşê zelal bikirana.

Hevalê Feîq bi xwe jî piştî evqas ked û hewldana zêde, ne li hêviyê bû ku dewreya perwerdeyê bi vî şiklî bi encam bibe. Di vê pêvajoyê de me hemûyan bi hev re tevger kir, hemû xweşikî, kêfxweşiyên jiyanê parve kir. Weke ku bêje tiştekî ez bikim tine, hizirên xwe yên di vê derbarê de ragihand me. Ji bo ku hûrguliyên tiştên min û hevalê Berxwedan bi hev re axifîne bên bîra min, min zora xwe da ser bîra xwe. Belê, rast bû ku plansaziyeke wisa hebû. Mantiqa ku Berxwedan dimeşand rast bû. Di aliyê hejmar de astengî hebû. Bi îhtimaleke mezin di encama sohbetên li gel hevalê Faîq kiriye de bibû xwêdiyê van agahiyan.

Hevalê Brûsk û Çem li pey hev diçûn seredana biryargehê, di vegerê de di demeke kurt de îfadeya bi gazind û xedr û kêfxweşî

tevlîhev li ser çavên wan, vediguherî fikirîneke pir kûr û dûr. Ev psîkolojiya hevalan bi awayekî xwezayî li ser hevalên li derûdora wan jî bandor dikir. Gelo dê çi biqewime? Ev rewş zêde ne ya xêrê ye! Jiyana me ji aliyê pirsên weke, dê kîjan heval ji grubê bên derxistin, kîjan heval meşa xwe berdewam bikin dihate dagirtin. Bi awayekî pir xwezayî rewşeke sarbûnê jî dihate jiyîn. Ji ber ku rewşa perwerde û ponijîna hebû li ser bingeha ku dê bi misogerî ev rêwîtî pêk bê bû. Vê misogerbûnê li ser hevalan bandora sekn û tevlîbûneke çalak dikir. Lê belê ez nikarim bêjim revîzyoneke wisa ji beriya meşa dirêj hatiye jiyîn nebû sedêm ku hemû heval hin caran ‘xebatên kulîsê’ nemeşînin. Ji wê sekna me ya berê ya bi disîplîn piç nemabû. Weke kurm ketibû mêjiyê me, hêdî hêdî dê hemû mêjiyê me bikojanda, dibû sedema gotin û hestên nayên fêmkirin ên bi hev re nakok. Ji rewşa me ya destpêkê ya bi moral û xwestek, li şûnê kûr kûr fikirîneke mij û moran ku guman û fikaran dorpêç bû mayibû. Meşa me ya rêya dirêj ji bo me astengek ku hewce ye em derbas bikin bû. Hemû pêvajoya adaptasyon û amadekariyê ji bo derxistina ji rêya me vê tehta mezin bû. Qada me, bakûrê Bakûr bû. Em ê bi îradeyeke pir mezin, kedeke pir zêde û bi fedakariyeke mezin biçûna bajarê xeyalên me. Ji bo hemû hevalan ev xeyal peresgeha sebir û xweragirtinê bû. Baş e, tiştên di van rojan de diqewimîn dihatin çi maneyê? Gare û derûdora ku weke bi diyardeyeke mistîk ve heman tişt be em pê hizirîne, di pêvajoya havînê de demên herî germ û bi alozî lê derbas kiriye, hesret hûr nav xwarina xwe kiriye û pê xwariye, bi hemû heybeta xwe li ber çavên me reş dibû. Bêxemiyê di hinava xwe de ecziyên biçûk jî diafirand. Ti kesî nedixwest bibe maxdûrê/a vê revizyonê. ‘Bûn kesê/a wê rojê wenda kiriye’ dihate maneya careke din xwe komî ser hev nekirinê û timî bi dilşikestîbûnekê jiyînê. Her çendî di encamê de ha salekê zû ha salekê dereng gihiştina Dêrsimê ne girîng be, dîsa jî li pey hevalên tu bi hev re bi rêketiye mayin, dema ku ew dikevin tevgerê dîmena wan a bi cilên leşkerî ku hêdî ber bi asoyan ve bi gavên hêdî û li pey hev biçûk dibe û herî dawî jî dema dîmenên wan ên dawî weke xeyalekê ji ber çav nediyar

dibe, mirov bi tenêtiya xwe re rû bi rû dibe, noqî navê dibe, morala mirov ji binî de têk diçe, hesta di encamê de derdikeve holê bi hêsanî nayê daqurtandin. Ya din jî dê hevalên te ev rewş çawa fêm bikirana! Teqez dê di dilê xwe de ji bo te hestên biçûk dîtinê yên hûr û mûr bihewandana. Ma çima ne wisa be? Eger wisa bihizirin... “ewqas meh tu li gel hevalê Brûsk bûyî. Tê fêmkirin ku di jiyana tê de yan jî di tevlîbûna te de astengî hebûn ku ji ber wê tu li pey xwe hiştin. Hejmara zêde mahaneyek e, ya esl neahengiya te yan jî neahengiya we ye, tê fêmkirin ku we zêde bawerî nedaye!”.

Hemû ev axaftin îfadeyeke şirîk a Tebaxa Gareyê bû. Cîhana hestan bû. Ti kesî nedixwest ji vê armanca pîroz bimîne. Heya bi wê demê ti kesî ji me di nava herîkina xwezayî ya jiyanê de ti hesabên li ser xwe bi xwe neda bû pêş. Me di nava bi hezaran kesî de xwe weke yê/a herî xwediyê şens dihesiband û xwe weke hatibûn xelatkirin dihesiband. Ne ku me xwe nedieciband. Ji ber ku me şenseke wisa bi dest xistibû û ew pêkhatina xwe ya takekesî weke nîmetekê dinirxand. Me bi nêrîna heqîqetê li Bakur nedinêrî, hewl dida hê zêdetir bi hin gotinên şelo, nepixandî û xeyalên li gel xwe em şênber bikin. Lê belê ya rast li gorî hê jî razberiyeke kûr bû. Ev razberî, belê ev razberî ji bo me raza herî ting û tarî bû. Banî me dikir. Amade bû me bi hezar cur nîmetên xwe pêşwazî bike. Amade bû me bihewîne, biparêze û hemêz bike. Weke ku dê nû tiştekî wisa biqewimiya, ev çûyin destpêkek bû. Lê çûyin û hatin demeke pir dirêj pêk dihat. Ya nû bû tenê rewşa me bû.

Hevalê Feîq û hevalê Cûdî jî tevî ku ji me kevintir bûn, ji bo wan jî rêwîtiya Dêrsimê bûyerek ku cara yekemîn diqewime bû. Jixwe qadên berê lê mayine di nava sînorên Başûr de bûn. Zêde Bakur nayê hesibandin. Heta hevalê Feîq jî nedikarî kelecana xwe veşerê. Dem bi dem bi wê meşa xwe ya ku diheje, dimeşe û kêmekê serê xwe dihejîne, ji ber vê yekê bi yên wî dibînin re hesteke weke ku di nava bagerekê de dimeşe diafirand, xwe nêzîkî mangaya me dikir û bi ewireke revok li lê dinêrî. Ka gelo li

derûdorê ‘reşoyê’ me yê kedkar ê ku ji ber li ser agir mayinê reş bûye û guheriye, weke çarenûsa xwe ya her timî dîsa li ser agir e yan na, yan jî gelo amadekariyeke wisa heye, dinêrî. Vê yekê, asta gihaştî ya sohbeta ku piştî kêliyeke kurt dianî bîra mirov. Jixwe eger aktîvîteyeke wisa tine bûya jî hevalekî baldar ê ku hevalê Feîq didît yê mangaya me, bi tevgereke cansivik bi lez û bez dest pê dikir ji derûdora mangeyê hejikên berûyê yên zuwa kom bike. Manewiyata ku vê reftariyê diafirand hevalê Feîq pir kêfxweş dikir. Ev, nîşankereke qîmeta wî ya li gel me bû. Bi darên hatine komkirin, li cihê agirê ku me berê li wê derê bi kar aniye yê bi keviran weke sêgoşeyekê hatiye çêkirin, agirekî nû dihate pêxistin. Ji bo ku agirê me hê rehetir pê bikeve, xaliye ji agirên berê de mayî dihate komkirin aliyekî. Darên hatine komkirin bi awayekî rêkûpêk dihatin rêzkirin, agir dihate kirin û ji bo dukel dernekeve jî baldariyeke herî mezin dihate nîşandan. Bi qasî ku gengaz be bê dûkel pêxistina agir ji du aliyan ve sûd dida. Ya yekemîn pirsgirêka dîmena derkeve holê bû, ya duyemîn jî dûkelê tehma xwe nedida ‘reşo’. Eger ku tehma dûkelê bida nav ‘reşo’ tehma wê çayê ne xweş dibû, ew çay nedihate vexwarin. Vê jî li ser sohbeta ku piştî kêliyeke kurt dest pê bike bandor dikir. Dema ku ‘reşo’ li ser wî agir û pêta sincirî erka xwe bi cih dianî, destpêkê ji lûleya wî hêdî hêdî û paşê jî bi lez hilm derdiket.

Her ku ‘reşo’ germ dibû, hinava wî li ber têhna reaksiyona ku pêk dihat xwe ranedigirt û bertek nîşan dida.

Eger gotin di cihê xwe de be pêjna wan rojên me yên destpêkê ku dişibiya kelecana pirpirikek ku bi ber bayê bihare ketiye nedihat. Ji me her yek heval ji bo bibe hê zêdetir xwediyê agahî herî zêde yan ji Cûdî yan jî ji hevalê Feîq dipirsî û dixwest fêr bibe. Demê bi lez wê herikîna xwe ya asayî didomand. Vê neçar dikir ku em derbarê rewşa xwe ya giştî de xwe safî bikin. Dê bi awayekî xwezayî zelalbûnê derfet bida ku tevlîbûna me bikeve li ser rêyeke rast.

Piştî ku me çaya dema xwe girtiye ji ser agir danî, me kedehên xwe yên ku bi nazenî û baldarî hatine şûstin û di berikên rexên çenteyên me de hatine bicihkirin derxist. Bi nêzîkbûneke aram û hêdî me çaya xwe dagirt. Pêşkeşî hevalên me yên mêvan kir. Hevalê Feîq bi stresa ku bi rojan kom bûye û bi westabûna sivik ku li ser dewreya me pêş xistiye qedeha xwe kişand pêşiya xwe.

Û got, "Îhtimal heye ku di demeke nêzîk de vesazî bên diyarkirin". Li gel me tiştekî cûdatir parve nekir. Dihate fêmkirin ku bi baldarî ji hûrguliyan xwe dida rexekî.

Hevalê Birîndar got, "heval me fêm nekir ma ev vesazî ewqas girîng e, ya din jî çi hewce ye. Jixwe hem hevalê Brûsk û hem jî hevalê Çem xwediyê wê qebiliyetê ne ku vî karî bimeşînin. Çi pêwîstî pê heye ku di yekîneya me de vesaziyeke wisa bê çêkirin".

Hevalê Zinar got, "ez jî tevlî dibim" û  bi awayê li cihê rûnîştî hinekê xwe wê de û virde kir, weke ku nerehetiya xwe bide hîskirin:

"Me pêvajoyeke pir sift borand, li gorî qeneatê min li Bakur ti pirsgirêkên hevalên li vê derê kom bûne dernakevin.  Hevalê Zinar bi sekneke tije bi gazinc anî ziman ku ew çawa li vê  rewşa ku van demên dawiyê peyda bûye û di nav hevalan de zêde zêde bûye sedema bêmoralbûnê dinêre.

Hevalê Feîq hewl da bi van gotinan barê ser milê xwe sivik bike; "heval, bi rastî jî heval li  me neheqiyê dikin. Bila baweriya we hebe ti eleqaya vê li gel me tine. Hûn dizanin di civîna dawî de biryarên hatine stendin hebûn. Ti tiştê em bikin tine".

Nêzîkbûnên hevalê Feîq ku ji ber psîkoliyên zêde zêde hesesbûyî yên hevalan dilê wî mayibû rast bû. Jixwe wî bi xwe jî anî ziman, "eger ji min bûya min ti kes li pey xwe nedihişt". Ev axaftinên wî bi hestek ku ji kûrahiya dilê wî tê hatibûn alandin. Lê belê

çareseriyek tine bû. Ya ku bi êş bû, bi hev re nejiyîna hest û kêfxweşiyek ku bi hev re hatibû mezinkirin bû. Yanî em ê ji hev biqetîna û dibe ku careke din me dê nikaribûna hev bibînin.

Her heval di wê kelakela germahaya Gareyê de hinekê bi fikar û hinekê jî bi hêvî dijiya. Hêvî dermanê demên zehmet bû. Min xwe bi xwe re got, dibe ku ne ez bim. Ya din jî jixwe ti pirsgirêkên min derneketibûn, bi awayekî herî çalak tevlî bibûm û min ê xelata vê tevlîbûna xwe bistenda. Min gotinên wirde û virde dikir, parçe dikir li hev dianî, ji bo ku ji fikarên xwe hêvî derxim min xwe bi xwe piştrast dikir.

Libendêbûneke ku bêhêviyê hêmû demên me dîl digirt û xwe dida hîskirin. Tav qulipîbû aliyê din ê çiyê, sîbera wan darên qerase yên berû û çinaran bi qasî çar qatê wan dirêj bibû. Weke ku pelên daran li ber bayê hênik û hêdî hêdî dihat êşa me parve dikirin.

Balinde, hin caran bi lez datanîn û manewra dikirin ku me nedikariya li pêşberê vê manewraya wan a berwext bertekekê nîşanî wan bidin. Weke ku eger nêzîkê mê bibûna dê ji canê xwe bibûna, yan jî weke dixwazin bêjin ‘raza firînê namîne’. Hin caran awirên me li firîna wan asê dima, firîna wan a ji şaxê darekê heya bi şaxê din ê wê darê, bask dayina wan em kaşê nav xweşikbûna xwe dikirin. Hemû ev terzeke xwe îfadekirinê bû. Me dîmena azadane ya jiyaneke pratîze dibû didît. Ji bo ku hema di cih de em nebûna yek ji wan çi asteng hebû. Xweziya em di van demên xwe yên zehmet de bibûna yek ji van balindeyek ku li pêşberê me disekinin yên ji zindiyên herî xweşik ên xwezayê ne ku xwediyê taybetmendiyên curbicur... Dibe ku em bi firînê biçûna Bakûr. Bê bask bûn tiştekî çi ne xweş bû. Mirov nedikariya ji bêçareserbûnê xwe bide aliyekî. Bêçareserî vê gavê rêyeke bi neder bû, weke labîrentan tevlîhev û nedihatin zanîn.

Me di meha Tebaxê de rojên ji bo me pîroz bûn û rojên din ên bi coş û moreleke mezin pîroz kir û bi bîr anî; pişrte ji pêkanîna amadekariyên xwe yên dawî, ji bo hin pêdiviyên xwe pêyda bikin,

belavî saziyên li derûdorê bûn. Bi qasî tê bîra min herî dawî êlekên me mayibûn. Dema bi hevalên hêzên me yên din re bihata pêşberî hevkirin tiştên me û malzemeyên me di asta herî dawî de ‘luks’ bû. Ev girêdayîbû bi qîmeta ku di şexsê me de dihate dayin qada Bakur. Gava ku bêderfetî û zehmetiyên li wan deran hatibû hesibandin biryareke qederekê di cih de hatibû dayin û amadekarî hatibûn kirin.

Tam jî di vê qonaxê de tirsa vesaziyê ku ev demeke dirêj e weke xewnereşkekê girtibû ser me xwe nîşan da. Hevalê Brûsk û Çem ku di henikahiya sibeyê de taşteyên xwe xwarin, ji bo ku rotuşên dawî jî bidin vesaziyan li gel hevalê Bahoz civiyan. Me hemûyan ew roj heya bi êvarê weke ku dilê me di destê me de be, bi xeyalkirina ew kêliya ku em naxwazin pê re rû bi rû bin, bi destpêkirina hizirîna rewşek ku îhtimal heye pêş bikeve de em ê bertekeke bi çi awayê nîşan bidin borand. Bala me ya belavela û li ser hemdê xwe nebûna me hin caran dibû sedem lê bike ku rewşeke asayî jî mirov nikaribe ji nav derkeve. Dest û lingên me bi hev diketin, balindeya li rexê me daniye, hewl dida ji vê rewşa me ya cemidî sûd wergire. Her kes noqî nav bêdengiyê bibû te digo qey li qiraxa deryayekê li deryayê temaşe dike. Gelo dê çi biqewimiya? Di nava fikaran de weke qeyiqa ber pêlan ketiyê hin caran bi jor diket û hin caran jî noqî avê dibûn. Hin caran ev bêdengî ji aliyê tiqetiqên darkutikên ku weke metqabekê, li ser dara reş û dara çinarê ji xwe re hêlîn çêdike ve dihate hilweşandin, ji nişka ve çend serî dizivirîn aliyê ku deng tê jî.

Hin caran jî çend kes dizivirîn aliyê deng tê. Lê belê di demeke kurt de ew bişirîna me ya nexuya li pêşberê xemên me têk diçû û zûka cih diguhert. Serçavên me diket kirasê sar ê hizirê, me bi şiklê stuyê xwe xwarkirî, bi hejik û zilikên destê xwe karê xwe yê vekolandina erda li ber xwe didomand. Rêwîtiyeke keştiya xeyalan bû. Weke ku yê/a li pey bima bi ber pêlên tufanê biketa û wenda bibe. Niha piştî ewqas rojên zor û zehmet û bi westan bûn qurbanê bêşensiyekê dê çawa bihata îfade kirin.

Min bi hizireke wisa ber dilê xwe xweş dikir; zêde dem di ser re neçû ku hevalê Çem hatiye yekîneya me. Jixwe min jî zêde nas nake. Lê hevalê Brûsk, ew cûda ye, demeke dirêj e, hevalê Hemze min baş nas dike û bi misogerî agahiyên li ser min dayine wî. Teqez hatirekî hevalê Hemze heye.

Min heya bi wê rojê li gel her du hevalan jî li ser mijarên bi vî awayî qet nîqaş nekir. Neketim nav polemîkên bê encam. Pir kêm tevger û reftariyên min çêbûn ku min bi armanca weke 'bila di jiyanê de giraniyeke min hebe' bi pêş xistibin. Kesekî xwezayî û di halê xwe de bûm. Zindîbûna min dem bi dem ji kelecana min kêm dikir. Ev jî dibû sedem ku necisiyên biçûk bikim. Ji bo bikevim çavên wan min ti reftariyên ji xwe, ji hêza xwe zêdetir û berevajî karektera xwe nîşan neda. Min hîs dikir ku ev hemû tişt ji bo min biyanî ne û xwe jê dûr digirt. Bi hizira ku çi dibe bila bibe pirsgirêkeke bi min re eleqedar dernakeve, min ji ber xwe serê xwe rakir.

Hevalê Feîq li rastika ji aliyê mangeyên me ve hatibû dorpêçkirin bi meşeke mirov karibe bêje asayî ye diçû û dihat. Tiştê piştî bi kêliyekê biqewimiya dikarîbû texmîn bike. Ji ber ku kêm-zêde ji van vesaziyan agahiya wî hebû. Cûdî di vê pêvajoyê de timî psîkolojiyeke bêxem nîşan da. Qe înisiyatîfa xwe bi kar neanî. Bi awantaja nû tevlîbûnê, te digo qey xwe kişandiye qilifê xwe. Jixwe piştre di kemîna ku li Heftanînê hevalê Firat şehîd bibû de ji hevalan qut bû û revî. Yanî çûyîna wî jî weke hatina wî bû. Ti kesî zêde tiştek fêm nekir.

Di beşa demê ya nîvro cihê xwe ji ser êvarê re dihêle de hevalê Çem li pêşî, hevalê Brûsk li pey, ji şivereya jorî me bi lez xwe berdan nuxteya me. Ji ber bandora meşa wan a xweş li pey xwe hinekê toz û dumanek radikirin, destekî wan li ser qayişa ji milê wan dihate xwarê, destê xwe yê din jî dihejandin û hewl didan bi vî rengî tewazina laşê xwe pêk bînin. Demekê weke ku bisekine bû û rûyê xwe ji me veşart. Ew tiştê qirika wî dişewitand avêt der. Sekinî, çend saniyeyan wisa qet neqeliqî. Piştî ku hinekê bêhna

xwe veda paşê dîsa xwe rast kir û rabû ser piyan. Hevalê Çem, ji rewşa hevalê Brûsk sûd wergirtibû û pêşî jê stendibû jî. Bi kêfxweşiya li dû mayinê, hevalê Brûsk hêdî hêdî hema bêje weke ku xwe ji tiştekî biparêze dimeşiya

Hin kêlî hene di mêjiyê mirov de dicemidin û wisa jî dimînin. Dema ku tu tînî bîra xwe jî weke şerîda filmekî li ber çavên te zindî dibin û çavên te dibin şahidê hin kesên nikarin biaxifin ku carekê wenda dibin û carekê xuya dibin. Ew ji te parçeyek in û yên te ne. Tu kengî banî wan bikî di cih de dibezin tên û li ser çavê te disekinin. Ev kêlî tiştekî wisa tîne bi bîra min. Hê wenda nebûne û wisa xuya ye ku dê wenda nebin jî. Ya din jî ma çima wenda bin? Ew mucewherên giranbiha ku ji jiyana madî mayî ne. Hevalên mirov ên hin deman in. Dibin sedem ku tu bi awayekî jêneveger bi cihê aîtê wê derê yî ve werî girêdayin. Dişibe tiştên em hin deman dibihîzin; “bi bîranînan jiyankirin”. Bi rastî jî mirov bi bîranînan  jiyan dike! Ma mirov ji razberiyekê di vê astê de bandor dibe? Yan jî jiyana şênber li pêşberê xayala mirov çiqas xwediyê şens e?

Mirov, weke hebûneke mefafîzîk di razberiyê de dijî. Bîranînên kûr, li ser hev komkirineke bûyerên ku ji demên kevin de li ser mirov bi xwe, bandoreke mezin kirin e. Anîn bîra xwe, xweragiriyeke li beramberê demê ye. Dem, li dijî bîra me di şer de ye. Bêguman ya ku bi rengekî pir aşkere dibe hedefa vê rewşa şer jî, bîranîn in.

Vaye ez bi alegoriyeke bi vî awayî Tebaxa 2003’yan tînim bîra xwe. Em bi hatina hevalan zêde kêfxweş nebûn. Ji ber ku zêde nedihate zanîn ku dê kî bi çi re rû bi rû bimîne. Di dawî de bi encamên wisa zivirîn. Û piştî kêliyekê dê ew encam bihata xwendin û şabûna min di qirika min de bima...

Lê Bakur bayekî ji hinava min tê bû. Diviyabû min baş ev firsend bi kar bianiya û ya ku xwe gihandina wê ne gengaz e min pêk bianiya.

Ji ber vê yekê min ê xwe ferz bikira. Min ê li pêşberê îhtimala li pey grûbê hiştinê, ‘qozên’ xwe yên heyî bida pêş. Min dixwest ez biçim Dêrsimê, bi ser de jî ev ne daxwazeke asayî bû. Lê bi agahiya ku ‘dê piştî kêliyeke kurt civîn bê çêkirin’ kelecana me zêde bû. Lêdana dilê me, nefes stendina me bi zehmetî diket. Min dest pê kir bihizirim ku eger navê min bê xwendin ez ê destpêkê çi bertek nîşan bidim. Min ê nikarîbûya vê rabikim û qebûl bikim. Lê min xwe bi xwe digot, ka bisêkine, dilezînî, bi benzînê diçî ser agir. Min dest pê kir li benda danê sibeyê yê dotira wê rojê bimînim. Li cihê ku darê çinaran hene yê mangaya taximê ya hevalê Feîq li wê derê ye, li ber dengê beqên laşê xwe yê şîn dane ber tavê, em hêdî hêdî kom bûn. Her kesî hesta xwe, reftariyên xwe, awirên xwe, di pêçandina xwe ya titûnê de dide der, çavên xwe yên ji bê xewbûnê reş û şîn bûye û werimiye mist dida, hewl dida bi vî awayî bê ser xwe. Ti kes nediaxifiya, encamên vesaziya nû ku piştî bi kêliyekê bihata xwendin dihizirî. Yan jî ji bo nebe yek ji qurbanan ji xwe re hêvî dikir.

Hevalê Çem ji rêveberiya ku li pêş kom bibû xwe qut kir hat. Di nava me de li cihekî destdayî rûnîşt. Dizanî ku ji demeke dirêj e pê de heval kom bûne û vesaziya dawî qet jî ne berdêla keda hatiye dayin e. Ji ber vê yekê qederekê hewl dida psîkolojiya heval ketine navê nerm bike, di reftariyên xwe de şaşitî neke. Rastiyek bû ku ji ber vê rewşa nayê zanîn heval hestiyar bibûn. Hevalê Çem hewl da, hin caran bi pirsîna pirsên  bersivên wan kurt ji hevalên li derûdorê, vê atmosfera giran belav bike. Pişî çendek hewldanên wisa wî bi xwe jî fêm kir ku ti kes ji bo sohbeteke germ zêde ne amade ye, heval vê gavê bi vesaziyê ve kilîd bûne. Piştî vê wî bi xwe jî destê xwe danîn ser çongên xwe, dest pê kir koma tîrêjên di nava daran re hênikatiya sibeyê diqetînin temaşe bike.

Hevalê Brûsk bi meşa xwe ya xweş û çalak weke ku qet nexwazibe demê wenda bike weke komîsyon derket li pêşberê me. Piştî em rabûn şipiya û rojbaşa xwe parve kir em di cihê xwe de tûniştin. Heval xwest analîzeke pir berfireh bike. Lê belê ew bi

xwe jî, nayê zanîn çima wisa bû, ber bi mijara ku hevalên li vê derê bimînin şemitî û nekarîbû mijarê bi hev ve girêbide. Ji ber ku dizanî ji bo giştiye hevalan dê ev vesazî giran be. Bêguman ji vê encamê para wî jî hebû. Û min hîs dikir ku vê êş dida wî. Di rewşa heyî de diviyabû teqez hejmar bên kêmkirin. Ev biryar li wî derbas dibû. Li ser mijara navan rast jî bû ku hevalê Bahoz bi wî şewirîbû. Di pêvajoyeke bi vî awayî de em ne di pozisyoneke wisa de bûn, guh bidin ser analîzên siyasî. Jixwe hevalê Brûsk bi xwe jî ev fêm kir û rasterast derbasî vesaziya hevalan bû. Ji beriya vesaziyê çendek tişt parve kirin. Bi taybetî nuxeteyên bi vî awayî diyar kirin ku hewce dike hevalê li vê derê dimîn xemgîn nebin û ji xwe re vê nekin pirsgirêk, ji helwestên hestiyar xwe bidin aliyekî.

Vesaziya gruba biçe dê bi şiklê du grûb pêk bihata. Dê du rotayên cûda cûda bihatana şopandin. Grûbekê dê bi înisiyatîfa hevalê Çem û grûbekê jî dê bi înisiyatîfa hevalê Brûsk tevger bikira. Di encama vê vesaziyê de dê deh heval bimana.

Kelecana me derketibû asta herî jor, ji bo em wê kêliyê pêşwazî nekin me serê xwe xistibû ber xwe, nedixwest ew pêyva ku îfadeya navê me dike ji devê hevalê Brûsk bibihîzin. Bîranîneke ewqas ne xweşik e, dema min nivîsandiye jî bi hezaran car êşa wê kişand. Di demên wisa de mirov naxwaze bibe kesê wenda kirî yê wê rojê. Mirov dixwaze di wê kêliyê de bask bide, naxwaze li wê derê be. Dixwaze wenda bibe û bi hezaran reçeteyên rizgariyê weke vê, xwe dide ber darixzandinê û hukum dide. Mirov li tiştekî digere da ku xema xwe pê birevîne. Hemû demên te di ber çavên te re derbas dibin. Dihizirî ku gelo di vê galayê de tiştekî bi vê gavê re nakok e heye yan na. Tu çiqasî objektîf î agahiya te jê tine. Û her xwe mafdar derdixî. Yê/a timî rast û temam tu yî. Ji ber ku tu çima nayê fêmkirin hin hizirên ku bi hestên balkêş şikil girtine mêjiyê te dagir dikin. Werhasil hin caran ji ber hizirînê diwestî, bi awayekî asayî westabûna xwe didî derve, dikî ax û wax. Tê niha çi bikî... Xwe weke pir bi tenê û bêkes bî hîs dikî. Hevalên te yên li derudorê ji aliyê fîzîkî ve ji ber çavan wenda

dibin. Tenê dengê hevalê Brûsk tê û bi ber guhê te dikeve. Guh, destûrê nade ku ew xurminiya bikeve hindûr. Ji ber ku ji xwe hindûr bi wan hin dengên naşibin tiştekî, pêyv û hîsan dagirtiye. Li ber guhê te şerek heye. Lê tu ji vî  dengî hindûrê xwe erênî dibînî û bala xwe didê. Te dikojîne û ew tişt ji bo te, xwe digihîne asta jêneveger. Hinekê germ dibî  û ev têhna li ser eniya te bi bandora germahiya havînê dibe sedema pêkhatina pelqokên biçûk ên xwêdanê yên şor. Paşê jî pelqokên biçûk ên avê jî dikevin tevgerê. Ji xwe re li rêyekê digerin. Dixwaze li ser laşê aîtê te tevger bike û dike jî. Di vê navberê de hevalê Brûsk axaftina xwe didomîne...

Pelqokên biçûk ên hêdî hêdî mezin bûne weke dilopeke têra xwe mezin lê hatin jî. Hêdîka û rasterast tên xwarê. Dilopên xwêdanê têhna laşê te vediciniqînin li gel te dibin sedema reflekseke balkêş. Ev kêlî te hinekê hişyartir dike û tam wê gavê navê Eser dibihîzî... Belê dê bidome, dê teqez hejmara deh temam bibe. Rîsk dadikeve nehê. Hê navê te di nav nehê nehatiye xwendin de ye, îhtimaleke pir mezi e ku navê te di wê derê de ye. Navê Savaş jî li ber guhê te dikeve û tirsa te zêde dibe. Ma tê bêjî ji ber çi? Savaş jî weke te ji yên xwediyê rîsk bû. Ji ber ku hê pir ciwan bû. Hêdî, hêdî sist dibim. Êdî min her tişt fêm kir, biryara me hatibû girtin û pênûs hatibû şikênandin. Hevalêe Feîq, Çem, Cûdî... Serê hemûyan di ber wan de ye, pir aşkere ye ew jî nabihîzin. Ku yan jî naxwazin bibihîzin. Hizireke bi awayê ‘gelo vê gavê hevalê Çem çi dihizire’ li ser mêjiyê min serwer bû. ‘gelo kêfxweş e’? Ma çima kêfxweş bibûya, teqez xemgîn bibû. Piştî evqas ked li vê derê hiştina hevalan’.

Navê Brîndar ji ber kelecanê bi zehmetî min bihîst. Êdî ji bo wan rehet bû, ji ber ku qediya bû. Lê em ên mayine. Qet ji bîra min naçe weke dengek ji min re bêje, “heval dê te jî îsal li vê derê bihêlin. Di cih de refleksên min ketin dewreyê û min ewirek da derûdora xwe, di demên wisa de nêzîkbûneke pir wêrek e ku mirov serê xwe ji ber xwe rake. Weke ku dema ez serê xwe rakim û li hevalê Brûsk binêrim bi tirsa ku dê hevalê Brûsk bêje

“Mûnzûr”,  min jî dubare weke hemû hevalan kir. Piraniya hevalan bi hejik yan jî darikekî xistine destê xwe tevlî vê stresê dibûn, li ser cihên rutûbeteke sivik girtine şiklên ecêb ên xwaromaro xêz dikirin. Min her du destên xwe di ser çongên xwe re gihandin hev bi awayekî tund min xwe şidand. Bi hemleyeke wêrek min serê xwe zivirand ber bi komisyonê ve. Hinekê mirûzkirî me, nefes stendina min jî kûr ve ye û watedar e... Hinekê mirûzkirî me, nefes stendina min ji kûr ve ye û watedar e... Navê ku îfadeya min dikir jî min bihîst. Hevalê Brûsk xwendina navan domand, Zinar, Helim, Ferhad, Zerdeşt”. Hêdî hêdî bala min belav bû. Êdî ji bo bûyerên derûdora xwe bê xembûm. Weke ku guhên min nedibihîst yan jî ji aliyê hestan ve li dinyayeke din bûm. Ji bo min jî qediyabû.

Weke ku di binê tehteke pir giran de mayime bû. Ew kêlî, kêliyek ku mirov qet naxwaze bijî ye. Her kesî dixwest kêliyekê ji beriya kêliyekê ev tekmîl biqede. Min hîs kir ku kêliyekê objeyên li derûdora min bê mane bûne. Balindeya difire tine bû. Yan jî ji beriya kêliyekê tîrêja ku ji nav daran xwe ber dide xwarê, ew jî tine bû. Lê çi li wan moriyên biçûk ên reş ku ji beriya kêliyekê bi wî laşê xwe yê biçûk li ber çavên min diçûn û dihatin hatibû... Bawer im tiştê jê re dibêjin wendakirina wateyê ev e. Pir ne rehet bûm. Bi tevgereke jixweber min tebeqaya xwe ya titûnê ku bi zîvê Alman hatibû neqişandin derxist; hêdî hêdî tebeqa vekir û cixareya xwe pêçand. Ez dikarim bêjim wê kêliyê êdî ez di nav hestan de bûm. Cîhana me ya hestan dişibiya tebeqaya titûnê. Te çawa dipêçand wisa dişewitî û dukel derdixist.

Hevalê Brûsk û Çem bi lez ji wê derê dûr ketin. Weke ku zêde karibin vê atmosferê rabikin xuya nedikirin. Çi bigotana bila bigotana, her hevalekê/î dizanî ku vesazî bi agahiyên ku hevalê Brusk û Çem dayine hatiye pêk anîn. Evqas dem bi xeyalê Bakur jiyîn, xwe li ber germahiyê ragirtin, ne tiştekî karibe her mirov xwe li ber ragire. Lê belê di demek çend roj mayine de wêneya hatiye pêkanîn kêm bû. Li gorî me bi xwe em bi xemgîniya xwe mafdar bûn. Em dihizirîn,  li vê derê mayinê em heq nakin.

Hevalê Brûsk wê rojê qet bi me re neaxifiya. Hevalê Çem û Feîq jî wisa. Bi şiklekî zû û bi lezgînî navbera me sar bû. Ya hê rastir piştî evqas bihevrebûnê, ji bo ku em bi şûnde bimînin agahdarkirina hevalê Bahoz ji aliyê hevalê Brûsk ve ne tiştekî bi hêsanî bê daqûrtandin bû. Di rewşên wisa de her heval bi awayekî zêde bi lezgînî vê pirsa bi nav û deng dipirse. “Çima ez?” Pirsek ku heya bi niha min bersiva wê peyda nekiriye. Ev pirs tevlîheviyeke bê bersiv e.

Piştî xwarina nîvro hevalê Feîq hinekê bi madeyeke nexweş û dil jê mayî hat cem me. Her çendî xwest bikene jî zêde nekariya wê hewayê peyda bike. Heya bi vê sibê ji me piranî di bin berpirsiyariya wî de bû. Lê niha hevalê Feîq li ber çavê me ji me re weke biyaniyekî xuya dibû û ew jî diket nav psîkolojiya ku hevalê Brûsk afirandiye. Bi dengekî asayî ji me re wisa got, “hevalno hewce ye em piştî nîvro rêya xwe bi gel hevalê Bahoz bixin. Ji ber ku dixwaze we bibîne, bi we re biaxife”. Me qet li hevalê Feîq nedinêriya jî. Ew bi xwe jî di nava heman psîkolojiyê de bû. Me nedizanî ku çendî tevlî vesaziyê bûye, çendî jê re têkarî kiriye yan jî çendî dijber bûye. Ji bo me deh hevalan ev dibû sedem ku em li pêşberê hevalê Feîq bi baldarî tevbigerin. Hevalê Feîq hinekê axifî. Ji me serê yek du hevalan mist da yan jî xwest hembêz bike. Em ne di wê rewşê de bûn ku bersiva hezkirina wî bidin. Ez dikarim bêjim em hinekê êşiyan. Ev helwesta bi temamî ji hevalan qutnebûnê bû. Di binê helwesta me ya xemgîn de ji bilî li gel wan rêwîtî kirinê, ji daxwaza ew pêvajo jiyînî tiştek din tine bû. Hevalê Feîq dixwest bi ber dilê me de biçe lê nedikarî bi ser bikeve. Piştî ku hinekê rûnîşt, got, “ber bi saeta çûyînê dixwazim we bi rê bikim, ji bîr nekin agahî bidin min”. Ev deng li me kirin weke bîranînek bi êş li cem me ma. Bi vê nêzîkbûnê, bêyî agahî dayinê, bêyî xatir xwestina ji hevalan, me nuxteya xwe ya bi darên çinaran hatiye nuxumandin bi awayekî ku di mêjiyê me de hezar fikir û hizir derbas be û weke lehiyeke hers û eciziyê nuxteya xwe terk kir û ketine ser şivereya xwe ya kedkar. Ew nuxteya me ya ku her berbang û şeva wê bi xewn û xeyal bû, şivereya me ya bi toz ya weke maran xwaromaro bû ku di bin

mekabên me de dieciqî, ji beriya berbangê em bi rewşa nîv şiyar û nîv çav li xew li ser dimeşîn... Rêya ku bi hezar fikrên cûda em li ser dimeşîn...

Em ewqas bi hêrs bûn, ji beriya em tam fêm bikin da ku çawa çêbû me xwe li gel hevalê Bahoz dît. Xemgîniya me bi germahiya rojan re weke jahrê lê dihat. Panzde rojên me yên li Biryargeha Navendî çawa derbas bûn me fêm nekir. Me bi rewşa xwe ya ne li ser hemdê xwe û çilmisî, dibûn sedem ku yên me bibînin dilê wan bi me bişewite. Di rojên ji wê bi şûnde de me heval bi rê kirin. Em jî bi soz û hişyariyên hevalê Bahoz li ser esasê ku sala bê biçin Dêrsimê hinekê hatin hêvîdar kirin. Vesaziyên me hatin kirin. Em tevlî merasîmên veqetîna hevalan nebûn. Sedema me ya tevlînebûna merasîmê bi rastî jî, ne ji ber hestên sarbûna ji grûbê, hezkirina me ya pir mezin a ji bo çûyîna hevalan, dema heval ji me qut bibin êşa pir mezin ku me bikişanda bû.

Ber bi Îlona wê salê hevalan dest bi rêwîtiya xwe kirin. Dema ev rêwitî bi hêvî berdewam dikir piştî demeke kurt agahiya şehadeta hevalê Firat gihaşt me. Hevalê Firat, di jiyanê de bi sekna xwe ya feylesofwarî, bi karektera xwe ya germ ku mirov ber bi xwe dikişand di jiyanê de profîleke mînak diyar dikir. Şehîdbûna wî ya pir berwext xemgînî zêde kirin. Wendahiyeke ti kes ne li bendê bû. Hevalê Firat bi sekna xwe ya wêrek û bi hê ji bo pêşerojê hêvî û bawerî dida. Lê nebû, ji bo wî bû rêwitiyeke nîvçe. Li pey wî, tenê wêneyekî rengîn ku di jiyana xwe ya sivîl de kişandiye ma. Bi wan çavên xwe yên mezin ên bi bişirînê diçurisîn, hemû manewiyatê îfade dikin.

Me li gel hevalê Feîq xatir ji hev xwest. Xemgîn û dilşkestî bû. Me çendî bikira ax û wax jî ya bûye bibû, hevalan ji mêjve dest bi rêwitiya xwe ya dirêj kiribûn. Ji vê şûnde ji bo me hevalên ku li pey wan mane, noqî nav dinyeya hizrên tev bi rojekê gihaştina wê derê bûnê ma. Me ev neçûyîna ji bo xwe kir pirsgirêkeke mezin. Ya hê rastir ji me hinekan, mînak ji me yên mayine yek jê bi qasî tê bîra min li Gareyê ma. Li gel Savaş, min dest bi rêwîtiya

Metînayê kir. Brîndar û Şehîd Zinar bi pêşniyarê xwe li gel hevalê Bahoz man. Ferhad li Pîrîzê ma. Ji grûba me ya deh kesî, yên din li ku derê man û çûn ku derê nayê bîra min.

Dema zivistana 2003'yan xwe bi zivistana 2004'an ve girêdida li bendê mayina biêş bi kelecan dest pê kir. Ji ber ku çûyina me ji aliyê hevalê Bahoz ve bi awayekî zelal hatibû erênî kirin ti tirs û gumana me tine bû. Çûyina me misoger bû.

Di meha Adarê ya 2004'an de hê gava beşek mezin a erdê di bin berfê de bû, bibû herî û ji dar û şînatiya ti agahî tine bû, beşên herî bilind ên çiyan ji aliyê rengî spî ve hatibû dagirkirin û diteyisî, di şevên tavaheyv de berfîna ji mêjve ji Çiyayê Reş heya bi tepêyê Şoreş li tevahiya Zapê xwe amade kiribûn. Mizgîniya rojên bi tav ên xweş didan. Hemû çem û av weke heriyê diherikiyan, dîn û har bibûn. Sîpelên havîne yên di palên çiyayan de diherikîn bi xîz bûn, newalên biçûk çêbibûn, xwezayê xwe dabû ber nîşandana xêr û bêra biharê. Wisa xuya bû dê sal baş derbas bûya. Hezîranê bûyerên germ di hinava xwe de dihewand. Maneyeke wê ya kûr hebû ku bendewarî ji Hezîranê hebûn. Hezîrana wê salê dê ji bo me bibûna ji nû ve vejînê, bibûna pênaseya navê qîrkirinê û bibûna pênaseya navê  israra jiyana azad û wisa bihata bi bîranîn. Hezîran ji bo me weke navê hemû hedefa me xeta startê bû.

Li cihê gundê ku jê re Zêvê dihate gotin û bi hemû heybeta xwe ecêbeke mezin a xweşik a çiya bû, li binê darên hinaran em kom bûn. Hê li jor, Sibatê bandora xwe dida hîskirin, wisa xuya bû ku tenê derûdra gelî, gundê Zêvê jî di nav, de germahiya Adarê jiyan dikir. Hinekê şîn hatibû. Darên hinaran hê nû nû bişgok didan. Darên kizvanan ên hê li jortir ku darên avhewaya dijwar bûn, bi çiqên xwe yên weke zuwa bûyî xuya dibûn hizireke wisa dianî bîra kesên wan dibînin, "ev dar careke din şîn nayê".

Ji ber agahiya em ê li gel hevalê Botan Hekarî kom bibin ji Zêvê em gelek heval bi rê ketin. Piştî ku me Şîvê bi hezar zor û

zehmetiyê derbas kir, li nêzîkî hevalê Bahoz me kampa xwe ava kir. Bi demê re hejmara me zêde bû. Dikarim bêjim nêzîkî pênc hêyvan em man. Rehet û baş derbas bû. Ev rehetiya me hinekê jî girêdayî bi misogerbûna çûyina me ya Dêrsimê ve bû. Me di hemû dema xwe de bi xwe re xeyalên xwe yên gihaştinê jî, mezin kirin û hilgirtin. Bi taybet ji bo min û hevalê Zinar ev meş dê bibûya dermanekî baş. Me dê xwe bigihandana kêfxweşiya hevalên xwe yên me nekarîbû bi hev re rêwîtiya çûyînê bikin û xatir ji hev bixazin. Me salek wenda kiribû. Ev rast bû. Lê ya grîng bû, ma ne gihaştin bû? Ya girîng ma çûyine? Ya din jî çi ferqa wê hebû jixwe vê gavê ruhê me li wê derê bû, tevger dikir. Xweda dizanî em ê çawa bihatana pêşwazîkirin? Heta me ji niha ve kêliya ku em bi hevalan ve hev bibînin dianî ber çavên xwe. Lê ew erdnîgariya ku bi hemû raboriya xwe bi êş ve weke hev lê hatiye... Dêrsim, bi hemû barhilgiriya îdealekê li wê derê bû. Bi hemû xweşikbûna herikîna  kaniyekê li wê derê bû. Ew ewir û li bendê mayina tije bi gilî û gazinc, banî karkerên azadiya xwe bi xwe dikir. Ev hezkirin, pir girîng û balkêş bû. Hevalên weke Berxwedan, Feîq, Botan, Şiyar; barhilgirên vê evînê jî ma bi ber bayê wê neketibûn... Bi qasî dîrokek ku bi navê wê re bûne wekhev û prangayên li benda hatin vekirinê ne, ji bo êşên vî bajarî birîndar, bûn derman hebû. Ev bajar berpirsiyariya evînê bi xwe bû. Afirînerê çendîn hestan bû. Ji ber ku bi qasî tolhildana diafirand û mezin dikir, evîn diforand, cihê herî aram û tarî yê ruhê me, li wê derê bi cih dibû û dibû mayende. Şîn dibû. Mezin dibû, di nav me de xwe li gorî xwe bi cih dikir. Me bi  van hestan xwe amade kir, di wê bihara dûr û dirêj de. Kêliyên herî zehmet ên jiyanê jî ji bo me weke tiştên em ê karibin çareser bikin dihat. Em bi awayekî xurt tevlî bûn û me baş kar kir. Roj hat êdî em amade bûn. Em Ber bi dawiya meha Hezîranê, bi kêfxweşiya dîtina hevalên ku par ji kêfxweşiya bi hev re rêwîtî kirinê bê par mayine û bi xeyalkirina pêşerojê, tevlî rêwîtiya watedar û mirov diwestîne bûn. Min tevî xwe bi xwe, hemû xeyalên xwe yên li ser Dêrsimê jî dan pişta xwe.

Ev qada ku ji bo min weke stranekê lê hatiye, li cem min timî tiştên cûda dianî bîra min. Jixwe di seranserê demeke dirêj de bîra civakî timî bûyer û trajediyên ku di ser re borî ne zivirandiye stran û di maneyekê de bi rêya ji nû ve hilberînê li pêşiya hatin jibîrkirinê bûye asteng û kiriye malê gel. Stran Dêrsimê ewqas vedibêjin ji beriya mirov bibîne, wê derê nas dike.

Gelek hevalên me em dest berdin ji Dêrsimê ji beriya ku yek cihê Kurdistanê jî bibînin derbarê Dêrsimê de xwediyê nêrîn in. Sedem ew e ku hin entelektuel û hunermend, rewşenbîr û nivîskar civakîbûn û manewiyeta Dêrsimê, êşên mezin ên kişandine timî digirin dest û vediguhezînin nifşên nû. Ev hûrguliya pir girîng, tevî ku di ser re ewqas sal derbas bûne jî, ji ber ku çîrok, stran, hawar her hatine ziman û bi vî awayî civakê dibe nav dîrok û wê rojên zemheriyê. Huner û wêje li vê derê amûreke navbeynkar e. Bê guman têkoşeriya PKK'ê û terza tolvekirinê ya hatiye jiyîn bû ku dîroka hatiye jiyîn, li ser zanebûn û ruhê mirovan niqirandiye û bi wêje, bi hunerê veguherandiye sozê, veguherandiye nivîsê.

Sedemek jî xwezaya wê ya xweşik a Dêrsimê ye evqas bela tê serê wê. Xweşikbûn, yanî estetîka xwezayî navê din ê Dêrsimê ye. Ez li ser pir hizirîm ku ji bo çi Xweda û Xwedavendên Mezopatamyayê ev der ji xwe re nekirine cih û war; eger kiribin jî ez nizanim. Mînak, li Yewnana antîk çiyayê Olympos heye. Ev çiya bi xweşikbûna xwe ya xwezayî cih û warekî Xwedayî ye. Jixwe endnîgariya Yewnan jî zêde ne rast û deşt e. Peravên Egeyê asê û teht in. Ji jor ve çiyayên Balqan ên mezin hene. Dema arteşa Med û Persan di bin fermandariya Keserkes de êrîş dike, Yewnanîstan ji aliyê tehtên Termophy ve tên parastin û artêşa Med di behrê de asê maye û nikariye bikeve hindûr. Tenê yek rê heye. Lê belê ew rêya jî, ji aliyê qralê Spartayê ve bi sed leşkerî hatiye girtin û nehiştiye derbas be.

Li vê derê bi qasî têkiliya di zikhev de ya erdnîgarî û dîroka civakî, têkiliya mirov-xweza jî pir aşkere xuya dibe. Dêrsim bi salan ji bo Elewiyên Kurd bûye cih û war, bi qasî xweragirtina

civakî, weke çiyayê Olympus ji bo Yewnanan bi rolekê cih û warê Xwedayîbûnê rabûye erdnîgariya Dêrsimê girîng e.

Ti kes nikare xwe bigihîne tiştê Xwedayî. Mînak, Mûnzûr Baba jî, li vê derê bi tehtên xwe yên asê û bi dîmena xwe ya bi heybet ceribandinek e, cih û warekî xwe gihandina wê ne gengaz e. Di rutuelên baweriyên Hînduyan de jî timî bilind, asê û zehmet bûna cihên îbadet û înziwayê maneyek ku deriyê heqîqetê yê piştî ceribandin û ezmûnê gihandina wê pêk bê dide.  Weke ku her avabûn û jiyadayikbûn di encama pêvajoyeke biêş de pêk tê, her bi hilkiştina Çiya jî biêş û jan e. Erdnîgarî bi vî aliyê xwe jî maneyeke teolojîk digire. Mînak, li Mezopatamyaya jêrîn jî Xweda û Xwedavend ji ber taybetmendiyên xwe yên erdnîgariyê bi navê bajar, çem û pîşe tên naskirin. Tenê Nînhûrsag bi navê qebileyên Bakûr (Aryen, Hurî, Kurd) tên naskirin. Mîtolojî dibêje ew Xwedavendeke çiya ye. Xwedavenda qebîleyên Hurî yên Aryenîkên bakur bû. Paşê li Sumer bû Înanna. Rêbertî di paraznameyên xwe de vê analîzê bi pêş dixe.

Bi rewşa xwe ya xwezayî mertaleke xwezayî ye Dêrsim. Dema me awayê nêrîna mercên modernîteyê û ew psîkolojî da aliyekî û bi nêrîneke dîrokî lê temaşekir, mane û girîngiya vî cihê bi awayekî pir aşkere nîşanê me dike.

Mînak, mirov nikare heman dîmenê li aliyê din ê çiyayê Mûnzurê bibîne. Yan jî kesek ku derketiye çiyayê Yilan dema ber bi Meletî ve diçe, weke bê parastin û rût û tazî be xwe hîs dike. Ber bi jêr ve Palo-Elazîz jî xwediyê heman dîmenê ye. Bi hemû van taybetmendiyên xwe yên xwezayî, Dêrsim cihekî wisa ye ku mirov heyran dihêle. Rêwitiya Dêrsimê ya gelek hevalan ku bi hestên dişibin van hestan birine serî, bi ber van ked û hewldanan ketiye. Gelek kêm heval hene ku Dêrsim dîtibin lê jê eczbûyibin yan jî erdnîgariya di xeyalên xwe de nedîtibin, xwe negihandibin wê hestê. Yên ku hene jî yan bi pêşdarêzeke diyar hatine yan jî, ji aliyê çêkirina têkiliya ax û mirov ve nêzîkbûneke pir serasera raber kirine. Hewldan e li cihê ew lê ne bibînin. Lê dîrok-felsefe û

rojanetî harmoniyeke baş pêk tînin û li gel mirov wê hesta watedar diafirînin. Analîzeke zuwa ya erdnîgariyê ti tiştî nade. Hewce ye hestên welatparêztiyê bi pêş ketibin da ku xaka me, me bigihîne dîroka me û cewherên di hinava wê de veşartî.

Pirsgirêka herî bingehîn a vî cih û warî dîsa ew bi xwe bû. Ti car destûr nehate dayin ku ew weke xwe bimîne. Timî bi êrîşan re rû bi rû ma û hewl hate dayin da ku bê tinekirin. Bi xweşikbûna xwe, bi dewlemendiya xwezaya xwe û bi mîstîzma xwe ya xweserê wê bi xwe, bi motîfên herî dewlemend ên dîrok û çanda me tije bû. Behsa bi dehan ocaxên Pîrên Elewî tê kirin. Ev cih û war diyarê ocaxan bû. Diyarê Derwêş û Pîran bû. Jiyaneke munzewî, çandeke jiyana komînal, mînak li vê derê cem û qurban, weke çand rûniştibû. Bi ya hindik qîma xwe anîn, heq û heqîqet fêrbûn li vê derê doxtrîna bingehîn a jiyanê bû. Her timî li gel felsefeya Mansûr ku ne bi şikil ve bi cewherê ve eleqadar e, bi çanda xwezayî ya Zerdeşt re di nava hev de bû. Baş e, çi qewimî, rewşa roja me ya îro çi ye, hatiye çi rewşê? Bi taybetî li Dêrsimê û bi giştî jî, li hemû Kurdistanê, hewl tê dan trajediya Medûsa bê jiyandin. Medûsa bû qurbana xweşikbûna xwe. Her keziyeke wê ji ber hesûdiya wê bû marekî û ji me re weke fîgureke neletê ma. Lê di esasê xwe de ma wisa bû? Heqîqat dibêje qet ne wisa bûye. Ya ku îro bi serê Dêrsimê tê kirin yan ji bo hemû Kurdistanê rewa dibînin, Medûsabûn e. Îro Kurdistan di navbera Medûsabûn û Îştarbûnê de şerekî dimeşîne. Hemû deverên Kurdistanê û Dêrsim jî rewşeke wisa dijî.

Bi xwe ji xwebûna xwe derketin, di encama derxistina ji xwebûnê de biyanîbûnek ku hatiye fêrkirin e. Hevalên weke Feîq, Şiyar, Botan, Rojhat, Ezîz, Çekdar dikaribûn vê çarenûsê hilweşînin; çarenûsên xwedayên şaristaniyê nivîsandine berevajî bikin. Êdî dikarîbû hebûna xwedayan bi xwe bibe mijara nîqaşê. Vaye van hevalên me weke stêrkên ji nişka ve xuya dibin û di cih de wenda dibin, temenên xwe feda kirin. Jiyanên wan timî bi çîrokên xwe gihandina serketinê dagirtibû. Jirêzebûna mirovê/a asayî derbas kiribûn. Derbaskirina vê ji israra wan a jiyana nû ku xwe dispart

zanebûna wan bû. Timî xwediyê bêgunehbûna zarokekê/î û nazenîniya wê/î bûn. Bi herikînên xwe yên weke avê zelal di her qada têkoşînê de timî herikiyan deşt, erdên dêmî û ji têhnbûnê terikîne. Ew, ji yên ku bûne sedema şînbûnê bûn. Ji bo me çandek, mîrasek hiştin. Rewşa me ya herî bêxem êdî wisa ne domdar e. Dîroka me jî heye, êdî cîhan me nas dike û li ser me diaxife. Me çawa xwe gihand van rojan. Bêguman em gelek tiştan deyndarê heval Ezîz, Faîq û Rojhat in. Bi şehadetên xwe pêşî li wendabûna gelê me ya di tarîtiya sift a valatiya modernîteyê de girtine. Hebûna me mayende kirin û bûne sedem ku em li ser cewhera xwe şîn bên.

Mirovên me yên ku ji xwe direvîn bi qîr û hawarên li Newala Cihenemê (Cehennem Deresî) veciniqîn û baş guhê xwe dan ser cihê deng tê. Revîn bê wate bû û koletî ne çarenûs bû. Yên li beramberê vê çarenûsê li ber xwe didin, bi berxwedaneke di berdêla mirinê de ev çarenûs berevajî kirin. Gotin di jiyanê de nakokî hene. Çi kişandin, saetên wan ên dawî çawa bû? Şahid û yên ew kêlî jiyane dizanin. Hin caran bûyerên tên jiyîn jî fêrkerên pir baş in. Rewşên wisa ne ku pirsgirêkeke pir giran bi awayekî herî bi cewherî û rasteqînî îfade dikin. Dîroka gelan, dîroka şehadetan e jî. Eger li cihekî mirina bi ciwantî hebe, mirin bi qasî ciwantiyê nû be, tê maneyê ku li wê derê du tişt hene: ting û tarîtiyek û ûtopyaya pêşerojê ya bi qasî tava sincirî.

Ev hevalên ku qîmetên me yên herî mezin in, layiqê rûmet û hezkirina herî mezin in. Ev hevalên me yên ku hêviyên me yên herî mezin in, bûn subjeyên herî bi hêz ên di kesayetiya wan de mîrasa me tê bîranîn. Jiyana me weke çemekê li gel doza ku wan ava kiriye, ji bo wê têkoşîn meşandiye diherike. Her hizir me bi wan re yek dike. Her bîranîn wan tîne bîra me. Ew hunermendên demên herî baş bûn. Xwediyê hezkirineke herî mezin bûn.

Ev hevalên biryardar bûn Dêrsimê ji feraseta çarenûsa ‘xwedayî’ rizgar bikin, bûn awayê derketina mînak a herî girîng ji nakokî û pirsgirêkan. Çawa? Komcivatên ji jiyana xwe bi şiklekî kesî yan

jî kolektîf nerehet in divê wan bixwînin. Ew ê ji wan gelek tiştan ji xwe re bigirin. Bêçareserî, ne çareserî ye. Eger hêvî, bê plan û pratîk be bêxemî ye. Lê di mercên herî bê derfet de di ezmûnên neasayî re derbas bûn. Canên xwe feda kirin. Serbilindiya ku di mercên kedxwariya kapîtalîst de bi salan di jiyanê de xwe gihandina wê pêk nayê, wan weke her tim bûyî bi berxwedêriya xwe ya Newala Cihenemê (Cehennem Deresi) careke din xwe gihandine wê. Û hebûna xwe watedar kirin. Çanda fedakirin û berxwedanê ya ku li gorî roja me ya îro ji nû ve rêkûpek kirina dîrokê ye, bi wan wateya xwe hê jî kûr kir. Çanda me ya gel ya li şikêrên Îksor û gelek cihên din xwe bi fedakirina xwe tacîdar kiribû. Lac an jî Halbûrî cih û warên wisa bûn, hemûyan ji bo dîmena xweşik a berxwedanê şahidî kiribûn. Kaniya Spî, Têkoşîn û Sêîd Riza dîtibû. Têkoşîn, li gorî roja me ya îro dîrok afirandibû. Bibû layiqê Dêrsimê û xwe fedayê cihê jê ye kiribû.

Fedakirin, çanda qedîm a Rojhidata Navîn bû. Her fedakirin di manewiyat û dilê wê civakê de weke bûn xwediyê rumeteke giranbiha paşde vedigere. Bi salan dibe semboleke azadiyê ya nayê jibîrkirin. Ev gel xwediyê vê wijdanê ye. Pratîkên fedakariyê bê berdêl nahêle. Ji ber ku armanca di hinava xwe fedakirinê de dizane. Di esas de li wê derê xwe dibîne. Yan jî destûrê dide ku ew pêşeroja bi hesreta wê ye wê hemêz bike. Şehîd, gel hişyar dike. Gel bi şehîd diheje. Şehîd bi pratîka xwe gel bi bandor dike. Bi merasîma termê xwe çalak dike. Gel bi şehîd yek dibe û hev digire.

Dema rêwitiyê nêzîk dibû, bi hizirîna wan kîlometreyên dûr û dirêj min xwe amade kir. Palên Kurê Jehro û Kaniyê Guzê wahayeke tev bi rengê zer xwe alandî bûn. Rêngê kesk ê biharê cihê xwe ji zerê vekirî û keskê vekirî re hiştibû, tenê newalên av li ser hê dîmena xwe ya berê diparastin. Qamişên dirêj dimêneke wisa diafirandin ku bi wê bejn û bala xwe, weke ku hin cihên avzê dagir kiribûn. Qada mezin a perwerdeyê ku em lê kom bibûn tev tije bi hevalan bû. Li gel hevalên rêwî û yên wan bi rê dikin, hevalên kameraman ku dixwestin vê kêliyê heta hetayî bikin jî

amade bûn. Piştî bi merasîmên rêxistinî-leşkerî me ji hevalên ku em ê careke din wan nebînin xatirê xwe xwest û em ber bi Dola Şîvê bi rê ketin. Tevî gavên bi kelecan, tevî hilgirtina hestên cur bi cur.

Ji ber ku rêwitiya diyarên dûr bû, bi qasî gengaz be me hemûyan li gel xwe hin ji tiştên bi hêsanî li Dêrsimê peyda nebin jî rakiribûn û barê xwe giran kiribû. Ji ber lêdana şewqa tavê cilên me yên leşkerî diteyisîn. Em bi çekên di destê xwe de ku piraniya wan nehatiye bikaranîn, bi wernîk, cîlakirî û li ser boyaxa wan a reş xêzikek jî tine bû, bi meşeke bi heybet dimeşiyan. Tevî psîkolojiyeke bilezgînî, hemû laşê me bi daxwazeke kêliyekê ji beriya kêliyekê ew bikaranînê tije bû.

Ma kî dizane kelacana me ya çendemîn bû. Yan jî ev heman psîkolojiya gerîlayekî/ê ya çendemîn bû. Vaye niha ya ku di kesayetiya min de dihate jiyîn jî ev bû û min didît ku li cem hevalên li rex min jî xwediyê heman psîkolojiyê ne. Fikara gihaştinê ne tiştekî bi hêsanî bê rakirin e.

Ji Kurê Jahro em weke grûba dawî derketin. Ji ber ku em grûba dawî bûn, me tenê ji hêza Başûr xatir xwest. Di seranserê rêyê de li cihên me rêya xwe bi wan xistiye, bi hêviya serketin û rojekê hevdîtinê, em ji hevalan diqetin. Ya ku me kiriye li ser şopên beriya ji me dubareyek bû. Ji bo ku şop wenda nebin divê bên nûkirin. Koçberî û rêwîtî ji bo Mezopatamya û Rojhilata Navîn lêgera heqîqetê ya xwe nû dike bû, ya vê gavê pêk dihat jî, dîsa dîrok bi xwe bû.

Hin caran ji ber ku em şev û roj dimeşiyan, min ew firsenda peyda dikir ku ji dûr ve ewirekê biavêjim cih û warên me li pey xwe hiştinê. Çendî bi heybet û çendî şêrîn bûn. Çendî xwedî sekneke watedar bûn. Hema bêje weke ku wê kêliyê çiya, gelî dihatin ziman bi qasî xemgîniyê serbilind jî dibûn. Ji ber ku şervanên azadiyê di hinava xwe de dihewandin. Hizireke wisa mêjiyê min dagir kir ku gelo sedem çi bû her ku dûr dikevin

ewqas şêrîn û baldar dibin. Tiştê ku di vê astê de wate dida wan bêdengiya wan a mezin bû, sekna wan a asê bû. Çiya, cîh û war timî pir girîng in û diyarker in. Bi rewşa xwe ya xwezayî Xwedayî ne. Ji ber ku erka parastin û hewandinê pêk tînin. Her ku mirov çiyan nas dike mirov jiyana çiyan jî qebûl dike. Her geliyek, her çiyayek, her dareke bîranînek e. Agahî didin. Ji jiyana ku bi wan re yek bûye re şahidî kirin, girîngiya wan pir zêde dikir. Çiya tê wateya jiyîna zehmet lê jiyîna mezin. Zagonên çiyê hene. Gerîla ne tenê ev zagon qebûl kirine û pê qîma xwe aniye, hin tişt li ser zêde kiriye. Eger zuwa be şîn kiriye, eger sar be germ kiriye.

Dema meşê rojên destpêkê ji ber rewşa me ya xweserê xwe ya sîstematîk, yanî bi tam amadekarî em hinekê westandin. Ji ber vê yekê hê dema em di erdên Başur de bûn bi qasî ji destê me tê em hêdî hêdî, bêhna fireh meşiyan. Bi piranî meşa me li donzde-yekê şevê derbas nedikir. Bi cilên ji ber xwêdanê şilbûyî li cihêkî em radizan. Ji ber ku her dever a me bû, hawîrdora me heval bûn. Sedemên rehet tevgerîna me hebû. Hevalê Hogir nîşaneyên wisa raber dikir ku ew ê bi derbasbûna Bakûr re bi misogerî vê nêzîkbûnê qebûl neke.

Ji ber ku em hêza Bakûr bûn hewce dikir em hê zêdetir xwediyê disîplîn û hişyar bin. Diviyabû me ji xwe re kiribûya fêrbûn. Bakur û Başur du cîhanên cûda bûn. Zagonên wan ên xweserê xwe hebûn. Li Başur gerîlatiyek ku bi demê re ji ber şert û mercên wê yên erdnîgarî û stratejîk afirîbû hebû. Lê bi misogerî me nedikarî em vê li Bakur bidiomînin.

Ev bi îmhabûnê re heman tişt bû. Ji ber vê yekê dema em hê li araziya Başur bûn me dikarî hinekê rehet tevger bikin. Ji ber ku dema bigihîjin cihê xwe yê nû îhtimal hebû bêşensiyeke weke nedîtina vê derfetê hebû.

Li aliyekî hêdî hêdî Başur li pey me wenda dibû, li aliyê din hêdî hêdî çiyayên li pêşiya me dest pê dikir bilind bibin. Ev dihate

maneya îşaretekê; yanî em diketin Bakur, weletê ku timî li ser serê wî tufan û qiyamet tê rakirin. Êdî aliyê em pê de biçûna asê dibû û fikar û xema ewlehiyê zêdetir xwe dida hîskirin.

Hin caran piştî bi rêwitiya ku heya sibeyan berdewam kiriye cihekî xweş dîtin û lê navber dayin jî pirsgirêk bû, yanî me her tim cihekî dest dayî peyda nedikir. Neçarbûna li cihên pir nebaş navber dayinê bi xwe re ecziyên biçûk jî dianî. Derfet peyda nedibû ku ew hemû westabûna şevê, mirov ji ser xwe biavêje. Jixwe ya herî bi êş jî ew bû ku di dawiya meşa heya sibeyê berdewam kiriye de li cihê navber hatiye dayin, yan jî hema hinekê li çep û rasta wê, daristaneke şêrîn û destdayî, şikêreke asê hebûya. Heya bi êvarê li wî cihê me yê pir teng, kirin ax û wax ne tiştekî hêsan bû. Bi hesret li wî cihê dest dayî nêrîn, roja xwe qedandin ji bo me cureke êşkişandinê bû.

Demê, meşa me ber bi dawiyê ve dibir. Roj li pey hev diqedîn, şev ber bi sibeyan ve hê jî dirêjtir dibûn. Hin caran meşên li ber tavaheyvê dihatine kirin weke mirov di romanekê de bijî bû. Tam jî di vê demê de cih, heval, bûyerên em jê re bûne şahidê wan timî di bîra me de weke niqirandî mayine. Gelek caran dîmenên ewqas xweş peyda dibûn mirov dixwest bisekine û bi saetan temaşe bike. Di nava tariya şevê de şewqa ku dihat azman kêmronî dikir, xuma xuma bajaran heya bi cem me dihat. Lê dîsa jî dîmenên xwezayî, deştên bê ser û ber  ku me di wan şevên tarî de nedikarî jê sûd bistînin jî dibûn. Gundên li qiraxekê mayine, malên li palekê hema wisa bi cih bûne, av, bostan û arazî, şivanên gundan, hewtîna kuçikan hemû van reng û dengan nav zikê şevê dadigirtin. Şev bi van deng û qerebelixiyan hê jî girantir dibû. Bi rastî jî ne ji van hûrguliyên şevan dixemilînin bûya, rêwitiya me dibû qehireke mezin.

Hevalê Hogir bi wê hişyarî û baldariya xwe, timî li herî pêş dibû. Kêliyekê jî dûrbîna xwe ji ber çavên xwe nedidanî, timî sekna xwe ya çalak û cansivik diparast. Qederekê bibû ku me li Gabarê derbas kiribû, me xwe gihandibû amedê jî. Rêwitiya me ya ku me

di çarçoveyeke diyar de plan kiribû serketî derbas bû. Grûba hevalê Botan ku berê ji me qetiyabû ji mêjve xwe gihandibû cihê xwe. Êdî dora gihaştinê ya me bû. Hevalê Piling, Nesimî, Bahoz, Serhed, Yucel, me hemûyan hîs dikir ku me xwe daye ber Dêrsimê. Êdî bes bû, em pir westiyabûn û me xwe gihandibû hedefa xwe. Dêrsima ku bi qasî gihaştina wê ne gengaz bû ji me dûr bû, bi qasî nefesekê nêzîkî me bû.

Me li Çewligê ji hevalên li derûdora xwe dipirsî ku gelo ev rêze çiyayên li hemberê me kîjan dever in, yan jî ava vî geliyî bi ku derê ve diherike? Her heval di cîhana xwe ya hindûrîn de xwediyê rêbazek bersiv peydakirinê bû; meraqa Dêrsimê! Çi tişt bû ya ku vî cihî wisa bi meraqeke mezin ve bi xwe girêdide? Vê pirsê, bi vî awayî bi rêbazên neyekser pêdiviya xwe ya bi bersivê peyda dikir. Ev pirs, lezandineke ecemî ku ji deryaya hesretan çavkaniya xwe distîne bû. Îfadeya pratîkî ya hezkirina zarokane, derketina ji wê tarîtiya bi wate ya hezkirina felsefîk û weke mînaka ewiran ronahiyeke rastîn e.

Meşên me yên şevê di binê azmanekî xwerû, pak û têr stêrk de di şevên tariya wê ji ber bandora şewqa gundan têkçûye, ber bi bozê şîn ve bûye de didomiya. Şevên me ji aliyê kundên ji dûr ve ji meşa me re şahidî dikin, hin caran jî ji aliyê dengên beqan ku ji gol û newalan tê ve dihate xemilandin, weke ku çirçirkan dema xwe qedandibû xuya dikir. Periya bi dîmenek ku aram diherike em pêşwazî kirin. Hevalê Bedranê ku quryeyê me bû, ji ber nebesiya xwe ya hostenebûna xwe ya di araziyê de dema bi awayekî bi kelecan tevdigeriya nedikarî ku panîka xwe veşêre.

Pêrî bêdeng bû. Wisa bê deng bû, dişibiya mirinekê. Sedem jî ew bû, xweşikiya wê bibû qurbanê barajê. Perî bibû nêçîra çilektiya zalim a şaristaniyê! Ka em binêrin wê derbasbûna me asteng bikira? Bedran ‘pisportiya’ xwe da axaftin û bi hezar zehmetiyê aliyê ku em ê pê de biçûna peyda kir, rê jî! Di encamê de me Ava Periyê qut kir.

Ava Periyê ji stranan dizanim. Di wan bîranînên gerîla de ku min di zarokatiya xwe de xwendine, ji ber cih û warê ku germahiya herî di asteke jor de bûye, ew pratîka herî bê rehm li wê derê bûye. Vî şerî huner û wêjeya xwe jî diafirand. Yan jî dibû sedema wê. Jixwe ma ne staran in ku me dibin wan bexçeyên xeyalan? Yan jî ma ne bangên li mîtologya ne ku me ber bi xwe ve dikişînin...

Di nîvinga vê şevê de Perî li pêşiya me asteng bû. Bayê wisa li me dida ku bi qurûpistkirinê me hevalê/a li gel xwe nedibihîst. Êlekên me li çep û rasta me dida, çenteyên me yên giran tewazina laşê me xerab dikir. Bayê tê, hemû ewrên tozê li Periyê diavêt ser me. Bi roj nedîtina Periyê ku me bi hezar zehmetiyê qut kiribû ji bo me ne baş bû. Lê min ê di sala 2008'an de ev meraqa xwe derbas bikira. Ji ber stresa germahiya roja havînê ji aliyê Dêrsimê, tev bi cilan min xwe avêt nav. Ji bo ku bi raza wê nexeniqim, yan jî ji bo hê zêde em hev nas bikin, herî dawî min bi roj Perî dît. Laşê min ê qirêj bûyî, li gel Periyê hev dît. Min ava wê hîs kir û pê re bûm heval. Di zarokatiya min de dayika min digot, "xwediyê her tiştekî heye". Ti hebûn bê xwedî nebû. Vaye ev hebûna xwediyê her tiştekî, bi xwe ruhê hebûnê xwezayî û zindî bûna wan bû. Di kevir de, di kulîlkekê de, di darê de yan jî di xirbeyekî xaniyekî de ew raza bi xwezayê re bibû yek! Nediaxifiya lê hîs dikir. Di esasê xwe de ya ku feylesof bû, civakîbûna Kurd ku dayika min jî yek ji wan kesayetiyan bû. Xwedanekî Periyê hebû, min ev hîs dikir. Her wiha min raza vê elementa esasî ku pê re bibû yek, weke xwedanê wê, weke tiştekî ji bo wê qebûl kir. Xwedanê wê ne mirov bû. Gerîla tenê derwêşek e. Herî zêde ji ava wê tasekê vedixwe û şikira xwe pê tîne. Ji bo ku êz wê hîs bikim min destê xwe da Periyê. Av, nerm û xweşik bû. Ji çaviyên laşê min bi hîsiyateke wisa sivik, xwe nîşanî min da û bersiva min da. Ev dihate maneya "meryabayekê", bersiveke bi êş bû. Periyê tevî ku şahidiya ewqas êş kiribû, bi salan herikîna xwe neterikandibû, min hinekê ew xemgîn dîtibû. Çavên wê bi xumam û hawîrdora wê mij û duman bû. Curbicur xweşikbûnên xwezayî hemû di qatê herî binî de ma.

Nedikariya bi rehetî biherike; nedikarî boşahiya xwe zêde bike, li gorî çar demsalan xwe biguhere. Ji ber ku derûdora wê hatibû girtin, pêşiya wê bi bendên çîmento hatibû lê kirin, coşa wê kêm bibû, nedikarî li gel xwe weke berê tovên jiyanê hilgire, nedikariya heya bi Mezopatamyayê li gorî dilê xwe biherike.

Em ji cem hevalên li Qir êvarê derketin. Tavê, sîberên me li pey me dirêjtir dikir. Dema em gihaştibûn hevalan, quryetiya Bedran qediyabû û dewrî hevalên ji Dêrsimê hatibûn kiribû. Şexmûs û Xebat, ji qadê Poxsê ji bo me bigirin zûka xwe amade kiribûn jî. Piştî ku hin hişyarî kirin û hin nuxte bi bîra me xistin, me jî li pey hev şiklê xwe yê meşê girt û dest bi meşê kir. Ji vê kêliyê bi şûnde dem bû ku em çavê xwe yê manewî jî vekin. Tenê nêrîneke li araziyê têra me nedikir. Dema çavekî me li hevalê/a pêş me bû, çavê me yê din lê bû ku dê arazî çawa şikil biguhere, arazî xwediyê şikleke çawa ye. Êdî demsala payizê bû. Bayên Îlonê hênikahiya xwe wenda kiribû. Şîlan li guliyên xwe sor sorî bibûn, karçik çêbibûn. Ew rêwitiyên min ên dema zarok bûm tevî zarokên gund ji bo karçikan , hate bîra min. Daxwezeke çi bi kêfxweşî yê erk û wezîfeyê bû. Her dîmena ku min lê dinêrî, ez dibirim nav bîranînan. Şivereyên zirav, nazik û bi xîz û zixur ku li seranserê newalên bi xumaxumê diherikîn berdewam dikirin em dibirin ser şivereyeke din. Rêwîtiyên şivereyan xweş in. Bi ser de jî ya ku wisa dûz û ne zêde asê be hê jî şêrîntir e. Darên berûyan li Qir û derûdora wê, dema xwe ya herî gihîştî jiyan dikirin. Ba, hin caran bi şiklekî dijwar dikeve nava gelî, berûyên li qiraxa newalê dest pê dikin bihêjin û zindî bin, ev, pel bi pel digihîşt heya bi li palên herî jor. Berûya ji bandora bayê xelas dibe dîsa vedigerî rewşa xwe ya berê ya aram û ji cihê xwe nediqeliqî. Berûyên li vê derê qederekê mezin bûn. Ji deviyeke asayî bibûn daristaneke mezin  û heval dinuxumandin. Sîvoriyan, ji nîmetên berûyan sûd werdigirt, ji şaxekî darê hilbazdidan şaxê din ê darê. Xêr û bêr hebû û kêfxweş bûn. Li beramberê van heywanên daristanê yên pir xweşik ku duvikên xwe yên bi xeml û xêz radikirin hewa, timî hezkirineke min a taybet hebûye. Gare tije sîvorî bû. Herêmên ku

ew lê dijîn hilneweşîbûn, di nav çerxekî xwezayî de jiyana xwe didomandin.

Sîvorî timî payizê bi komkirinê derbas dike. Berûyên ji şaxên darê diweşin bi awayekî baldar bi cih dike û di mercên zehmet ên zivistanê de zikê xwe têr dike. Hemû mehên havîn û payizê yên van heywanên xweşik bi komkirinê derbas dibû. Dostên herî nêzîk ên gerîla ne jî. Ti car ji hevalan xwe venaşêrin, xwe nadin aliyekî. Timî li ber çavan in. Wisa mercên xwe yên jiyanê diafirandin. Di mehên zivistanê ku jiyan dicemide, zindîbûn giran dibe de van heywanan bi aboriyeke wisa xwe derdixist biharê.

Piştî ku em çendek saetan meşiyan, li pêşberê me bi wê bejn û bala xwe ya bi heybet ku ber bi azmanê şîn ve bilind dibe, Sulbûz û Tarî weke cewiyan disekinin û weke ku kûrahiya bê dawî biqetîne serê xwe bilind dikirin. Ji Sulbûz wêdetir ji bo me hemûyan mijara meraqê bû. Bi hêrsa ku em kêliyekê ji beriya kêliyekê van her du cewiyan qut bikin û aliyê Dêrsimê bibînin em dimeşiyan. Ez û hevalê Nesimî di hemû mêşê de em li herî dawî dimeşîn. Di vê demê de bi qasî hevkariyeke kolektîf, derfet derket ku em hê zêdetir hev bibînin û nas bikin. Bi awayekî xwezayî hê zêdetir parvekirina me çêbû.

Dema şevê tarîtiya xwe kişî ser me kiribû û em dorpêç kiribûn, bi hemû tarîtiya xwe laşê me yê westiyayî dorpêç kiribû, moral, daxwaz û israra axifînê, bi hemû ferzkirina xwe li gel me dibû sedema sînerjiyekê. Dema laşê me di nava nediyariya şevê de bi pêş de diçû, li pêşberê demê nediwestiya, berevajî bi xwe ragiriyeke hê zêdetir em hildigirtin, ber bi xeyala bingehîn a meraqê ve hildigirt.

Li derûdora Sulbûz û Tarî malên bi kêça spî hatine boyaxirin ên ku belavela ne, bi hemû şewqa xwe ya çilmisî û şelo, di şeva tarî de xwe nîşanî me didan. Her çendî hewtîna kûçikan ji malên dûr, şev bixof dikir lê xweşikbûnek jî tevlî dikir. Li aliyekî zagona şevê xwe nîşan dida, bi pisporiya xwe ya araziyê ji cihên destdayî

gihandibû neqeba Sulbûzê jî. Xebatê ku bi çalakbûna xwe mirov jê dihasûdî, di nava çendek sal de awantaja li Bakurbûnê xweş bi kar anîbû, dîmena hevalekî serkeftî raber dikir. Li jora maleke spî, bi tena serê xwe û bi bêdengiya xwe munzewî bûye li cihekî destdayî em sekinîn. Me navberek dayê û dest pê kir em manzaraya Çewlîgê temaşe bikin. Kî dizane li heman cihî, di demên cûda de bi van hestên şirîk birçîbûna çavê xwe bi temaşekirina vê manzarayê têr kiriye û dibe ku araziya li pey me mayî, tê zanîn, tê dîtin û araziya li pêşberê me ya nayê zanîn bi meraq jiyaye û tevger kiriye.

Me xwêdanên li ser eniya xwe kom dibin paqij kirin. Me ji berîkên kelekê yên êlekên xwe ava xwe derxist û vexwar. Bi destûra hevalê Hogir weke em jî tevlî vê rewşa bêdeng, sar û bêkes bibin, me cixareyên xwe pêxistin.

Di navbera min û hevalê Nesîm de 5-6 metro hebûn. Min dema cixareya xwe di nava kefa xwe vedişart û wisa vedixwar, ji nişka ve bi min re meraqek peyda bû ku gelo hevalên ji par mane, niha li ku derê ne û rewşa wan çawa ye. Gelo me dê karîbûna hev bibînin? Pirsên di dilê min de tevlî tarîbûna şevê dibû. Gelo li ku derê bûn? Mînak, niha çi dikirin? Hevalê Berxwedan, Feîq û Şiyar li kîjan qadê tevlî xebatê dibûn? Ma îhtimal heye, ez ji bîr kiribim? Monologeke min a ji pirs û bersivên wisa pêk hatiye didomiya: ma çima ji bîr bikirana, ew sal par bû ev jî îsal e, tenê salek bûye, çawa çêbû?

Her çendî tarîbûna şevê ya ku çav çavan nabîne ji aliyê şewqa lerzok a malan vê dihate xerabkirin jî, dîsa jî li wan derûdoran pejna hêyva ku hêdî hêdî biçûk dibû nedihat. Ez ji xwe re hizirîm; xwaziya ji beriya demekê xwe nîşan bide da ku em ji vê şeva weke jahrê sûd bistînin. Doh hinekê baştir bû, gelo îşev li ku ma?

Hevalê Nesîmî weke li pey me dengek bihîstiye tevgeriya. Kêliyekê, berê xwe da pey me, wî aliyî û hemû bala xwe da ser.

Min jê pirsî, ma tiştek heye heval? Got, “Na, tenê dengek e, qontrol bikim baş dibe”.

Ji ber ku em qederekê ji gund û navçeyan dûr bûn bi me re fikara ewlekariyê hebû, ne diyar bû ka çi dibe çi nabe. Ji şensê re nehiştin ya herî rastir bû.

Dema hevalê Hogir rabû ser piyan, me hemû hevalan li pey hev di yek rêzê de çanteyên xwe yên ku di têvahiya rêyê de weke qut bikin milê me guvaştine bi neçariyeke ne kêfxweş, hinekê jî bi tevgereke nerm dan pişta xwe. Her çendî rabûna me ya li ser lingan westabûna me deşîfre bike jî, wî aliyê din ê Sulbûzê Dêrsim bû. Ev cihê ku me ta ji Zapê heya bi vê derê weke xuma xuma sîpeleke evînê hîs kiriyê, bêhna gulan, biriqîna aveke xweş, daristanên pir xweş ên berûyan, helezona xemgîniyê, berxwedêrî û peresgeha bêdengiyê bû, ji me gavekê dûr bû...

Bi parastina meşa xwe ya bi mesafe li pey Xebat, me tevî hevalê Şexmûs û Hogir li gorî meşê, xwe rêk û pêk kir. Hevalê Xebat dema navberê hin çavderiyên xwe yên li ser Dêrsimê yên hewce, hinekê bi zêdekirinê vegot ku xwestekên me yên kêfî nayên qebûlkirin. Armanca wî ew bû, van daxwazên me kêm bike û pêşniyarên me yên xwe avêtina erdê pûç bike.

Ev, rêbaza giştî ya quryeyan e. Hesabê ku kêliyekê ji beriya kêliyekê heval ‘kor û kulek’ bigihîne hêza giştî û ji vê berpirsiyariyê xwe xelas bike. Quryetî ne erkeke asayî ye. Ji xebatên herî zehmet yek jî li gel me grûbeke ketiye li ser rêyê gihandina hêzeke din yan jî gihandina qadeke din e. Ewqas jî heses û zehmet e. Ev, tiştekî weke şoreş kirinê giranbiha ye.

Weke ku lingên xwe hinekê amade bikin û peyamekê bidinê me ew şidandin da ku em karibin vê neqeba di ser me re qut bikin. Ji newala li rexê me şireşira avê dihat. Teht û şikêrên qerase ji dûr ve di nava tarîtiya şevê de weke biçin û bên, carekê wenda dibûn, carekê derdiketin. Reşahiya wan ew vedişartin û weke neyên

naskirin li wan dikirin. Ji şeva bi ba ya doh nîşanek jî tine bû. Dinya çîksayî bû. Piştî meşeke bi çend saetan me xwe gihandê.

Vaye, rawestgeha dawî ya di navbera araf û înada xwe gihandina jiyanê de! Mirov bi ber bayê, şabûna mirovên destpêkê ku dema giyayekî xwarinê didîtin dikeve. Westabûna me weke nefesa xwe bide derve, ji me dûr ket û çû. Em bi bezînê ber bi Poxsê ve daketin. Xebat demekê em meşandin. Dema em hatin cihekî destdayî gihaşt wê qeneatê em li vê derê bimînin. Di encamê de yê xwediyê înisiyatîf ew bû. Baştir arazî dizanî. Di tariya şevê de gelî hê zêde nexuya dibin. Wisa xuya dibe tu dibêjî tarîbûn bi hemû westana xwe tije geliyan dibe. Ji ber vê yekê di şevên payizê de gelî timî bi rewşa xwe ya kûr û asê xapînok in.

Me bi rewşa xwe ya westiyayî ji bo biavêjin ser xwe ji çanteyên xwe baraniyên xwe derxistin. Ji ber ku hê laşê me germ bû hênikahiya şevê zêde bandor li me nekir. Diviya bû ji beriya sohbet bikemile em razabana da ku sibeyê mirov derûdora xwe bibîne. Xebat li gel yek du hevalan li ser araziyê, hevalan û hwd ketin nava sohbetekê. Bi rehetiya zanîna cihê em ê biçinê diaxifiya. Derûdora me ya ku ji bo me hê meraq û nediyariyek bû, dê bi derketina tavê re xuya bibûna. Cixarêyên me yên ku me di kefa destê xwe de hêdî hêdî dikişand, dema ber bi dawiyê ve dihatin, ji bo ku lêven me neşewitîne me temirand. Me qotikên cixarê kûr binerd kir. Bi piranî em vê timî dikin. Zagonek ku ji aliyê berpirsiyariyên jiyanê ve hatiye afirandin e. Çanda qotik û gelaş îmhakirin yan jî veşartinê, qamûflekirinê!

Westabûn ewqas li pêş bû dema min serê xwe daniye ez wisa jî razame. Li gel Serhed û Nesîmî, me pişta xwe da hev û ji têhna hev sûd wergirt. Hin hevalan çanteyên xwe bi awayekî xwazayî kiribûn balgîf, hin hevalan jî êlekên ser xwe kiribûn çend qat dabûn bin serê xwe.

Her ku deqîqe bi pêş diketin di ber xewê re xiriniya hevalan û ji kûr ve nefes stendin zêde bûn. Bawer dikim hevalê Xebat fedakarî

kiribû û heya bi berbangê nobed girtibû. Dema tav sorsorî bû hevalê Xebat em şiyar kirin. Bi giraniya xewê, bi çavên biyanî ewirên me yên destpêkê, bi kêfxweşiya gihaştina Dêrsimê me derûdora xwe temaşe kir. Darên xwe avêtibûn sîbera darên hê mezintir, xirbeyên xaniyan, newalên ava wan xuya nabe. Li pêşberê me dîmeneke bi xumam hebû. Mirov di demên wisa de dixwaze çavên xwe kêliyekê ji beriya kêliyekê fêr bike da ku karibe li gel hawîrdorê hev nas bike.

Cihê ku em şevê di xewê re çûbûn, jora gelî bû. Hevalê Xebat û Şêxmûs em bi zanebûn wê şevê danexistibûn jêr. Biryareke pir rast girtibûn. Geliyê Poxs ku ber bi jêr ve asêtir dibe, bûna xwe ya ji bo gerîla cih û war deyndarê vê asêbûn û heybeta xwe bû. Vê jî hem dihişt em araziyê bibînin û hem jî ji pirsgirêkeke weke asêmayina li araziyê xelas bibin. Poxs kûrahiyeke bi xumam bû. Bayê wê weke ku mirov vexwîne tê. Rojê bilez dest pê dikir. Li cihên herî dûr ên asoyan, li sirtên pêşberê me daristana ku zelal dibû û şikêran bawerî dida, bala me dikişand. Refên balindeyan, hêdî hêdî diketin tevgerê. Jiyan ji nû ve zindî dibû, zixurên ji bin lingên me dişemitîn ta diçûn li gelî disekinîn.

Hevalê Xebat, heya ku em gihandin cihê ku ew jê re dibêje, “nuxteya bûzdolabiyê” ku ji bihuştê parçeyek bû, ne sekinî û ne jî cih ji me re got. Ji beriya ku saet bibe heşt di hênikahiya sibeyê de tevger kirin hem baş e û hem jî li beramberê operasyoneke îhtimal tedbîrek bû.

Newala Poxsê ji aliyê rojava ber bi aliyê rojhilat ve diherike. Lê ber bi jêr xaromaro dibe berê xwe diguhere başûrê rojava û li gel Periyê hev dibînin. Sedema herîkîna wê ya bi lez xuya dibû. Hawîrdora gelî bi xirbeyên malên gund, bi zimanê xwe yê lalbûyî dişibiya peresgehekê; qampên me yên salên 1991-93’an jî hê li beramberê şert û mercên xwezayê li ber xwe didan û şiklên xwe yên destpêkê diparastin. Li derûdora wê zêde hebûna tenekeyên qonserveyên leşkerên dijmin, dihate maneyê ku di her hatina xwe de dijmin bi misogerî seriyekî li vê derê dide. Hevalê Şexmûs got

ku ev der cihekî deşîfre ye. Jixwe heval cihekî du caran bi kar naynin. Ji derveyê îstîsnayan bi qasî ji dest bê alternatîf girîng e. Her ku tav bilind bû, şensa me ya hê bi hûrgulî dîtina araziyê bi pêş ket. Gelî ji destpêkê heya bi dawiyê tije ji darên guzê bû, cih bi cih darên çinaran yan jî darên reş, curekî beruyan ji wan re hevaltî dikirin, ya din jî xwendina balindeyên cur bi cur li gel vê dîmenê dibû melodî. Dêrsim bi bedewiya xwe ya bê hempa xewnek e. Hawîrdor bi tîrejên rojê zer bibû, xweza bi hemû pîrozbûna xwe rabibû ser piyan, rabibû xwepêşandanê.

Em hêdî hêdî ji gelî derketin ber bi palê ve, ber bi nuxteya li jor hilkiştin. Hevalê Firat em pêşwazî kirin. Bi wê bejn û bala xwe ya dirêj û zirav ku timî kenê xwe yê jê re bibû îafadeya serçavan. Me merhaba da hev û du, bi xêrhatin li hev kir. Yek-du rojan me bêhna xwe vekir. Di hênikahiya xweşikbûna wê ya bi heybet de, ji hêlîna teyr û bazan, ji vî cihê ku li gel mirov hezkirineke ruhî diafirîne em bi roj derketin. Ber bi geliyê Harçikê ve em meşiyan. Di seranserê rêyê de xweşikbûna bê hempa ya xwezayê nedikariya xwe veşêre. Her awirek hev naskirinek bû. Dibû sedema meraqê.

Arazî ji dişibe civakê, eger tu baş nas nekî tu nikarî baş xwe bi xwedî bikî û nikarî baş bijî. ‘Dokuz Kaya’ li Dêrsimê li gel têkoşîna gerîla yek bûye. Bi fetlên xwe yên asê û dirêj wehayeke pir mezin e. Newala wê ya pir mezin bi demê re gelî firehtir kiribû. Palên aliyê bakûr tev daristan in. Aliyê başûr tehtên asê û dijwar in. Mirov nikare bi hêsanî lê tevger bike. Weke cih, cepheyê paş e. Lê ji bo parastin û pêdiviyên din nîmeteke pir mezin e. Nîvenga gelî xirbeyên gund e. Cîhên ku yan hilweşîne yan jî ji ber koçber kirina bi darê zore wêrane bûne. Komên ewran ber bi Pulurê di ser gelî re diherikin. Tava ku li paş ewran maye, dema ewr vedikişin enerjiya xwe ya kom dibe dişîne ser me.

Ta li aliyê Zel başîqek bi sekna xwe ya bê tevger a li azman xwe pêşan dide. Paşê teyr û bazek wê seknê têkdibe. Bi dengê xwe yê zirav qamyonêk ji Pulurê bi rê ketiye, ber bi navenda Dêrsimê tê.

Her ku nêzîk dibe li ber çavên me leztir dibe. Piştî bi demekê ji ber astengiyan wisa lê tê, êdî ne gengaz e em derûdora xwe bibînin. Ji ber sedema ku gelî bi fetl in mirov nikare bi xweşikî hemûyê bibîne. Hewce ye mirov derkeve cihekî bilind. Bi awayekî herî xweşik dikare panoromaya Dêrsimê bi vî awayî bê têmaşekirin. Nexwe, ne mumkûn e kûrbûna geliyan wê şensê nade.

Em weke grûb kêfxweş in. Şabûna me di serçavên me re diyar e. Zehmet bû, me asetengî û eczî dîtin. Lê belê em hatin herêma xêyalên xwe. Û hemû ecziyên me bêwate dimînin. Ya esas e hebûna me ya fîzî ya li vê derê bû. Herî dawiyê ew jî pêk hat. Ya din tevlîheviyeke demî ye. Me bi saxlemî xwe gihandê, ev gelek tişt e. Quryeyan em birin nuxteya hevalê Sebrî ku li Harçikê bû. Ez dikarim bêjim nuxteya dawî ya rêwîtiya me ye. Ecziya pêvajoya rê qediya. Ji vê bi şûnde em ê li ser cihên xwe yên nû belav bin. Qadên em ê biçinê yên nû, herêmên ku fermandariya me ya qada Dêrsimê di navbera xwe de diyar kirî ye. Jixwe ev jî tiştekî baş e. Ji ber ku hevalê par ji bo amadekariya hemleyê hatine dibe ku li wê derê bin.

Min li gel hevalê Wedat ku hêza biryargehê bû dest bi sohbetê kir. Min jê pirsî ku hevalê Berxwedan, Botan, Feîq, Şiyar li ku derê ne. Hevalê Wedat got, “tevî ku ez jê ne piştrast im hêzên 2003’yan bi piranî li qada Rojavayê Dêrsimê ne. Li Rojhilat jî bi piranî hevalên îsal hatine hene”. Li gorî wî gotiye, hevalên din jî hevalên ji 2000’î û 2003’yan pêve li eyaletê bûn e. Tenê Piling li biryargehê bû. Hevalên din ne diyar bûn.

Hevalê Wedat xwe heyranê Rojhilata Dêrsimê dihesiband. Tevî ku zêde ne kevin bû di demeke zû de adepte bûyibû. Hesta wî ya aîdbûnê temam bû. Qadên weke Kutu Dere, Harçik, Poxs, Dokuz Kaya, Daxbek, Kizil Kayalar, Şehîd Ferhad, Heyderan li ber çavên hevalê Wedat weke kelheyan bûn. Di cewhera xwe de xwediyê hêzeke rakişîner bûn. Asê bûn, zehmet bûn, diparastin. Ji ber vê yekê berdêla hezkirina mirov didan. Pêve nehatina girêdan,

bi xwezayê re adepte nebûyin ne gengaz bû. Dema wê ye ku mirov rastiyekê aşkere bike; weke hevalê Wedat ji me gelek bi ’hezkirineke diyar’ hatibûn Dêrsimê. Xweşikbûnên xwezayî ku me dîtine ji ber vê hezkirina xwe ya pêş, bêyî ku em li pîvanan bidin, me wisa qebûl kir. Tinebûna rastiyeke demografîk a bi xweşikbûna arazî û xwezayê re, di destpêkê de ji bo me zêde ne girîng bû. Jixwe me dê çima bida pêşberê hev, li pêşberê me heqîqatek hebû, ji welatê weke bihûşt parçeyek!

Hevalê Wedat li Dêrsimê doxtorê me bû. Ne wisa dibistanên tibê qedandibûn. Di dewreyên perwerdê yên gerîla de dewreyek pêvek dîtibû. Bi zeka û kêrhatina xwe hevalekî ku di mijarên bingehîn ên weke alikariya destpêkê, aşî, derman dayinê de qederekê serkeftî bû. Di jiyanê de kesekî fedakar, xwediyê zimanekî esprîtuel û ji şêkenandina hevalan xwe dida aliyekî bû. Xwezayîbûn û xwerûbûn û safitiya wî di dilê mirov de li hemberê wî bi xwe hîsek diafirand. Hevalê Wedat ku xwediyê karektereke xweser bû, hevalekî Kirmanc ê ji Xinisê bû. Di sala 1999’an de ji Îzmîrê tevlî rêfên azadiye bibû. Di sala 2000’î de di encama qezayekê de birîndar bibû. Weke îfadeya girêdana bi Rêbertiyê re di sala 2003’yan de derbasî Dêrsimê bibû. Qadên destpêkê dîtibû ev der bûn. Li van herêmên destpêkê dîtiye li Rojhilatê Dêrsimê li ser erdên jê hez dikir gihaşt şehadetê. Geliyê Harçik ji bo wî azweriyek bû.

Hevalê Wedat heya bi sala 2008’an li Cebheyê Rojhilat ma. Heya ku di sala 2008’an de tevî heşt hevalên xwe tevlî karwanê şehîdan bû li Cebheyê Rojhilat bû. Heyranê heybeta Harçik, Dokuz Kaya, Hingirvan, Şehîd Ferhad bû û wisa jiyan kir. Timî li rojhilat pratîka xwe domand. Wisa jî gihaşt hetahetayiyê. Tevî şehîdên me yên mezin ên weke Dijwar, Firat, Savaş, Faraşîn Viyan, Agir, Azad, Kemal, Sîpan, Helîn ji vê cîhana madî veqetî. Ew ê bi van taybetmendiyên xwe timî bi mînet bê bibîranîn.

Di encama vesaziya nû ya sala 2004’an li biryargehê hatiye kirin de em hatin herêma xwe ya nû. Hevalê Wedat li Heyderan ma.

Heyderan di heman demê de eşîreke qedîm a Dêrsimê ye. Di operasyona nijadkujiyê ya Dêrsimê ya 1938'an de yek ji eşîrên herî berxwedêr e. Dema ku têkoşîna me îvmeyek qezenc kir, di encama hatin şewitandina gundan, polîtîkayên bi darê zorê dan koçberkirinê, nijadkujiya ekonomîk de, ji gel hatiye paqijkirin, weke goristaneke bêdeng be lê hatiye. Lê hevalan bi jiyana xwe îsbat kirin ku li vê erdnîgariyê jiyana civakî berdewam dike.

Min ew zivistana li cihekî nû, li gel hevalên nû derbas kir. Ji ber nû hatina qadê germahiyeke diyar hebû. Di seranserê zivistanê de me ji bo biharê amadekariyên xwe kirin.

Di pêvajoyê heman salê de hevalê Feîq û hevalên din li Pûlûrê bi cih bibûn. Hevalê Botan û Berxwedan jî di nav heman hêzê de bû. Hevalê Berxwedan li aliyê Pûlur mohra xwe li çalakiyên serketî û encamgir dabû. Ev bibû sedem ku baweriya wî bi xwe zêde be. Bi xwe bawer dikir û baweriya hevalên li derûdorê qezenc dikir. Hevalên wî ji tevlîbûna wî razî bûn. Bibû stûna wê qadê. Ji ber ku Hemleya 1'ê Hezîranê bi awayekî bi hêz pêşwazî kirin, dijmin timî xwest derbeyekê li vê hêzê bide. Diviyabû ev qad bihata tasfiyekirin. Pratîka Pûlur a 2003-2004'an Dêrsim derxistibû rastê. Hemû pêdiviyên pratîkê pêşwazî dikir. Ji ber vê yekê bal kişand.

Di Gulana 2005'an de hevalê Orhan û neh hevalên din di kemînekê de şehîd bûn. Ev kemîna bêbext bi qasî ku ji bo Dêrsimê bû wendahiyeke mezin ji bo giştiyê têkoşîna me jî bû wendahiyeke mezin.

Di bihara 2005'an de di encama vesaziyeke li Uzuntarlayê hatiye kirin de derfet peyda bû ku ez li gel hêza biryargehê tevbigerim. Ji ber ku me di giştiyê Dêrsimê de terzeke bi tevger esas digirt derfet çêbûn ku ez gelek herêman bibînim. Yek ji wan jî qadên girêdayî Cepheya Rojava bû.

Di Gulana 2005'an de li Geliyê Kahperî, di daristaneke weke bihuştê de ku xweşikbûneke xwezayî ya bêhempa bû me bi hevalan re hev dît. Li biryargeha Rojava ya hevalê Şehîd Ferhad Amed hejmara me qederekê zêde bû. Dema li gel hevalê Botan me hev dît, bertaka wî ya destpêkê, bawer nekirin bû. Bûka çavê wî dikeniya. Got, "di dawiyê de hûn hatin ha, yanî we da ser şopa me". Min got, belê bi temamî weke te ye. Dizanî heya bi roja dawî em bi hev re bûn. Lê belê di encama ku hejmara grubê hate kêmkirin de hûn hatin. Em jî piştî salekê bi rê ketin. Hevalê Botan got, "Were, em biçin gel hêvalan". Min got, kî heye? Hevalê Botan: "eger tu karibî texmîn bikî ez ê ji te re bêjim her bijî." Min got, heval ez çawa bizanibim. Hê hizireke min tine ku kî li kuderê ye. Di mêjiyê min de namîne. Hevalê Botan li ser zêde kir; "hevalê Feîq ji bo karekî li derve ye, lê Agir li vê derê ye. Dê em biçin mangeya me".

Min da pey hevalê me yê çavşîn. Cihê biryargeh lê bû, cihekî pir baş ê ji aliyê daristana derberûyan ve hatibû nuxumandin bû, hema bêje tavê lê nedida. Em hatin di nav daristana tebeqeyeke zirav, li hin cihan bi giya hatiye nuxumandin, cihê mangayên hevalê Botan lê dima li palê ku deh metro ji newalê dûr bû. Agir xwe dirêj kiribû, radyo guhdar dikir. Dema ez dîtim bertkeke asayî nîşan da. Ji cihê lê xwe dirêj kiribû rabû û hate gel min. Me merhaba da hev, hev ramûsand û hev hemêz kir. Bawer im ji ber bandora qadên Bakur û rêwitiyê, Agir nikaribû wê germahiya xwe ya li Gareyê biparêze. Min, Agir bi awayekî pir westayî dît.

Em demekê rûniştin û me xweş sohbet kir. Behsa rêwitiyan kir. Me behsa zehmetiyên tên kişandin û şêrînbûna qada me xwe gihandiyê kir. Hevalê Botan ji hatina xwe pêde li Pûlurê bû. Got ku ew ji wê derê hez dike û wê demekê li vê derê tevlî pratîkê bibe.

Botan ji Başur bi xwesteka xwe hatibû. Min fêm kir ku di pratîkê de qederekê xwediyê hewldan e. Di jiyana xwe de cara yekemîn li Bakur dima. Qet ji Pûlurê derneket. Heya bi şehdeta xwe li Pûlurê

tevlî pratîkê bû. Li gel hevalê Faîq hatibûn, rêwitiyên dûr û dirêj bi hev re borandibûn. Di navbera wan de girêdanên pir xurt ava bibûn.

Ji aliyekî ve roj derbas dibûn, rojekê ji rojan hevalê Feîq û tevî grûbeke heval hat. Destpêkê me hev bi ewiran di ber çavan re derbas kir. Paşê hevalê Feîq dest bi ken kir û got, “Hûn di dawiyê de hatin”. Me, xwe li hev aland, hev hemêz kir. Westayî bû, ji ber ku qederekê meşiyayî bû. Hinekê bêhna xwe stend. Piştî kêliyekê dê Ferhad ji bo tekmîlê bihata. Em li mangayekê kom bûn hinekê em li rex hev rûniştin. Hevalê Botan hejên hişk ên beruyê kom kir. Me bi alîkariya hevalan agirekî wisa yê asayî dada. Dema germahiya havînê dest pê dike, bi piranî derûdora agir li gorî payizê vala dimîne.

Hevalê Feîq êlek û rextê xwe derxist. Dixwest şutika xwe derxe û aliyên xwêdan dayî yên laşê xwe zuwa bike. Hevalên din jî em ji bo xwe ji germahiya sotinêner a agir biparêzin belavî derûdorê bûn, me dest pê kiribû rengê sorsorî yê agir temaşe bikin. Awirên me li ser agir û pêtên dijwar hev didîtin.

Hevalan çaydanekî bi darekî dirêj ê berûyê ve hatiye kirin li ser agir digirtin. Hevalê Botan bi baldarî bi agir re mijûl dibû. Bi darikekî xistiye destê xwe timî pê re mijûl dibû ku qetên ji agir dipekin dubare bi awayekî herî guncaw bi cih bike. Bi vî awayî rê li ber dumankirina agir dihate girtin. Di vê navberê de hevalê Feîq xwe zuwa kiribû. Çaydanê dikele hate demkirin. Hevalê Botan hem dipirsî û hem jî xwe mijûl dikir. Dema sotîneriya agir kêm bû em li derûdorê hê zêde kom bûn. Çember teng dibû. Biharê, bi şînbûna xwezayê re ji ber giyayên şîn êrîşeke pir giran a pêşiyan pêk tê. Ji van zindiyan xwe parastin pir zehmet e. Tiştê hewce ye mirov bike zêde zêde duman e. Lê ew jî ji bo me qet ne bi xêr e. Me hemûyan çiqek ji darekê vekiriye û bi hejandinê em hewl didin vê êrîşê bişkînin. Lê mixabin, pêşî dema firsendê peyda dikin ji her aliyê ve êriş dikin. Bi taybetî zendên hilkirî ji xwe re

dikin hedef. Ji ber vê yekê neçar bû zendên mirov di demên herî germ ên rojê de jî girtî bimînin.

Hevalê Feîq hinekê xwest behsa pêvajoya rê bike. Tevî her tiştî baş derbas bibû. Lê ji ber ku dereng ji Başur derketibûn zêde lezandibûn. Di nîvenga meha Mijdare de xwe gihandibûn Dêrsimê. Di vê pêvajoyê de pir zehmetî kişandibûn. Ya din jî bûyerên rojên destpêkê û paşê li ser sînor qewimîbûn, di nav hevalan de bibû sedema bêmoraliyê. Bandorên vê ta heya bi wê rojê dihatin. Çavdêriyên xwe yên di seranserê reyê de parve kirin û ji me pirsî.

Min bi giştî kurt û cewherî vegot. Min got, ya me jî baş derbas bû. Bi rastî jî ji derveyê hin nerehetiyên biçûk, ez dikarim bêjim bê kêmasî derbas bû. Ji ber ku wê demê hê çavdêriyên min ên rêwitiyê nû bûn, min zêde zêde li gel hevalan parve kir. Me rojên borî bi bîr anîn. Min, hevalê Feîq di asta dawî de xwediyê moral û azwerî dît. Baweriya wî ya bi xwe û daxwaza wî ya pratîzebûnê pir zindî bû. Bêyî ku em li havîna 2003’yan asê bimînin me li ser hin rewşan nîqaş kir. Em her du heval jî bi hesesiyet tevgeriyan da ku wan rojen nekin rojev. Bêyî ku em di sîbera dema borî de bimînin û mehçubiyetekê nîşan bidin, di pêşerojê de ji bo ku li dijî hedefê bi hev re têbikoşin me nîqaşeke pozîtîf meşand.

Hemû pratîka salê xurt derbas bû... Roj û mehan da pey hev. Jiyanê weke herikîna çemekê ji xwe re aliyek diyar kir û bi vedana geliyan her meşiya. Dem kemilî, ked sift bû, êş û wendahî zêde bûn. Berpirsiyarî mezin bûn. Hevalê Feîq jî yek ji van hevalên ji vê berpirsiyariyê para xwe stendî bû. Roj, rojên hê zêde bar rakirinê bûn. Diviyabû înisiyatîf berfireh bibûya. Tecrûbeya ku li Dêrsimê di dema derbas bûye de li ser hev kom bûye dê niha di asteke hê jortir a rêveberiyê de bihata rêkûpêkirin.

Di sala 2006’an de berpirsiyariya hevalê Feîq heya bi berpirsiyariya qada Pûlurê mezin bû. Hevalê Feîq di payiza 2006’an de xwediyê îdîayeke mezin bû ku ji bo pratîka qadê

binke amadekirinê temam bike, bi awayekî bihêz bikeve sala bê. Hevalên li derûdora wî kom bibûn jî hevalên ciwan, dînamîk, tije bi daxwaza pratîzebûnê bûn. Payiza heman salê ji bo hêza Pûlurê serketî derbas bû. Bêyî ku wendahî bidin û ti nîşaneyên deşîfrasyonê derkevin holê binkeyên xwe amede kirin û bi cih bûn.

Xebatên kampê yên mehên zivistana 2007'an erênî derbas bibûn. Paraznameyên Rêbertiyê hatibû xwendin û bi fedakarî hatibûn nîqaşkirin. Her hevalê/î jiyana zivistanê û dewreyê perwerdeyê weke dema daneheva îdeolojîk û rexnedana pratîk lê kiribû, di jiyanê de komînalîte hatibû pêkanîn. Hêz bi îdîayeke mezin derketibû biharê, ji bo ku şaşiyên salên borî sererast bike û li ser qadê serweriya xwe pêk bîne, xwe gihandibû asta biryardariyê. Tev bi hêvî, dilê wan tije ji kînê derketibûn bihara Pûlurê.

Êm di meha Nîsanê de bûn, tavê xwe germ dikir. Axê germahiya rojê dimêt û di nava xwe de dikir can, çerxa diyalektîkê dizivirand. Êdî sermaya zivistanê li hemberê tavê têkçûbû, binketina xwe ya ji Newrozê bi şûnde qebûl kiribû. Henikaya biharê bi lez bilind dibû. Gihayên şîn dibûn bi rewşa xwe ya lez dikirin, ji nava pelên zuwa yên giran serê xwe radikirin û hewl didan nefesê bistînin. Bişgokên binevşan, di binê pel û qirş û hejikan bi daxwaza kêliyekê ji beriya kêliyekê teqînê werimîbûn. Ji ber herikîna Cehenem Deresî dengê xumaxumê dihat, yên ku nedizanîn digotin qey çemek e. Bi nêzîkbûna payizê refên balindeyan ku koç kiribûn dîsa vegerîbûn, bi xwendina xwe ya xweşik çerxa jiyanê silav dikirin. Daristanên berûyan ên bê pel bi ser xwe ve hatibûn, dengê halindeyan jî tevlî vê zindîbûnê bibûn.

Komên mezin ê berfa ku ji zivistanê maye, di newlan de , li palên çiyayên bilind, di çalan de, di her cihê tav nikare xwe bigihînê de, li her cihê çep û çal hebûna xwe didomand. Keviyên newalan, derûdora şivereyên avî ji mêjve teslîmê qulîlkên sor, mor û zer bibûn. Binevşan, li cihên zuwa yên daristanan bi wê xweşikiya xwe ya mor, li ber wî bayê biharê yê hênik, sivik û nerm xwe

dihejikandin. Lez û beza jiyanê zivirîbû qadeke xweşik a fuare, xwezayê xweşikbûna xwe pêşan dida. Tu dibêji qey xwezayê xwe dida naskirin. Refeke balindeyan bi tevgera xwe ya giran ji aliyê Çemîşgezek ber bi aliyê rojhilatê bakur ve difiriya jêra Şeytan Ûçgenî seransera newalê ji ber hilma avê xumam xuya dikir.

Hevalê Feîq û grûba hevalên li gel wî ji kampa xwe ya zivistanê derketibûn, ji bo nuxteya biharê li cihêkî guncaw geriyabûn û li cihê jê re dibêjin Cehenem Deresî sekinîbûn. Ev der hema biniya gundê X e. Ava ji vî gundî tê, bi tevlîbûna avên derûdorê dibe newaleke mezin. Wî geliyî weke kalyoneke kûr be lê dike. Ber bi jêr ve hem mêyla newalê û hem jî herikîna avê dijwar dibe. Gelî kûr dibe. Palên wê dibin şikêrên asê. Mercên parastina xwezayî diafirînin. Ev newal hê li xwarê bi ava ku jê re dibêjin Şeytan Uçgenî û bi ava ji newala Kahperî-Emîrganê tê ve dibe yek, li hê jêrtir li nêzîkî qereqola Amûtka, Çema Tahar pêk tîne. Ev av Alî Bogazi qut dike di seransera Çemîşgezekê de diherike û li Kebanê tevli Firatê dibe.

Li Dêrsimê herîkîna avê timî li pey xwe dewsekê, bandorekê dihêle. Her avê teqez ji xwe re rêyek vekiriye di pey wê re gelî jî

vedaye. Geliyên çêbûne bi piranaî şiker û asê ne. Bi daristanên kêm dar û şînatî, lê hejmara wan zêde hatine xemilandin.

Ev awayê ku xwezayê ji xwe re diyar kiriye, ji bo gerîla mewziyeke xwezayî ye. Mirov nikare ji her cihî ve bikeve geliyên wê. Asta asê mayina li araziyê mezin e. Ya rast e ew e ku mirov wê baş nas bike, rewşa wê ya xwezayî bipejirîne û di nav de bijî. Gerîla awayê bûyê mirov ê xwezayê ye. Bêyî ku wê biêşine, bi naskirina zarokên wê diji. Xweza ji bo gerîla timî azmûnek e. Hin caran jî nikare biparêze. Dibe ku rewşên wisa ji bo mirov bi êş bin.

Hêza Pûlurê, di cihê xwe de, ji ber baweriya xwe ya bi Cehenem Deresî mewzî girtibû, hewl dida rewşa bê qamûflaj a biharê

derbas bikê. Hê daristan rût û tazî bûn, pelçimên wan tine bû. Pirsgirêka qamûfle astengeke cidî bû. Barana ku pirî car dibare her çendî li ber veşartina hevalan nebe asteng jî, dibû sedema derketina dewsê û pirgirêka agir pêxistinê. Ji ber vê yekê bi baldarîbûn hewce dikir, bê guman vala vala deşîfrebûyin, dibe ku di van rojên destpêkê yên biharê de bibe sedema wendahiyên ku hemû hêza eyaletê demoralize bike. Dijimin ji ber ku di mehên biharê de terza tevgera gerîla texmîn dikir, rewşa xwe di ber çavan re derbas dikir. Ji aliyê psîkolojik ve rehetiya ku di hemû zivistanê de jiyaye, bi biharê re ji fikara ku dê gelo gerîla çi bike re dihêle, ev jî dibe sedem ku hin tedbîran werbigire. Yek ji van jî ewlekariya cihê ew lê dimînin pêk anîn, çarçoveya tevgera xwe teng kirin û ya din jî operasyonên li qadên ku ji sala din ve deşîfre bûne ku karibe di mehên biharê de bên bikaranîn bên li darxistin e.

Di van operasyonan de hedef ev e: lêhûrbûna zivistanê ya gerîla ku bi biharê re veguhere aktîvîteyê astenkirin, derbe lêdan, demoralîze kirin û astemgkirina bi ser xwe ve hatina hêza gerîla ya qada mijara axaftinê ye.

Li erdnîgariya Kurdistanê araziya xurt tê vê maneyê: bawerî, stargeh-cih û kelhe. Ji ber ku awantaja teknîkî li beramberê vê asêbûn û parastina xwezayê bêçara ye. Tenê erdnîgariyê têrê dikir ku teknikê bê bandor bike.

Kahperî û derûdora wê ji aliyekî vê rûyê germ ê biharê yê weke bihuştê jiyan dikir, ji aliyê din ve ji ber veneşartina zarokên xwe yên ku îhtimal heye di oprasyonek ku derkeve de zererê bibînin fikar dikir. Vedîciqî û fikarên wê hebûn. Gelî nehatibû wê rewşê ku bi dar û daristan û şînatayên xwe yanî bi qamûflaja xwe êrîşekê bê bandor bike. Kahperî xemgîn bû, ker û parçe ji xwe vedikirin. Bayê biharê ku ji aliyê Amûtkayê ve bi awayekî dijwar dihat, li tepeyê Karaoglan û Sari Saltik dubarê vedigrerî û dihate hawara Kahperiya ku bi êş, bêxem û li benda tiştekî bû.

Bayê di ser bişgokên berûyan de diqewisand, stuyê binevşan carekê rast dibû, carekê ditewî, dar û daristan û giya şerê serwerbûnê dimêşand. Dikarîbû bi hê zêde tav û bi hê zêde ba, dar û daristan û giyayê ku gerîla veşêre pêk bîne. Kahperiyê psîkolojiya xwe ya bêxem bi çarenûsa xwe ve girêdida û ji ber vê yekê bêdeng bû.

Botan bi çavên xwe yên şîn ku azmanên bêdawî jê bihesûdin, dîsa weke her tim dixwest ji bo şîva hevalên xwe kereng, sîrik, soryaz û eger karibe peyda bike hinek tirşik, hinek rêbaz û kîvark kom bike û wisa bizivire. Fedakar bû, kedkar bû. Botan dişibiya Dîcleya bêdeng. Gotinên xwe hemû bi pratîka xwe nîşan dida. Rewşa bûye mirov a duristiyê bû.

Li gel xwe kîsekî naylon hildigirt. Ji bo ku dîmena wî ya spî veşêre, bi kêfyeya xwe ya rengê wê ber bi kesk ve ku ji ber bi kar anînê kevn bûye nuxumandibû. Kîsê dirêj nîvenîv tije bibû. Her çendî ji xwarbûn û rastbûnê pişta wî biêşe jî gerîla navê israrê bû. Xwe jê neda aliyekî. Xwest hinekê zêdetir, hinekê zêdetir ji van nîmetên biharê sûd werbigire. Ji hevalan re dê xwarineke bigiya ya xweş çêbikira. Hem giya kom dikir û hem jî difikirî: “Ez ê îsal li vê Pûlurê ji bo hevalê Feîq çi bikim çi nekim, bila dijmin di xema wê de be”...

Gavekê her çendî xwest bikene jî di cih de plana kişfê ya ji par nîvçe mayî hat bîra wî. Kelecana wî hê jî zêde bû. Destê wî bi lêz giya diçinî. Tam jî di wê kêliyê de hineke ji kûr ve weke ku dengê skorskiyekê bihîst. Hinekê xwe rast kir. Bi çavên xwe yên şîn ewirên xwe berda kûrahiyên bi xumam ên asoyê. Nefesa xwe girt. Bi vî awayî dikarîbû baştir bibihîze. Dikarîbû navekî li tiştê difire bike, tevgera hewayî fêm bike. Hizireke bi vî awayî di mêjiyê wî re derbas bû; “îhtimal heye ku hevalên li nuxteyê nebihîstibin”.

Bêyî ku xwe biqeliqîne guhdar kir. Hinekê bi fikar bû lê çeka wî hema li wî aliyê wî bû. Gelo nobedarê nuxteyê hebû? Fikirî ku eger hinekê tepe rût bin jî, gelî saxlem e. Hin caran deng gûr û gêş

dibû, hin caran jî qut dibû. Her çendî bi hatina bayê ve girêda jî mêjiyê wî bû areneya senaryoyên nexweşik; di ber xwe re axifî û got, "qet ne dema pêşwazîkirina operasyonekê ye". Çendek roj derbas bibûna paşê xweza kesk û şîn bibûya vaye wê demê..." Êdî deng weke destpêkê nedihat. Got, "dibe ku tevgera rûtîn a hewayî be". Xwest ber dilê xwe xweş bike. Monologa xwe ya bi xwe re domand, "bila tiştek neqewime da ku ez sibeyê ji vî giyayî xwarineke xweş çêbikim. Jixwe mitfeqçî me". Di wê kêliyê de dilê wî ye ku xweş lê dida vegerî rewşa xwe asayî. Ewrekî, dîmena tavê girt. Hinekê ji wî wêdetir balindeyekê ji bo nêçîra kêzikekê be tevger sekinîbû û ew dişopand, moriyekê, tevî ku her carê jê diket hewldana xwe bi kevirekî ve hilkiştinê bi israr didomand.

Botan dema dît kîsê wî tije bûye, bi tevgerên çalak bi lêz xwe komî ser hev kir. Got, "bûye dereng, eger hineke din xwe mijûl bikim ez ê dereng bimînim, jixwe saeta tekmîlê ye" û rabû ser xwe, çeka xwe ya hinekê li wî aliyî bû girt. Dubare hizira wî çû ser wî dengê pir kêm dihat ku skorsky dianî bîra mirov. Gelo dibe ku dijmin leşkerên xwe daxe? Ji bo wan dema fersendê bû. Dibe ku ji vê rewşê rût û tazî yê xwazayê cesaretê bistîne û tirsa xwe binuxumîne. Weke ku hatin û çûyineke fikrî bijî, di ber xwe re got, "gelo hevalê Feîq û hevalên din bihîstine? Çawa nabihîzin divê bi misogerî bişopînin". Kara Dere û Bilgeç, xuya nedikir ku lê temaşe bike. Eger tiştek hebûya, dibe ku li wê derê bûya; îhtimal hebû li ser Kahperiyê operasyoneke bihata kirin. Li pala gelî kevirek ji ber lingê Botan şemitî, got "mêratê". Bi lez di kendalê de werbû, çû û wenda bû. Piştî kêliyekê deng hat. Botan ji vê fêm kir ku kendal çiqas bilind e.

Ewran xwe da aliyekî û tavê germahiya xwe parve kir. Ji ber ku barê wî zêde ne giran bû, zêde zehmetî nekişand. Lê fikarên ku mêjiyê wî dikojand hebû. Bayê ku bi awayekî hêdî hêdî dihat hestir bi çavên wî xistibûn.

Pê hesî ku hevalên nuxteyê hinekê komî ser hev dibin. Her çendî destpêkê ev weke alimandineke rojane hizirî jî, her ku nêzîkî hevalan bû, tirpatirpa dilê wî zêde bû. Dibe tiştekî wî neditî lê hevalan dîtiye hebûya. Gelo dema wî kereng kom dikir bêyî ku ew pê bihese dijmin ew dîtibû? Bi psîkolojiya nexweşik a tiştek safî nekirinê nêzîkî mangaya xwe bû.. Her ku nêzîkî mangeyê bû hemû bala hevalan çû ser wî. Ewirên hevalan li ser wî kilîd bû. Hizirên bi fikar mêjiyê Botan dorpêç kirin. Bi kurtasî û bi lez ev ewir wisa şîrove kir, nekarî ji nav derkeve gelo ev ewir ên teqdîra kedê ne yan ewirên rexneyê ne ku weke bêje ‘tu bûyî sedema wî dengî”. Hat gel hevalê Çekdar, Ezîz û Rojhat ku li derûdora hevalê Feîq kom bibûn.

Hevalan jê re got, “qewet be heval”. Wî bersiva wan da; “Spas dikim heval”. Gelo bigota yan na? Li ser vê yekê mêjiyê wî tevlîhev bû: “lê eger dijmin ez dîtibim, tiştek bi qewime, we demê were û safî bike. Eger tiştekî din be... Çi dibe bila bibe divê ez bêjim”. Piştî nefeseke ji kûr ve stend hîs kir ku ew amade ye, axifî; “hevalno, ber bi êvarê ve di ser me re ji aliyê Kahperiyê, ma we zêde deng bihîst? Min nekarîbû tam ji hev derxim”.

Ji bo ku bersiva ew li bendê ye neyê dayin, ji xwe re daxwaza şensê kir. Ji kûr ve nefesek girt. Kêfiyeya xwe li goşe danî, ji bo ku di agirê çarber de neşewite dîqet kir. Êdî amade bû bersiva hevalan pêşwazî bike. Xwêdana li ser eniya wî kom bibû bi şûtika xwe, ji çepê ber bi rast ê ve paqij kir.

Hevalê Feîq got, “ne safî ye ku ka dengê skorskiyê ye yan na. Lê wê derê ji me ve ne diyar e. Ji ber vê yekê sibe dikare bê qontrolkirin. Hewce dike em safî bikin.”

Hevalê diyar bi axaftineke wisa tevlî nîqaşê bû; “belê eger sibe were qontrolkirin baş dibe. Pêwîst e em zanibin li pey me çi diqewime”.

Ji ber van bersivên ne diyar weke bi ber bayekî bikeve lê hat. Hinekê xwe bêhna wî vebû. Çi dibe bila bibûya, nebibû sedema tiştekî neyînî. Ji ber ku ti binpêkirina quralan nekiribû kêfxweş bû. Jixwe eger dijmin pê hesîba vê gavê ji ber lêdanên qobrayan gurmegurm bi ser gelî diket. Lê li ber çavan ti tişten tine bû. Lê eger çember danîna û operasyona esas sibe bikirana. Hin cara wisa dikirin. Weke ku nedîtine dikirin derûdor digirtin, paşê ji nişkave leşker datanin û dest bi operasyonê dikirin. Ji dilê wî germahiyek bilez û bez hemû singa wî girte ber xwe. Xwe bi xwe got, “”bila, yên ku gerîla ne em in”. Her çendî mêjiyê wî bi hezar hizirê tevlîhev bû jî, li ser xwarina ku ew ê sibe çêbike hizirî.

Agirê çarber hatibû hilkirin, hê pelan zindîbûna xwe diparast. Tenê ji ser ve tebeqeyeke zirav a ji xaliyê li ser peyda bibû. Mirov nedikarî ku destê xwe bide pelên din pelên sincirî, mirov pîfê bike di cih de agir pê diket. Xwest çaydanê bide ser pelan û çayeke germ vexwe. Sibe nediyariyek bû. Tiştên di pêşerojê de biqewimîna nediyariyeke kûr bû...

Rêveberiya ku êvarê li hev kom bibû, biryar girtibû ku du heval dê biçin keşfa aliyê deng tê. Botan û Sîpan, ji ber ku ew dever herî baş nas dikirin, keşif bi rehetî bê pirsgirêk bikirana ew guncaw hatin dîtin. Dê sibe zû her du heval beyî ku aşkere hareket bikin ji nuxteyê derketana û tepeyên mijara axaftinê ji nêzîk ve kişif bikirana. Li ser vê bingehê dê heval agahdar bikirana û her wiha ewlehî qeyimtir bibûya.

Bi derketina serêrka sibeyê re Botan ji aliyê nobedar ve hate şiyarkirin. Bi wan çavên xwe yên xew li ser, destpêkê xwest wê rewşa bi mirov şêrîn dihat hinekê bijî. Êvarê ji bo rehet razê rextê xwe derxistibû û û xistibû nav êlekê xwe û weke balgîf lê kiribû. Di berbanga sibeyê de herî zêde hênikayi şevê xwe dida hîskirin, ji bo ku neqerise destê xwe avêt kêfyaya xwe û li sukra xwe aland, şûtika xwe ya ku dema şevê razabû sist bibû, dubare bi hesesiyeteke mezin girêda. Rextê xwe weke ku tam were valahiya zikê xwe girêda. Ji bo ku li ranê wî yên stûr nekeve bi destê xwe

palaskaya xwe qontrol kir, bi çep û rastê ve zivarand, temam bû. Destên xwe birin ser pelên agirê ku jê re çarber tê gotin û ji bo sermaya sibeyê hinekê laşê xwe amade kir. Kefên destê xwe mist da, nefeseke kûr kişand nava xwe. Hinekê çavên xwe yên werimî û bê xew mist da. Baş vekir û paşê dîsa mist da. Her çendî birçî jî bû, dikaribû heya bi nîvro îdare bikira, ya ku bikirana qontrolek bû. Ya din jî dikaribû ji mitfexê çend nan bigire. Fikirî ku dikare bi tirşok an jî giyayekîdin bixwe.

Ji bo bizane Sîpan rabûye yan na, divayabû biçê lê binêre. Stêrka sibeyê bi ronahiya xwe ya zêde şev ronî dikir; weke bêje tam dema wê ye. Botan ji cihê xwe, xwe rast kir, durbîna xwe ya ku ji êvarê de bi çeka xwe ve kiribû bi awayekî çep û rast avêt sukra xwe. Berikên xwe qontrol kir. Tiştekî ji bîr kirî tine bû. Di berîka rex ê êlekê wî de sabûna wî, di berîka jor de deftera wî ya biçûk ku not lê dinivîsandin û pênûsa wî hebû. Çeka xwe girt, hêdîka xwe da wî aliyê hevalan. Li meqabên xwe geriya nikarîbû peyda bike. Hê dinya tam venebûyibû. Hê dinya bi xumam bû. Hinekê lê gerî, nedît û keserek kişand... Lê dema êvarê razayîbû hema li vê derê danayibû. Piştre di bin bin lingên Çekdar de ew dîtin, bêyî ku hevalê xwe şiyar bike, pê bi hesîne, hêdîka lingên hevalê xwe rakir. Meqabên xwe da ber xwe û dubare bi heman baldariyê lingen hevalê xwe li cih danî. Ji ber ku meqaba xwê bi terza gerîla girêdayibû, careke din pê re mijûl nebû. Bi awayekî leşkerî di cih de lingên xwe xistinê. Di pratîka havînê de meqabên xwe ji piyê xwe dernedixist. Xwe bi xwe got, “bila, hê bihar e, ya din ji em hê neketine tevgerê” û ji bo ku li Sîpan binêre ber bi mangeya rex ve çû. Beriya ku derkeve cara dawî li xwe fitili û li hevalên xwe nêrî, her heval kî dizane di nav kîjan xeyalan de bû, ew ji vê tîmê berpirsiyar bû. Ji her tiştê hevalan ew berpirsiyar bû.

Beyî ku bizane ev ewirên dawî ne ku li ser hevalên xwe digerîne, ji bo ku xwe bigihîne cem Sîpan meşiya. Û di nav tariyê de wenda bû.

Wê şevê dilê Feîq ne rehet bû. Deng nehatibû zelalkirin, nehatibû fêmkirin ku çi ye û ne çi ye. Ji ber vê yekê diviyabû sibê pir bi hişyarî tevbigerîna, her çendî cihên wan asê jî bû, mehên biharê tev dezawantaj bûn. Şev bi ser de hêdî hêdî girtibû, hewl dabû bi hezar pirs û fikarên di mêjiyê xwe de razê. Diviyabû di demeke wisa de bêxemî tine bûya. Dibe ku tiştek tine bûya. Dîsa jî qontrolkirin girîng bû. Hinekê serê xwe hejand, çenteyê xwe nerm kir û serê xwe li ser danî. Çend caran xwe bi çep û rastê ve zivirand, dilê wî ne rehet bû. Ji beriya ku razê, ji bo cara dawî, destpêkê ewlekariya giştî di mêjiyê xwe re derbas kir ku ti îhmal û yan jî îhtimala dîmengirtina dijmin heye yan na. Bi awayekî rêkûpêk kişf dihate kirin û dema ne hewce be tevger nedihate kirin. Hizirên wisa di mêjiyê wî re derbas dibûn û diçûn; “divê mirov rehet be, ji ber ku heya bi vê gavê li derûdora me ti opoerasyon nehatine kirin. Ev ji tê maneya ku me zêde bal nekişandiye”. Lê dîsaji ji ber van hêmu hiziran, fikaran pirsên ku peyda dibûn serê wî westand. Hêdî hêdî giraniyek kete ser çavan. Piştre çavên wî dest pê kirin bişewitin û ji ber xwe hatin girtin.

Feîq di xewna xwe de didît li teyr û bazaekî suwar bûye. Teyr û baz ji çiyayê Yilan xwe berdida geliyê Tahar, paşê ber bi bakur ve dibû, li ser Kahperî digiriya. Çi qewimî, tam jî dema hat ser Şeytan Uçgenî ji nişka ve teyr û baz bi derbeyekê, dest bi ketinê dike. Kêliyekê xewa wî herimî. Şiyar bibû. Saet qederekê li nîvê şevê derbas dibû. Hê jî dewrana tariya şevê bû. Ji dûr ve bi awayekî xemgîn û ewqas bixof hê jî kundan dixwend. Dema ewirên xwe li derûdora xwe gerand, ji beriya ku nerehetiya di dilê wî de ji nû ve şiyar bibe serê xwe danî ser ‘balgîfa xwe’. Di vê kêliyê de guhekî wî hê jî li dengên kundên ji dûr ve dixwendin bû. Şev, bê tevger bi qasî avekê aram û kûr bû. Bêdengiya wê sar bû.

Weke her tim, ji aliyê hevalên xwe yên rojbaş kişandin ve hatin şiyarkirin. Ji ber nearamiya tevgera doh pêş ketibû, hema bêje hemûyan bi lez şûtikên li pişta xwe, bi çavên xwe yên li xewê dîsa bi dîqet girêdan. Palasqayên xwe dan pişta xwe, êlêkên xwe li xwe kirin. Kefyeyên xwe avêtin sukra xwe, bêyî ku zêde deng

derxin kevirên çarberê yên ku sincirîbûn dan rexekî. Lê belê ji ber ku dinya tam ronahî nebibû pel tevnedan. Hevalê Feîq ji bo ku nobedarê/a dawî peyda bike ji mangeyê dûr ket. Armanca wî ew bû ku ka bizane gelo Botan û Sîpan di dema xwe de hatine şiyarkirin yan na. Ev girîng bû. Hevalê/a wî yê/a nobedar ê/a dawî tekmîl da wî. Hevalê Feîq got “temam”. Xwe bi xwe re got, “ji beriya berbangê û dîmen nedayin pir girîng e”. Ji nobedar pirsî, “keşifçiyên nuxteyê jî derketin?”. Nobedar ew bersivand, “rast e heval derketin”.

Ev jî tedbîreke ekstra bû. Hinekê bi bişgoka dûrbîna di sûkra xwe de leyist. Êdî dibû berbang. Serê çiyan û girikan zelal dibû. Û di dawî de stêrkên dawî jî wenda bûn. Bi hevalên xwe baweriya wî hebû. Lê eger hewce bikira wî jî dikarîbû ji cihekî guncaw derûdorê qontrol bike. Sibeyê heya bi saet nehê amade sekinîn. Hewayeke întişarê bû. Navbera şeş û neh, saeta leşker danînê bû. Eger di navbera van saetan de tiştek nebûya dihate fêmkirin ku ew roj dê çawa derbas be.

Dema dinyayê dest bi zelalbûnê kir bi lez derûdor xuya bû. Hevalê Feîq ji cihê ku bi baldarî xwe veşartiye, bi dûrbînê derûdor temaşe kir. Pişta her kevirî, serê her girê, keviya her daristanê bi baldariyeke mezin di ber çavan re derbas kir. Dûrbîn li ser wan deveran girt. Ti tevger nedît. Ji ber sermayê destên wî qerisîn. Dûrbîna dest xwe bi hesesiyet li aliyekî danî. Bi lez kefa destê xwe mist dan. Paşê ji bo hinekê nefesa xwe ya germ pifê bike nêzîkî devê xwe kir. Kêfiyeya xwe ya li sere xwe alandibû hinekê bi paş de kişand. Dubare bala xwe dayê. Ti deng û gurminî jî nebihîst. Bêhna xwe veda. Tevî ku Hevalên doh hatibûn bi fikar bûn, bi agahiya ku piştî kêliyekê Botan bida dê hê jî bêhna xwe fireh bikirana. Jixwe wî jî ti dîmenên bi guman bin nedît, dema hêdî hêdî tav billin bû, wî jî xwe berda nuxteyê, cem hevalan. Cehenem Deresî bi coş bû, car caran xumexuma wê bipelên bayê ve dihat û derbas dibû. Ev jî dihata maneya ku eger dengek bê jî bi hêsanî nayê şopandin.

Gava ku tav li ezman dihate cihe xwe yê herî bilind, ji nişka ve Sîpan bi bezînê, di nava xwêdanê de kete nuxteyê. Ji danûstendin nefesê dihate fêmkirin ku demeke dirêj beziyaye. Hevalên ku ev rewşa Sîpan a di nav xwêdanê de û bi kelecan dîtin panîk bûn. Bi kelecanê rabûn ser piyan û dest pê kirin li derûdora wî kom bibin û bi pirsan meraqa xwe kêm bikin: “çi bû, çima tu evqas di nava xwêdanê de mayî, ev kelecana te çi ye, çima dibezî heval?”.

Sîpanê ku nabiza wî vegerî rewşa xwe ya asayî tevî xemgîniya xwe, bi nediyariyek ku bi temamî nepiştrast bû dest bi axifînê kir; “em ketin şer.... Bawer im hevalê Botan şehîd ket. Min tam fêm nekir”.

Pirsên wisa yên ku îfadeya ecziyê bûn li pey hev hatin kirin., “çawa dibe, çawa çêbû”. Diviya bû Sipan ji van pirsan hemûyan re bibûna bersiv da ku aqûbata Botan û hem jî ji bo leşker danînên doh û berfihaya operasyonê karibin tedbîrê wergirin, fikar û gumanên wan ji holê rabin.

Sîpanê ku nabiza wî vegerî rewşa xwe ya asayî hîs kir ku eniya wî zuwa dibe. Ji gava ku derketine aliyê Yumurta Tepesî û Kahperî keşif bikin pê de dest pê kir vebêje; “herî dawî nêzîkî saet nehê me ti tişt ferq nekir, lê piştî nîvro ji bo em karibin hê baştir keşf bikin dema me dest pê kir hilkişin gir, dijminê li gir bi cih bûyibû bi ser me de çep û rast dest bi reşandinê kir û hevalê Botan bawer im wê demê şehîd bû.

Weke ku aveke sar bi ser hevalê Ezîz, Feîq, Çekdar, Diyar, Rojhat û yên din hatiye kirin, li cihê bûn cemidîn . Di wê kêliyê de hezar hest bi hev re jiyan kirin. Bîranînên hemû deman li ber çavên wan zindî bûn. Bîranîn bi coş bûn. Aliyê zehmet ê jiyanê dîsa xwe nîşan dabû. Û hevalekî wan ji wan qut kiribû. Morala wan li wê derê di cih de zuwa bû. Yê ku radiza xew lê herimî, yê dikenî kenê wî li ser lêvên wî cemidî, yê li ser lingan bû, bi ser çongên xwe de ket, hinan dest avêt berîka xwe da ku cixareyê bipêçe.

Hawîrdora wan bi xemgîniya jihev qutbûnê hate dorpêçkirin. Piştî agahiya şehadeta hevalê Botan gelek hevalan nexwest pirs bipirse.

Hevalê Feîq bi lez xwe rast kir û dema got, “heval, bila her kes kom bibe”, hemû heval kom bûn. Dest bi axaftinê kir:

“Dijmin dizane li vê derê hêzek heye. Dibe ku operasyonê berfireh bikin. Vê gavê cihê me berevajiya tevgera wan e. Lê belê araziyek ku di mehên biharê de herî bal dikişîne. Bêyî em karê xwe ji şensê re bihêlin em xwe amede bikin. Divê hêza vê herêmê ti zirerê nebîne û derkeve havînê. Dibe ku dijmin li gorî xwe şehadeta hevalê Botan weke awantaj bi kar bîne û demekê vê derê bigire. Ji ber vê yekê ne diyar e ka dê çi bibe. Em tiştên xwe yên zêde veşêrin û erzaqê xwe û bi taybet mitfeqa xwe qamûfle bikin. Em pir dîqet bikin ku agir dûman neke.”

Hemû hevalên li derûdora wî bi ruhekî mezin ê seferberiyê rabûn şipiya. Her hevalekî/ê ji aliyê xwe ve dest avêt tiştekî. Di demeke kurt de xwe komî ser hev kirin  û hatin wê rewşa karibin tevger bikin.

Rêveberî bilez kom bû. Dê ji ber girîngiya rewşê, biryareke dîrokî bidana.. Ev mijar safî kirin ku ‘nuxteyê berdin yan di pozisyona parastinê de biminin’. Dê bimana, encama derketî ev bû.

Ji ber ku bihar sar bû, arazî ji bo tevgereke giştî ne dest dayî bû. Hawîrdor bi rengê griya tarî û mora tarî bû. Gelek kêm nîşaneyên li ser rengê kesk hebûn. Arazî bi giştî nerm bû. Vê ji tevgera dijmin derfet dida wî. Arazî ji astengbûnê derdiket. Biqasî ku wan qamûfle bike darên daristanê pel venedabûn.. Bijarteka rast ew bû ku li palên Cehenem Deresi bimînin.. Tam jî li cihê ku lê bûn. Hem asê bû û hem jî li gorî cihê pevçûnê berevajî diket. Dibe ku xelas bûna û heta derbe li dijmin bidana. Berêvar kiribûn êvar..

Li derûdora wan zêde zêde bi skorskiyê leşker hate danîn. Ev leşker danîna ji ya tê texmîn kirin zêdetir weke ku tiştê sibeyê

biqewime agahî didan. Araziya derûdorê baş nas dikirin. Ev awantaja wan hebû. Dema destpêkê vê derê weke nuxte hilbijartibûn, li dijî êrîşên qobreyan di cih de li hawirdorê mewziyên pir saxlem ên binerd çêkiribûn. Erîşên hewayî her çendî zêde bi bandor nebin jî dem bi dem dibûn sedema şehadêtê. Şehadeta hevalê Botan li wan giran dihat lê dîsa jî ji bo ku bê wendahî vê operasyonê derbas bikin û tola hevalê xwe vekin soz dan. Di dilê xwe de êv soza dan. Feîq hestiyariyeke tevî kînê bi hev re jiyan kir. Xwe bi xwe re got, “dema diçûn ji sizmaya tepe ma çima bi diqet tevnegerîn, ev wendahi ne baş bû”. Ji havîna 2003’yan pê de li gel Botan bi hev rê bûn, bi hezar zor û zehmetiyê hatibûn Dêrsimê. Bi sedan kîlometro rê meşiyabûn, goştê bin lingên wan heliyabû. Ewqas zehmetî kişandibûn ketibûn rewşeke nayên naskirin. Dema bi hev re bûne ewqas parvekirinên xweşik pêş xisitibûn. Di kêliyên herî zehmet ên wê fedakariya nayê hêjandin de jî sûda wê dîtibûn û hatibûn van rojan.

Feîq nexwest ti car qebûl bike. Ev rewşa bê şens ku di bin berpirsiyariya wî de hatibû jiyîn êş dida wî. Bihar bû, ma araziyê dest dida...

Li ber sayiya wê şevê bi rext ve xwe dirêj kiribû û ji cihê xwe dirêj kiribû ewirên xwe berdabû rêyan wisa dinêrî. Hin caran xwe bi xwe de ecz kir, hin caran ji bo stêrkan ma heyirî. Laşê wî germ nedibû, bi hêrs bû; pir dihizirî û diviyabû rast biryar bida. Ferq kir ku di hindurê wî de hin tişt digerin bala wî çû ser dilê wî, her çendî xwe bi çepê û rastê ve qulupand jî qet nikarî razê. Her li ser hevalê xwe yê Botan hiziriya. Her ew anî ber çavên xwe. Xew, îşev ji wî direviya.

Bi şevê nêzikî saet siseyan rabûn çûn mewziyên li jorî nuxteya xwe ku li beramberî êrîşên hewayî çêkiribûn. Tenê tişte ku şev xerab dikir, dengê lingan bû. Bi awayekî rêkûpêk tîm bi tîm, taxim bi taxim belav bûn. Hevalê Feîq taximek şande pala heramberê wan. Hevalê Diyar sê hevalên din girtin gel xwe û çû pala mijara axaftinê. Dê tevgera pêk bê bi cîhazê ragihanda. Ji bo

ku heval bi saxlemî vê operasyonê derbas bikin her tişt dihate kirin.

Ji beriya ku hevalên xwe bişîne mewziyan bi hesesiyeteke mezin ew tembih kirin, hişyar kirin û ji wan re serketin xwest. Di pevçûneke îhtimal heye pêk bê de bi balkişandinê ji wan re vegot. Dê heya karibûna pozisyona xwe ya parastinê biparastana. Lê eger pevçûn jê nerevbe dê li ber xwe bidana û heya bi êvarê xwe biparastana. Êvarê jî bi plansaziyeke destdayî biketana tevgerê. Hevalê Feîq cara dawî li stêrkan têmaşe kir. Stêrka sibê xweş xuya dikir. Weke mizgîniya rojê bide kêfxweş bû. Wê jî silav li hevalê Feîq kir. Piştî bi kêliyeke kurt dê hemû zindi li gel ronahiya ku bê, di vê şert û mercên xweşik de bi rola xwe rabûna. Dê coşa xwe ya jiyanê bi xwendinê, bi firînê, bi xişînê, bi bezînê nîşan bidana. Hemû mirov dê piştê kêliyekê şiyar bibûna, westabûna şevê ji ser xwe biavêtana û ji bo biçin ser karê xwe biketana li ser rê. Tev bi fikr û hizirên di mêjiyên wan de. Piştre dê tav derketa  û xweza gaveke din nêzîkî keskbûnê bûya. Yanî dê xwaza rabûya ser lingan.

Di mewziya ku xwe li ber dijmin çêkiribûn li hêviya dijmin man. Şev dişkest. Hêdî hêdî sîber zelal dibûn. Tariya şevê diqetî, hêdî hêdî ronahiya rojê rê dida flûbûna berbangê. Hevalê Feîq bi zanebûna ku saêtên herî sar ev in kêfiya xwe baş li xwe aland. Weke ku hinekê germ bû. Ji ber ku di mewziyê de li ser çongên xwe rûniştibûn ji qewda lingan, ber bi lingan ve tevizînek belav bû. Hevalê Feîq ku ji vê rewşê nefret kir, ji hevalê Ezîz ku li cem wî bû re got; “heval em wisa bi giştî derûdorê qontrol bikin”. Û serê xwe ji wê mewziya teng derxist, destpêkê li çep û rasta xwe nêrî. Dar, kevir yanî hemû tişt diyar bûn. Sirtên tepeyan her çendî ne weke dixwaze be jî xuya bûn. Hin reşahî hîs kirin jî lê xêrab nehizirî. Îhtimala ku dijmin be jî ji bîr nekir.

Hevalê Feîq wisa hizirî, “gelo hevalê Diyar gihîştin cihê xwe? Ev şikêrên hemberê me derûdora noxteyê tam dibînin, hemû tevgera dijmin dikare li wê dere bê şopandin... Gelo xwe gihandin?”

Hevalê Ezîz di wî cihê flû yê mewziyê de tebaqaya xwe ji berika xwe derxist. Dê berevajiya berbangê cixareyeke mezin bipêçanda vexwaraya. Di hengameya doh de texmîn kir ku dê çi biqewime û li gorî xwe hinek amadekarî kiribû û qederekê titûna Semsûrê xistibû berîka xwe. Bêyî ku ji bîr bike jî nanê hişk ku qlasikeke gerîla bû xistibû berîka xwe ya çepê. Dibe ku birçîbûya.

Piştî ku cixareya xwe pêçand hêdîka qirxekê danî. Bêyî ku ji hevalê xwe yê Feîq bipirse ji bo wî jî pêçand, bi hessiyet û bêyî ku çîkoziyê bike... kêliyekê hizirî; "gelo ji derve dinya çawa bû, ma dikarîbû agir pê bixe? Lê di vê sermayê de agirê çarberê, ew pelên ecêb xweşik en berûyê..." Her çendî bala wî belav bû jî di cih de xwe komî ser hev kir. Çi dikir?

Ji hevalê Feîq pirsi, "hevalê Feîq dikarim cixareyekê bikişînim?.

Hevalê Feîq got, "Tebî, tebî, lê diqeta agirê wê bike. Agirê cixarê veşêre, mirov nizane ka çi diqêwime. Heya bi niha li beramberê Ezîz helwesteke wi ya redkirinê nebûyibû. Qîmet dida wî. Hevalê Ezîz got, "eger bixwazibî vexwî min ji bo te jî pêçand".

Feîq tehmeke pir nexweş distend. Ji ber ku wisa bi rehetî kişfeke bi hûrgulî nekiribû nedikariya hizirekê bide pêş ku îhtimal heye dijmin lî ku derê ye. Vê jî nerehetî dixist dilê wî. Ewlekariya hevalan girîng bû.

Hevalê Feîq got "madem te zehmet kir û pêçand, ez li gel te vê sibê di bin mij û moranê de bihêlim".

Ezîz got, "gelo dixwazî nan bixwî? Hevalê Feîq got, "na, heval ez nebirçî me sax bî".

Hevalê Feîq di nav mewziya tê de li ser çongên xwe rûnîşt cixareya ku Ezîz jê re pêçandibû bi cixareya wî pê xist ne hewce bû çaxmaxekî din pêxe. Her ku dukela titûnê kişand hindurê xwe, rêwîtiya wî ya ku di zarokatiya xwe de ta li Pirsûsê dêst pê dike

heya bi qada Rêbertiyê, ji wê derê haya bi Zagros, ji wê derê heya bi Dêrsim hate ber çavên wî.

Di nava dukela wê cixarê de di hemû van lêgeran de di van salên tije bi têkoşîn de hevalên wî yên li cem wî bûne yên bi rih, bi simbêl, rihên wan qusandî, dirêj, qurt û bi hevalên cûda yên jin, zarokên agir û rojê xuya bûn.

Feîq ji nişka ve pê hesî ku ji kûr ve bêriya Rêbertiyê kiriye. Xwest nefeseke kûr lê bide û wê serêşa xwe ya sivik rawestîne. Çiqas jî ketibû bin bandora Rêbertiyê. Ji bo wî serbilindiyeke çendî mezin bû.

Rêbertiyê di dersê dida de di qonaxên bingehîn ên şoreşe de behsa rola kês, taybetmendiyên karekterîstîk ên gerîlayên Kurdistanê, kesayetiya pêwîst e ew bistîne ya Partiyê ku serketin dianî dikir. Di mercên şer de di encama şaşitiyên tektîki de sedema wendahiyên me yên ku pêşî lê nikare bê girtin dikir. Rêber Apo digot, "divê mirov xwe sist neke bi misogeri dijmin nede kêfxweşkirin, nexwe keda Rêbertiyê vala diçe. Dema wan ders guhdar dikir Rêbertiya ku bi gerîna xwe ya li ser lingan ew diponijandin li ber çavên wî dimeşiya.

Kêm mayibû cixareya wî biqede. Ezîz ji cihê rûniştibû bi xwesteka ku li ser çongan rûnî xwe rast kir. Mewzî teng bû. Êlek û şalê wî di nava mêwziyê de bibû weke heriyê. Hevalê Ezîz girîngî neda vê û ji hevalê Feîq pirsî, "çi bû gelo. Hevalê Diyar û hevalên li cem wî gihaştin cihe xwe?". Hevalê Feîq got, "nizanim lê hewce ye di vê saetê de li wê derê bin. Ew newal xweş rê dide. Ne bawer im asê bimînin".

Dubare serê xwe ji mewziyê derxist weke ku li ser lingan bisekine dûrbîn di sukra xwe de girte destê xwe. Ji aliyê Ali Bogazi, sirtên Kozlûca, serê tepeyan hin reşikahî ferq kirin. Nefesa xwe girt, bêyî dest bilerizin li ser wan reşikahiyan girt. Bi saniyan wisa neleqand li ser wê reşikahiyê. Reşikayiye xwe diqeliqand,

tevdigerî. Dema dinya zelal bû fêm kir ku ev leşkerên dijmin in. Ji Ezîz re got, “sirtên hemberê girtine hevalê Ezîz”.

Ezîz bi kelecaneke ji nişka ve bertej nîşan da. Bêyî ku bizane ka di vê sibeyê de çi heye bi lez ji cihê xwe rabû. Wî jî dixwest li gel keşfa hevalê xwe, tevlî wî bibe û û pê bişewire. Hesta li gel Feîq tevgerînê dilê wî hênik dikir. Wisa xuya bû ku dijmin aramiya gelî bi guman dişopand. Bi bilindbûna tavê re dîtin ku sirtên têpeyên heya bi pêşberê wan tên hatine girtin. Jorî şikêrên Diyar li wê derê bû jî dihate girtin. Piştî kêliyekê qanalên cîhazê ku bi hev re çêkiribûn bû parazît. Dijman ew qanal guhdar dikir, û bloqe dikir. Cîhaza ku di berîka jor a êlekê wî de bû, dubara bişgokên wê badanê dengê wê rêk û pêk kir. Ev fêrbûnên jiyana rojane bûn.

Ji Diyar re gotibû û ew hişyar kiribû ku heya temas dest pê dike qet û qet cîhazê bi kar neynê.

Dijmin di saetên destpêkê yên sibeyê de di mewziyên xwe de bê tevger sekinîbû. Her ku saet bi pêş de çûn leşkerên dijmin ên ecz bibûn radibûn şipiya, li çep û rasta xwe dinêrîn, li ser çongên xwe rûdinîştin, bi dest û lingan îşaret didan hev. Gerîlayên ku vê tektîka dijmin dizanin hê baldar dibin. Hevale Feîq ji vê fêm kir ku qolên operasyonê yên li sirtên gelî dê araziyê qonterol bikin. Tevgera li pêşberê wan ya aşkere dihate kirin xapandinek bû.

Diyar li ser cîhazê amade li hêviyê bû. Lê di cîhazê de mihabere kirin bi temamî deşîfrasyon bû. Ji bo niha ji vê xwe da aliyekî. Tam di wê kêliyê de Ezîz jî, radyoyê xwe yê Sony ya bi qepax vekir û dest bi guhdarkirina nûçeyan kir. Di sê goşeya Pulurê de şerek qewimîbû hevalek şehîd bibû û ketibû dest dijmin. Li gorî wê nûçeyê operasyon ê bi berfirehbûnê bidomiyana. Di encamê de şehadeta hevalê Botan misoger dibû. Hevalê Feîq ku guh li radyoyê ragirtibû, di hindurê wî de hesteke naskirî qeliqî. Ji nişka ve hîs kir ku dicemide. Laşê wî dest pê kir bertekên ecêb bide. Pirçên li zendê wî, li ser rûyên wî dema dest bi cemidînê kir rep bûn. Dihate fêm kirin ku rast bû. Lê heya bi wê demê hê jî hêviya

xwe diparast. Şehadeta wî qebûl nekiribû, danequrtandibû. Xwest cixareyê bikişine. Kîn û hêrsa wî hê jî zê de bû rojê her der ronî dikir. Tîrêjên wê digihîştin her derê. Derûdora wan girtî bû. Zehmet bû mirov bizane operasyon çawa bi encam dibe. Dijmin hêdî hêdî qontrola li ser araziyê dabû destpêkirin.

Hevalê Feîq bêyî ku zêde hilkişe, ewirên xwe li derûdorê gerandin. Kêliyekê meraq kir  û hizirî, “gelo heval çi dikin, rewşa wan çi ye”.

Her çendî ew nedîtin lê tenê dîtina mewziyên wan, têrê dikir piştrast be hevalên wî saxlem in.. Hesta ku ji vê hezkirinê çavkaniya xwe distîne dilxweşiyek bû... Di wê mezinahiya mîstîk a hezkirinê de tam jî di wê kêliyê de bi hevalên xwe serbilind bû. Ew subjeyên herî fedaî yên Tevgera Azadiyê Ya Kurdistanê bûn. Heta, şervanên wî, dê di mirinê de jî bidana pey wî. Hinêkê bêhna xwe vekir. Û xwe şidand. Feîq ji mej ve ji bo tiştên piştî kêliyekê bibûna amade bû. Li cem wî hevalên wî yên ciwanên nû gihîştî yên bi îradeyên xwe yên weke çiyayekî asê  û girêdayî bi xeta Rêbertiyê ne hebûn. Dê tevî wan mil bi mil li dijî dijminê dagirker li ber xwe bidana. Birçî bibû lê dema aqûbeta Botan ji radyo bihîst morala wî têkçû, dilê wî ji xwarinê sar bû. Nanê hişk li ber çavên wî weke bêtehm be xuya bû.

Dem ber bi nîvro bû. Leşkerên dijmin ên ku xwe qol bi qol berdidan gelî li cem Feîq xwesteka êrîşê wan kirinê mezin dikir. Weke şêrekî di qefesê de bû. Her çendî leşkerên dijmin ên ku hejmara wan zêde bû rehet tevdigeriyan jî di esasa xwe de dihate fêmkirin ku zêde zêde dirtirsin û bi fikar tevdigerin. Awantajeke wan a tenê hebû ew jî raseriya teknîkî bû. Îhtimal hebû her kêliyê pêlî mayinekê bikin û parçe bibin, her kêliyê bikevin kemînek ku bi baldariyeke mezin hatiye amadekirin a gerîla. Ji ber vê yekê bi tirs û stres bûn. Li gelek cihan pêlî keviran dikirin û bi wisa bi pêş de diçûn, her carê mola didan, hedef didan şaşkirin. Feîq di encama keşfa ku kiriye de fêm kir ku qoordîneya dijmin li ku derê

ye. Qoordîne tam li pêşberê wan bû. Vê jî nîşan dida ku operasyon gelî, Cehennem Dêresî û Şeytan Uçgenî dide ber xwe.

Sûbayê qooordîne dikir, hema ji li ser pala ku Diyar lê bû. Ne mimkûn bû Diyar wî bibîne. Wan jî aliyê xwe yê jor nedidîtin. Ji ber ku cîhazê xwe bi kar nedianîn agahiyên şênber nedihatin parve kirin. Û  nedikarîn hev qoordîne bikin.

Hemû hevalên di mewziyên li pala nuxteya ku hevalê Feîq lê bû, her kêliyê ji bo her tiştî amade bûn. Ji ber ku bi ser wan de zixur û parçeyên kevirên ku ji ber lingên leşkerên dijmin dişemitîn dihatin ser wan.

Hevalê Feîq li gorî plansaziyê stratejiya xwe wisa ava kiribû: “dijmin di operasyonê de ye, bi tevger e. Em jî ji ber ne destdayîbûna araziyê di cîhê xwe de sekinîne. Lê cihê nuxteya me asê û cihekî çep e. Em ê noxteyê pir hesas qamûfle bikin û taximeke xwe di bin fermandariya hevalê Diyar de bişînin pala li pêşberê me. Ew ê li wê derê me bişopîne û dema rewşek derdikeve me qoordîne bike. Em ên li nuxteyê dimînin di pozîsyona parastinê de di mewziyên xwe yên binerd de bimînin. Eger qolên dijmin dema operasyonê derbas bin û biçin em ê ji temasê xwe bidin aliyekî. Lê eger cihê me tesbît bikin û li ser hebûna me bikevin gumanan, em ê bisekinin bên heya bi ser me. Hewce dike bên heya bi ser mewziyên me da ku em karibin bi hêsanî li wan bidin. Bila dijmin hema li ber serê me bimîne; ev êrîşên hewanê yan jî êrîşên qobreyan ên li ser mewziyên me sivik dike. Li cem me mayina cenazeyên dijjmin awantejek e. Bi vî awayi em dikarin rojê bi pevçûnên bi şîdeta asayî derbas bikin û heya bi êvarê xwe biparêzin”.

Ev stratejî bi hemû aliyên xwe ve hate pêk anîn. Heya bi wê gavê her tişt asayî bû.

Hevalê Diyar dijmin dişopand û tiştên piştî kêliyekê bike di mêjiyê xwe re derbas dikir. Dijmin hewl dida bi awayê qolan ji

palê gelî xwe berde jêr. Lê qolên dijmin en di çep û rasta wî re deras dibin, timî cihê heval lê ne derbas dibû, şensê ji aliyê wan digirt.

Qolên dijmin ên ku dihatin û diçûn hêviya Diyar hê zêdetir dikir, kelecana wî jî kêmtir dikir. Di ber xwe re axifî û û got, “wisa xuyaye dê tiştek neqewime, araziyê pir bi hûrgulî qontrol nakin, jixwe li nuxteyê jî derbas bûn. Tam kêliya ku digot me ev jî derbas kir, li cihê mitfeqa kevin qerebelixiya dijmin pêk hat. Ji ber kelecana wî dilê wî dêst bi lêdana bilez kir. Dûrbîn da li ser wê derê, li ser cihê bûyerê sekinand. Bêyî bi lez nefes bistîne dest pê kir bişopîne.

Qolê dijmin ku li hevalên wî derbas bibû, yek bi yek, du bi du paş de zivirîn. Ev îşareteke nebaş bû. Di monologa xwe bi xwe re got, “bi misogerî tiştek dîtin. Gelo çi bû? Dijmin bi misogerî dîmenek dît yan jî dewsek dît”. Lê ew der dema ku Sîpan û hevalên din êvarê hatibûn bi hesesiyeteke mezin qamûfle kiribûn. Ji bo hevalên xwe kete nav xem û fikaran. Hevalê Feîq her ku qolên dijmin derbas dibûn, hineke din bêhn fireh dibû û bi ber bayê hizira ku dê vê bihara rût û tazî ya bêhna jiyanê jê tê ya Dêrsimê jî derbas bikin.

Ji nişka ve di qoordîneya dijmin ku li tepeyên beramber bû de kêliyên bi tevger hatin jiyîn. Dema di cîhazê de jî tevgerek pêk hat jê guman kir. Lê ji ber ku cîhaz bi sîstema kilîdê hatibû bloqekirin tiştên dihatin axifîn bi temamî nedihate fêmkirin.

Pirsên tev bi fikar ê wisa ji xwe pirsîn, nehlet lê be, gelo tiştek dîtin, yan hevalên li mewziyên rex tiştek kirin...” Derûdora xwe bi awayekî hê baldar şopand... Guh lê ragirt. Nekarîbû xwe ragire bêyî ku fikaran ji qoordineya dijmin a li tepeyên beramber bike, nîvenîv laşê xwe ji mewziyê derxist û ewirek avêt mewziyên rex ve. Na, ti tişt tinebû. Hinekê ji jêrtir, ji derûdorê deng dihatin, tiştekî din jî tine bû. Leşkerên dijmin bi rewşa xwe tîmî ya tiral dîsa li ser rêyan bûn. Lê nedikariya bi temamî binê gelî bibîne. Ji

ber vê yekê derbarê tiştên diqewimin de bi qasî jê piştrast be nedikariya xwe bigihîne agahiyekê.

Fermandar Feîq piştî bi kêliyekê dema gelek leşker li gorî cihê lê ne bi cih bûn fêm kir ku wê hin tişt biqewimin, ji ber vê yekê li xwe vegerî û berê bi mewziyê xwe de tewand. Çi dibe û çi nabe ne diyar bû, her tişt ji bo deşîfre nebûnê bû, ev hesesiyet ji bo wê bûn.

Diyar bi fikar mitfexa ku kîsên ard li wê derê deşîfrebûne dişopand. Dijmin kîsên ard diqetand û belav dikir. Fêm kiribûn ku gerîla li wê derê ye. Dema opereasyon paşve dikişî, wê dubare li serê hevalan bihêwiriyana. Ya din jî hê roj bû. Ji ber ku cihê mitfexa li pala newalê baş nehatibû qamûfle kirin leşkerê li pey grûba dijmin dimeşiya dema di wê derê re derbas dibû kîsên spî yên ard dîtibûn. Kîs girtibû radikir hewa. Ji nişka ve dijmin kete tevgerê. Ji ber ku bi roj ji bo gerîla dezawantaj bû dixwestin ji wê sûd wergirin û pê kêfxweş bûn.

Fermandarê qolê leşkerên dijmin bi fermana dijwar ku dida leşkerên xwe, ew diajotin palê. Ya rast ne zêde cidî bû. Eger ne ji talîmatên misoger ên sûbayê qoordîne bûya dê berda û biçûya. Tiştê di encama temaseke îhtimal heye pêk bê de dihesiband. Eger ev zivirîna ji nişka ve ya dijmin zêde zêde pêk bê, dibe ku biçûya ber mewziyên hevalan. Dê ev jî bibûya encameke nebaş. Leşkerên dijmin bi awayekî bi mesafe, destê wan li ser textikên çekan bi dîqet ber bi cihê mangayan ve diçûn. Dijmin hewl dida hilkişe hinekê jorê mewziyên hevalê Feîq ew lê ne û xwe bigire saxlemiyê, raserî ava bike.

Hevalê Feîq û Ezîz ji mêjve cixareya xwe ya dawiyê kişandibûn. Ji beriya kêliyekê bi zêde bûna dengê dawî re êdî ne rast dibû ku cixarê bikişînin. Ji ber vê yekê li bendê sekinîbûn. Êdî aşkere bû ku hin tişt dê biqêwimin. Tiştên li hinekê pêştir hatine jiyîn ne tiştên asayî bûn. Hevalê Feîq û Ezîz çekên xwe ber bi derve rast kiribûn û li bendê bûn. Ji ber ku ser girtî bû û bi qamûfle bû, heya

ku nehatana ser nedikariya fêm bike. Ber bi aliyê ku ew lê ne, deng zêde dibû û dengê lingan dest pê kir baş bê bihîstin. Nefesên xwe girtin. Êdî deşîfre bibûn. Vê gavê şer bibû jênerev. Feîq bi hêdîka axifînê li gel hevalê xwe yê Ezîz plana xwe çêkirin dê hêmû kîn û hêrsa gerîlayên Apoçî pêlî textikê bikirana, wisa lê bikirana ku leşkerên dijmin li pir nêzîkî wan bimirin.

Bagera Zagrosê ku her li şoreşê û li serhildanekê geriya ye dê dîsa pêşengî bikira, hema li vê meydanê, di van deqîqeyên dem êdî qediyaye de nîşan bida ku gerîlayên Kurdistanê kî ne.

Ezîzê ku ruhê wî yê îsyan û tolhildanê di deranserê têkoşînê de qet kêm nebûye  dê bi hevalê xwe re têbikoşiya, heya bi guleya xwe ya dawî şer bikira. Li diji artêşa faşîst a dagirker, Têkoşîn, bi paratîka xwe ya Kaniya Spî ya di 2004’an de hê li ber çavên wî bû. Niha piştî sê salên derbas bûne dikarîbû xwe bigihîne wan. Gelek caran li vê kêliyê geriyabû. Pir caran xeyala vê kêliyê kiribû. . Ji bo ku bibe rastî di hindûrê xwe de qîrek da.

Ev daxwaz di dilê wî de bi lez û bez mezin bû, kemilî. Piştr re... Kêliyekê, di nava berûyên li wî rexê wan binevşên bi tîrêjên rojê diteyisîn, bi necisiyeke weke zarokan li wî dinêrîn. Di van kêliyên tenêtî tije hinava wî bûyî de, bi hesreta hemû herêmên Dêrsimê ku neçûyê, hemû hevalên ku ew nedîtîne şewitî...

Leşkerên dijmin, piştî ku cihên jiyanê yên gerîla hilweşandin û têkbirin dest pê  kirin hilkişin jorê noxteyê. Hevalê Feîq dît ku du, sê serên bi kep ber bi wan ve tên. Her ku nêzîk dibû hejmara dijmin zêde dibû û laşên wan mezintir dibûn, hejmar zêde dibû.

Leşkerên dijmin bi ewirên nerehet û bi fikar bi hizira ku dê her kêliyê guleyek tenişta wan biqetine, li benda fermana fermandar ku bêje ‘bizivirin’bûn. Zêde zêde nerehet bûn. Ditirsiyan. Di mêjiyê wan de her fikar hebû.

Hevalê Feîq bi nefesa xwe qontrolkirinê li ser yên ku nêzîk dibin nîşan girt. Eminiteya çeka xwe bir ser reşandina guleyan. Nîşan girt. Hinek nefes stend hinekê seknand, hêdî hêdî da. Leşkerê ku nerehetiya wî di çavên wî de diyar bû, hem bi panîk û hem jî bi baldarî nêzîkî mewziya Hevalê Feîq û Ezîz tê de ye dibû. Fêîq ji nişka ve pêlî textika qilêşa li dijmi rast kiribû kir. Gule di nava laşê leşkerê dijmin re derbas bû. Leşker di cih ket erdê, Ezîz jî bi derengmayineke bi saniyeyan bersiva vê tevgera hevalê xwe da û pêlî textika qilêşê kir. Leşkerên dijmin texmîn nekiribûn ku mewzî li ku derê ne, ji aliyê fermandarên xwe ve weke êm hatibûn bikaranîn.

Feîq û Ezîz ev tîmê dijmin dan erdê û gelî bi guleyên gerîla kire zimezim. Hêzên dijmin ê dagirker ji ber çekên teqiyane şoq dijiyan. Texmîn nekiribûn da ku gerîla dê li wan bide. Fêm kirin ku şaş bûne û tirs kete dilê wan. Gulêyên germ dibin nikarîbûn bisekinin heya bi şikêrên hemberê diçûn, hin caran bi şûnde vedidan û bi ser leşkerên li jêra gelî de diçûn. Gelekan ji bo ku xwe jê biparêzin xwe avêtin erdê.

Feîq û Ezîz bi ser dijmin de weke baranê gule barandin. Hevalên wan ên li mewziyên rex jî bi bihîstina dengê guleyê destpêkê di cih de ew şopandibûn, dest pê kiribûn leşkerên ku ji xwe re weke hedef hilbijartibûn gule bibarînin ser wan. Binevşên di nava berûyên li aliyê din bûn guh ragirtibûn dengê çekan, ji vî dengî bandor dibûn. Hê jî têyisandina xwe diparastin, vê gavê yakene şahidê vî şerî bûn. Dê piştî kêliyekê li ber sîbera êşê bimana, bibûna şahidê hatin girtina du cot çavên şîn û reş.
Hevalê Diyar, ji dema ku şer dest pê kir pê de di cihê xwe de ne netebitî . Cihê hevalan dêşîfre bibû. Di nava rojê de ev rewş ji bo encameke nebaş îşaretek bû.

Ji ber ku aliyên jor pir baş nedidît, her çendî mane neda vê jî paşê jî texmîn dikir ku teqwiyeya qobreyê bû. Ji ber ku piyadeyên dijmin nedikarîn nêzîkî mewziyên gerîla bibin dikarîbûn bi balafiran, bi hewanan, û hwd. êrîş bikin.

Nemerdiya ji derveyê etîkê ya hunera şerê modern di dewreyê de bû. Qobrayan nedikariyan pir zêde zêrerê bidin hevalan. Lê dêzawantaja wê ew bû, dibe ku gerîla nekarîna pêşî li sizmayên dijmin bigirtana. Ya herî xerab jî ew bû, eger ji tepeyên dûr ve hewan biavêtana dema îsabet bikira, dibe ku hevalan zerer bidîta, şehadet bi pêşketana. Gelo niha ev rêbaz di dewreyê de bû?

Hevalê Diyar ji ber ku bicihbûna dijmin a li aliyê jor nedidît, ji amadekariya êrîşa hêwanan bêagahî bû.

Di nava wî agirê sincirî yê şer de du kulîlkên îsyanê ku mil da bûn milê hev eman nedidan dijmin. Ji hev re dibûn moral-destek û kîna xwe ji serê dijmin derdixistin ji nişka ve li cem wan teqînek pêk hat. Teqîn ewqas bişîdet bû, mewziya di navê de bûn, kulm bi kulm ax weşiya ser wan. Ji nişka ve guhên wan ker bûn... Nedikarîn dengên derûdorê bibihîzin... Paşê dubare sîstema wan a bihîstinê kete dewreyê, dest pe kirin bibihîzin. Li holê bêhna barûdê û ewreke toz û dukelê ku ji ber dewisînê pêk hatibû hebû.

Du gerîlayên li ser çongên xwe rûniştibûn, dubare rabûn ser lingan, şerê xwe berdewam kirin. Bi kêfiyeyên xwe yên li milê wan rihên xwe yên bûne toz, û ser çavên xwe paqij kirin. Paşê dubarê dûbare hewan teqiyan, bi wî dengê xwe yê tije gelî dibû. Leşkerên dijmin ji vê kêfxweş bûn. Bi vî awayî dikarîbûn bi hêsanî nêzîk bibin. Hêdî hêdî mewziya hevalê Fêîq û Ezîz bêdeng bibû.

Heya ku li mewziyên wan dan pes nekirin. Şibiya şer kirin. Ew hêviya mirovahiyê abîdeyên serbilindiyê yên gelê me bûn.

Ew binevş bûn şahidê hemû van bûyeran. Êdî du cot çavên reş û belek tine bûn. Binevşan ji binevştiya xwe şerm kirin. Şerm û fedîkirina wan kir ku ew biçilmisin. Binevşan ji çarnusa xwe re nifir kirin. Ev şahidî li wan giran hatibû. Xwe bi xwer re gotin, “xweziya em di singa tehtekê de komeke strî bûna”. ... Xwina hevale Feîq ta xwe gihandibû kokên wan. Erdê xwîna wî

nekişandibû, xeteke sorînî pêk hatibû. Li çiyayên Dêrsimê... Xwîn li ser axê zuwa bibû, bibû ax bixwe...

Hevalê min î heja, ruhê te yê ku di laşê te de dîl bû, niha li hemû deşta Heranê digere û li kela dîrokî ya Amedê datîne. Rêber Apo got, “mirin tine, ew hestek ku hatiye afirandin e”. Mirin tenê ne neçariyek e, xelata herî mezin a jiyanê ye. Mirin bi qasî ku guherînek e, ji bo ku kemilandina mîrateya li pey mayî ye. Mirin ji bo têkarî kirina mîrateya çandî ye jî. Ji ber ku dema hebûn xwe digihîne xwazaya xwe heqîqet e. Hevalê Feîq cewhera mirovahiyê ye. Hin caran hemû mirovahî tenê di mirovekî/ê de tê ziman. Hin caran mirovahî dibe mirovekê/î. Ev hemû, awayên guherînê yên li ser heman cewherê ne. Mirov û civakîbûna ku ji hinava wê derketiye heman tişt e û tiştekî yekpare ye. Hevalê Feîq bi qasî Dêrsim e, ewqas jî Heran e jî. Wî hewaya dîrokî ya erdê stendiye, li gel xezalên wê hevaltî kiriye. Ava wê ya weke kefa spî vexwariye û bi lingên tazî di şiverêyên Dêrsimê re meşiyaye. Di wê dergahê pîroz ku pîran pêlî kiriye de axa wê ya pîroz û têra xwe bêhna wê kiriye. Ax mirov bi heqîqatê ve girêdide û heqîqat jî ji mirov re hêza herî mezin e. Te jî li ser wan xakên pîroztirîn loqma xwar. Erda me jî, weke mirovan diaxife. Ewireke kûr dibihîze û hîs dike ku xak qîr dide. Daxwaza azadiyê bi qasî ku ya mirov e ya axê ye jî. Di azadiyê de bextewarî veşartiye û hemû daxwaz dest nîşanî wê dikin. Ji ber ku azadî nefeseke ji kur ve ye.

*Min, weke hevalekî wan, ji grûbek hevalên ku ji wî şerê Cehennem Deresî bi saxî derketine û di kêliyên dawî de li gel wan lehengan bûne ev serpêhatî guhdar kiribûn. Lê belê ji ber bandora dem a dan jibîrkirinê min zora xwe da ser bîr û hefizaya xwe û hewl da vê bîranînê binivîsim.*

Nasnav**: EZÎZ**
Nav û Paşnav: **MEMED EHMED SEDIQ HAMO**
Navê Bav: Ehmet Sediq Hamo
Navê Dayikê: Nazliye
Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1974-Efrîn-Dimiliye
Rewşa Xwendinê: Amadeyî (lise)
Dîroka Tevlîbûnê: 1999
Dîrok û Cîhê Şehadetê: 14. 04. 2007-Dêrsim



Nasnav: **FEÎQ SURUÇ (pirsûs)**
Nav û Paşnav: **JÊHAT BİNİCİ**

Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: 1979-Pirsûs-
Dîrok û Cihê Tevlîbûnê: 1996-Pirsûs
Dîrok û Cihê Şehadetê 14. 04. 2007/Dêrsim



# BÎRANÎN



## HEVALÊN DI VÊ BÎRANÎNÊ DE NAVÊN WAN DERBAS BÛNE:

**Hemze Gever**, Di 2010’an de li Amanosê şehîd ket.
**Şêxmûs Efrîn**, Di 2011’an de li Sêwasê şehîd ket.
**Rojhat**, Di 2007’an de li Dêrsîmê (Cehennem Deresi) şehîd ket.
**Diyar Rojhilat**, Di 2007’an de li Dêrsim (Cehennem Deresi) şehîd ket.
**Berxwedan Rojhilat**, Di 2005’an de li Dêrsim Pulurê (Ovacik) şehîd ket.
**Botan**, Di 2007’an de li Dersimê şehîd ket.
**Firat Dersim**, Di 2008’an de piştî biserdegirtina kampa Harçikê di çemê Harçikê de şehîd ket.
**Wedat**, Di 2008’an de di biserdegirtina kampa Harçikê de şehîd ket.
**Çem Ararat**, Di bihara 2004’an de li Dêrsimê şehîd ket.
**Brusk Mereto**, Di mijdara 2011’an li Geliyê Teyarê (Çelê) şehîd ket.
**Zinar Botan**, Di sala 2007’an de li Dêrsimê şehîd ket.
**Şiyar Arap**, Di 2009’an de li Vengê (Dêrsim) di kemînekê de şehîd ket.
**Nesîmî Dêrsim**, Di 2005’an de li Pertegê di encama komployekê de şehîd ket.
**Yucel Amed**, Di 2007’an de li Dêrsimê Navenda Rojava (Dêrsim Bati Merkez) şehîd ket.
**Serhed**, Di 2005’an de li Dêrsimê Navenda Rojava ( Dêrsim Bati Merkez) şehîd ket.
**Piling Wan**, Di 2006’an de li Sêwas Divrigi (Divriği) Çiyayê Çengel şehîd ket.